

NÛDEM

No 18 1996



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ◆ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI Celadet Ali Bedir-Xan / Gramer
- ◆ DÊ Û DÊMARÎ Egîdê Xudo ji Kirîfîki: Nacî Kutlay / Roman
- ◆ KESKESOR Nûredîn Zaza / Çîrok
- ◆ DI FOLKLORA KURDI DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn
- ◆ HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin
- ◆ MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman
- ◆ MILKÊ EVÎNÊ Rojen Barnas / Şiir
- ◆ ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydogan / Çîrok
- ◆ BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Husên / Roman
- ◆ MÎRZAYÊ BIÇÛKA. de Saint-Eksupéry Werger: Fawaz Husên / Çîrok
- ◆ GOTIN YAşar Kaya / Ceribandin
- ◆ ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Xelîl Duhokî
- ◆ ŞEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî / Roman
- ◆ MIŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî / Roman
- ◆ BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger: Firat Cewerî / Piyes
- ◆ LI BENDA GODOT Samuel Becket Werger: Firat Cewerî / Piyes
- ◆ GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Firat Cewerî / Aforisma
- ◆ GIRTÎ Firat Cewerî / Çîrok
- ◆ KEVOKA SPÎ Firat Cewerî / Çîrok
- ◆ KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT Firat Cewerî / Ceribandin, hevpeyvîn
- ◆ ÇÎROKA ŞOFÊR Cengîz Aytmatov Werger: Nacî Kutlay / Roman
- ◆ EVÎNA REBEN Derwêş M. Ferho / Şiir
- ◆ BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiir
- ◆ KULTUR Û RAMAN Şerefxan Cizîrî / Ceribandin
- ◆ KURÊ ZINARÊ SERBILIND Sidqî Hîrorî / Roman
- ◆ DERWARÎ Yusufê Cerihî / Şiir

PIRTÛKXANEYA XWE BI WEŞANÊN NÛDEMÊ BIXEMILÎNE!

NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar 18, sal 5

Havîn: 1996

Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 190 Sek

Welatên din: 50 S

Institution 260 Sek

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: Sir Lawrence

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

NÛDEM kovareke ser-
bixwe û Kurdistanî ye,
ferqiyetê naxe navbera
nêrîn û îdeolojiyên kur-
dan, ji dijminatîya kes û
rêxistinan dûr e, rûpe-
lên wê ji hemû nivîska-
rên kurd re vekirî ne.

Adres:

NÛDEM

Termov. 52 ztr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 GIRÎNGIYA ZIMANÊ KURDÎ ♦ **Firat Cewerî**
- 6 DU ŞÎR JI ♦ **Rojên Barnas**
- 8 **FERHAD SHAKELY**: "ŞÎIRA BAŞ ..."
- 22 AZADÎ ♦ **Suleyman Demir**
- 24 MIN BI TENÊ NEHÊLIN ♦ **Sîdaqî Hirorî**
- 41 BIRÇÎ ♦ **Bûbê Eser**
- 47 **ARÎF DAMAR**: "EZ DOSTÊ MÛSA ANTER BÛM"
- 52 SÊ XWIŞK ♦ **Edith Södergran**
- 53 CELAD ♦ **Gunnar Ekelöf**
- 54 DILÊ DINYAYÊ ♦ **Karin Boye**
- 55 ROMANA KURDÎ ♦ **Nacî Kutlay**
- 65 REFÎQ SABIR ♦ **Xelîl Duhokî**
- 78 SEYDAYÊ TÎRÊJ ♦ **Konê Reş**
- 80 SENFONIYA ME ♦ **Beyhanî Şahîn**
- 81 PISÎK JÎ XEWNAN DIBÎNIN ♦ **Şahîneh Bekirê Soreklî**
- 78 J. J. ROUSSEAU ♦ **Felat Dilgeş**
- 93 MARTIN LUTHER KING ♦ **Mihemed Dehsîwar**
- 107 JÎNENÎGARIYA CEGERXWÎN ♦ **Şerefxan Cizîrî**
- 113 JI WEŞANÊN NÛ

GIRÎNGIYA ZIMANÊ KURDÎ



Fîrat Cewerî

Bi kêmanî ev bîst sal in ku ez ji şoreşger û têkoşerên kurdan zehmetiya zimanê kurdî dibihîzim. Ew hem gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin, hem jî gazinan ji nebûna xwendevan û nivîskarên kurdan dikin. Ji bo Kurdistanê têdikoşin, ji bo rakirina qedexeya li ser ziman û edebiyata kurdî li ber xwe didin, tên girtin, îşkenceyên nedîtî dibînin, bi salan di girtîgehan de radizên, lê belê ew bi xwe ji bo vejandina zimanê xwe, ji bo naskirina kultura xwe, ji bo ji mirinê rizgarkirina ziman û edebiyata xwe zêde serê xwe naêşînin. Çi bigire hemû weşanên me kurdan bi zimanê tirkî ne, di rûpelên kulturî û edebî yên weşanên kurdan de ji berdêla danasîna berhemên bi zimanê kurdî, mirov gelek caran pêrgî danasîna berhemên bi zimanê tirkî tê; carina mirov pêrgî danasîna hin berhemên tê ku ni-

vîskarên wan an Kemalîstên tûj in, an jî gelekî dûrî pîrsgirêk û rastiya kurdan in. Gava mirov ji hin weşanên kurdan gazinan dike û dibêje çima hûn weşanên xwe bi kurdî dernaxin, ew dibêjin ku kes bi kurdî naxwînin, loma ew mecbûr dimînin û weşanên xwe bi tirkî derdixin. Bibuhurin, lê bi rastî ez vê mentalîteyê fêhm nakim. "Kurd bi kurdî naxwînin, loma em weşanên xwe bi tirkî derdixin". Baş e, te çî daye kurdan? Te kengî bi sedan pirtûk, bi dehan kovar û rojname, bi dehan kanalên radyo û televizyonan pêşkêşî kurdan kiriye û kurd jê reviyane? Ez bawer nakim ku me di warê ziman, edebiyat û kulturê de zêde tiştek dabe kurdan. Ger em di wextê de bi girîngiya ziman û edebiyata kurdî bihesiyana, me xwendevanên kurd pê bihesanda, ez bawer nakim ku wê îro rewş weha bûya. Lê dişan jî, guhertina vê rewşê di destên rewşenbîr û siyasetvanên kurdan de ye. Ger ew ji hemû kompleksan bi dûr bikevin, li rastiya xwe vegerin, rastiya xwe bibînin, wê bikaribin di hundurê demeke kurt de, hem bi dehan weşanên bi kurdî derxin, hem jî bi hezaran xwendevanên zi-

manê kurdi bigihinin.

Ji ber ku rewşa xwendin û nivîsandina kurdî hê ji gelekî dişibe rewşa salên sihî, ez ê gotîna xwe bi gotîneke Kamuran Bedir-Xan ve girê bidim. Kamuran Bedir-Xan, di pêşgotîna *Dersên Şerîetê* de, di derheqa ziman û edebiyata kurdî de, gazinan ji zana û mezinên kurdan dike û wilo dibêje: "Heke îro Kurdistan wêran e û kurd perîşan in, ev du belayên mezinin, ji nezaniya xelkê me ye. Xwendê di nav kurdan de kêm in û birê kurdan ê bêhtir hê zimanê xwe ê şîrîn nikarin bixwînin û binivîsin. Ji ber ko millet nikare bixwîne û binivîse, kitêb, cerîde û kovarên kurdî dernakevin ko derketin jî, nikarin bijîn, dimirin. Miletêkî bê kitêb û cerîde, miletekî bê ziman û bê deng e, sist e, qedrê wî nayê girtin, heqê wî nayê dayîn û millet dibe lehîstoka milletên din. Miletê ko di vî wextî de nexwîne û nenivîse, ne îşê xwe û ne îşê welatê xwe dikare bizane û wan bigerîne.

Belavkirina xwendin û nivîsandina kurdî, hukumeta Kurdistanê hebuwa bi destê wê dihat qedandin. Lê her wekî îro hukumeta Kurdistanê nîne, belavkirina xwendin û nivîsandina kurdî wezîfeya mezinên Kurdistanê ye. Mezinên welatê me Beg, Şêx û Axa ne. Beg, Şêx û Axa pircaran qala peya, eşîr, mirîd û mirovên xwe dikin û ew dizanin ko peya, eşîr, mirîd û mirovên wan xurtî û serbilindayîya wan e. Mezinên me xweş dizanin ko bê eşîr, bê mirîd û peya, ne beg, beg e, ne şêx, şêx e, û ne jî axa, axa ye.

Heye ko bêtir serekên me, şêx, beg û axayên me heta niho ji bo qenciya peya û mirîdên xwe hin tiştên rind pêk anîne. Lê halê Kurdistanê şanî me dike ko xebata wan an bê rê, an bê rêz û tertîb, an kêrîm bû. Wisa nebuwa diviyabû milletê me jî, wek milletên din serbest, xurt û serfiraz buwa. Mezinên me dizanin ko milletê me ne kêrîm tu miletan e û her car bi ya wan kiriye. Ji ber ko îşê millet di destê wan de bû ji halê millet ew berpirsiyar in. Ji wan yek bi yek tê pirsîn:

– Gelo te ji bo pêşveçûna mirov û mirîdên xwe çî kiriye? Em dereng mane, lê destpêkirin nivê qedandinê ye. Berî her tiştî divê, serekên me, axa û şêxên me ro berî rojekê hîne xwendin û nivîsandina kurdî bibin. Bi tîpên kurdî, yê ko dil dike, dikare di nav du mehan de hîne xwendin û nivîsandina kurdî bibe. Ji wê û paşê divê her serek ji pênc mirovan re dersa kurdî bide û ev pênc peya divê xweş hîne xwendin û nivîsandina kurdî bibin û ko hîn bûn her yekî ji wan divê ji xwe re pênc hevalên din peyda bike û ji wan re dersê bide. Bi vî awayî di salekê de, pênc şagirtên serekekî ji bîst û pênc mirovan re û ew bîst û pênc peyan, ji sed û bîst û pênc hevalan re û ew sed û bîst û pênc mirov, ji şeş sed û bîst û pênc peyayan re dikarin dersê bidin. Bi vî awayî di nav du salan de kurd hemî dikarin hîne zimanê xwendin û nivîsandina kurdî bibin..."

Bi hêviya ku wê rewşenbîr, siyasetvan, şoreşger û dewlemendên kurdan ji şêx, axa û begên kurdan jîtir derkevin û rojekê berî rojekê dest biavêjin zimanê xwe... ✍

ESMANEKÎ MIN HEYE JI STÊRKAN BARGIRAN

Rojen Barnas

Esmankî min heye ji stêrkan bargiran
Esmankî min heye lihêfa şevê
Bi hûr û gir û piçûk û mezin
Stêrkin hene lê
Diçilwîlin hêvîjen
Diçîrisin xwezîbij
Li raserê meriv
Di wê lihêfê.

Esmankî min heye li wê
Stêrkin hene d' şevên havînê
Gava ku bipeyivîn bi zarê hal
Û meriv bikeve berdestê wan
Radikin dilê meriv, davêjin
Davêjin binê bîra evînê.

Di wê bîrê da me hê jî
Ji wê roja ku ketim dafikê
Ne derya ye ku bi ajnê derêy
Ne çiya ye ku bişêy hilkişî
Bîra bêbinî ya meyê ye,
Wisa ku
Çendî vedpejilî, sermest
Çendî jê vedixwî
Bêtir serxweş î.

Esmankî min heye ji stêrkan bargiran
Û serxweşê evînê, dilê min
Li berê rûniştiye
Nitirvan.

RASTÎ GULEKE BEYABANÎ

Rojen Barnas:

Rastî guleke beyabanî
Hatim di newala Dêrgulê
Nazik bû nazik...
Ciwana bû ciwan...
Gul bi xwe
Kulîlk bû li berê:

Em ketin mijûlahiya evînê
Bi vejenîna bi çav û birhan
Lê me dîzanî ku ji mêj ve bûrî
Çîrok û efsaneya Mem û Zînê.

Xezalek koçer bû: Binevşa Narîn,
Kî zane li ber vêya belkî henek bû?!
Ne Mem bûm, ne Cembelî û Siyamed
Rastiya min a ku hebû, ev bû.

Rastî guleke beyabanî
Hatim di newala Dêrgulê
Hê jî xeyalên min pê xemilandî
Hê jî ji bîra min naderê.

Lêborin:

Di hejmara 17'an, rûpelê 25'an de, şîra R. Barnas ya bi navê "Esmanê min cûnê gulrengîn bû"
bi şaşîyêke mîzanpajî ji hev qut bûye û mîna du şîran hatiye weşandin. Em rast dikin û ji R.
Barnas û xwendevanan lêborinê dîrwazin.

Ferhad Shakely: "Şi'ra baş li ser hundurê mirov dipeyive"


H
E
V
P
E
Y
V
I
N

Ferhad Shakely di sala 1951'ê de li Kerkûkê hatiye dinyayê, li unîversîteya Baxdadê ziman û edebiyata kurdî xwendiyê, di eynî demê de di rojnameya "Birayetî" de xebitî ye. Di navbera salên 1974-1975'an bûye pêşmerge. Paşê mecbûr maye ku welatê xwe terk bike. Ew di sala 1978'an tê Swêdê û ji wê salê de li Swêdê dijî.

Shakely di panzdehsaliya xwe de dest bi nivîsandina şîran dîke. Di 73'an de pirtûka wî ya pêşî "Pirojey Kûdetayekî Nihênî" derdikeve. Bi nivîsandin û wergerandinê Shakely nêzîkî bîst pirtûkan çap kiriye. Ew ji deh salan û vir ve xwedî û berpirsiyarê kovara "Mamostayê Kurd" e û herweha li unîversîteya Uppsalayê dersên kurdî dide.

Nûdem: *Ez berê dixwazim em vê terma "şîrê" zelal bikin. Hin kes dibêjin helbest, hin kes dibêjin şîr, hin kes şêr û hin kes jî şî'êr dînivûstînin. Gelo kîjan ji van rast e?*

Ferhad Shakely: Pirsra (bêjeya) şî'rê, di eslê xwe de wuşeyeka erebî ye û ji rêgeha kultûra îslamî hatiye nav zimanê kurdî û ketiye nav ziman û kulturên gelek miletên din ên li Rojhilatê. Mirov dikare bêje ku niha bûye pirseke Rojhilatî, pirseke îslamî. Ne tenê pirsra "şî'r"ê, gelek pirsên din jî hene ku ji rêgeya ziman û kultûra erebî hatine nav zimanê me û yê gelên din. Bo nimûne: *Qelem, kitêb, edeb, edebiyat* hemû ji zimanê erebî hatine. Lê rastiyeke din heye, ev pirs niha ne tenê pirseke erebî ye, belkû pirsin merov dikare bêje kurdî ne, farisî ne, ordû ne û di zimanê gelek miletên din de jî bi ka: tên. Pirsên weha êdî bûne



Ferhad Shakely

belkû pirsîn merov dikare bêje kurdî ne, farisî ne, ordû ne û di zimanê gelek miletên din de jî bi kar tên. Pirsên weha êdî bûne pirsên rojhilatî.

Ez bi xwe pirsê şî'r pirseke baş dibînim. Eger çî gelek nivîskarên kurd, bo nimûne: Mamosta Goran di çend cîyan de pirsê "helbest" bi kar aniye jî, lê ez bi xwe pirsê şî'wê baştir dibînim. Lê kîjan rast e, ew navên ku te bi xwe nivîsîne, rastî ew e ku hîç yek bi xwe jî ne rast in. Lê eger em li orgînalê wê binerîn "şî'r" e û navên din ne rast in.

– *Şiîra kurdî kengê û bi çî zaravayê kurdî hatiye nivîsandin? Sebebên ku bi taybetî şîîr li wê deverê hate nivîsandin çî bûn?*

– Eger em bixwazin destpêka edebiyata

kurdî pêşan bidin ku ji ku derê dest pê kiriye, karekî ne hêsan e û zehmet e. Ew zehmetî jî çend tiştan tê: Dîroka edebiyata kurdî bi temamî nehatiye nivîsîn. Eger hatibe nivîsîn jî, bi şeweyekî zanistî û baş çênebûye.

Ya din jî, mesela diyalekt û zaravayên zimanê kurdî ye. Bê guman em wan kesan tev kurd dihesibînin, lê hin xelk hene ku nîşana pirsê dadinî ser zaravayên kurdî. Bo vê jî destpêka edebiyata kurdî dibe meseleyeke munaqesê û behs in ku zimanzanî û zimanwanî ne. Ev du sebeb in bawer dikim ku diyarîkirina destpêka edebiyata kurdî ne hêsan be. Lê dîsan jî em kurd dikarin bêjin, eger ev diyalektên ku ji zû de edebiyat, şî'r pê hatine nivîsîn

yek-yek li ber çav bigirin. Ez bawer dikim ku diyalekta goranî û ya hewramî berî diyalektên din bo nivîsîn û şî'rê hatine bikaranîn. Bo vê jî mirov dikare bêje: edebiyata kurdî bi zaravayê hewramî dest pê kiriye.

Pirsa ku *bo çi ji herêma Hewramanê dest pê kiriye?* Ez bawer dikim ev girêdayê bi meseleke dînî ve ye. Ji ber ku navçeya herêma Hawramanê, dînekî xwe yê taybetî hebûye ku "*Dîne Ehlê Heq*" e, niha jî jê re dibêjin "*Kakeyî*" û piraniya stran û ayînên wan ên dînî bi vê diyalektê çêbûne. Mumkin e ku ev jî bûye sebeb ku mirov ne tenê stranên dînî, jê zêdetir jî stiranên "ruhî", behsa ruh û jiyana xwe kirine û formek dîtine ku bûye forma şî'rê. Ew jî dibe destpêkek bo edebiyata kurdî.

Şa'irên gelek mezin bi zaravayê Hawramî hene. Niha navê gelek ji wan jî wînda bûye ku mirov nizane kî ne û çi wext jiyane. Tiştên ku wan nivîsîne jî niha kêma li ber destên me hene. Lê dîsan di nav klasîkên edebiyata kurdî de, bi dialekta goranî, navên mezin mane, wek; Xanay Qubadî, Seydî, Mewlewî, Bêsarî û gelekên din.

Paşî wê, mirov dibîne ku edebiyat bi şeweya -zaravayê kurmançiya jorîn- dest pê kiriye. Piştî wê jî bi zaravayê diyalekta kurmançiya başûr dest pê kiriye. Lê mirov îro nikare bêje ku edebiyat bi zaravayê hawramî heye. Mumkin e ku hin kes li mala xwe pê binivîsin, lê wek edebiyatê dî rola wê nemaye. Zaravayê hawramî di

edebiyata kurdî de bûye beşek ji klasîkên me. Lê em dibînin ku edebiyat bi du zaravayên kurmançiya jorîn û ya jêrîn pir xurt bi pêş dikeve, geş dibe û pê edebiyateke dewlemend tê nivîsîn.

– *Em dizanin ku dewlemendiyêke şîra kurdî ya klasîk heye, tu vê dewlemendiyê bi çi ve girê didî?*

– Edebiyata me ya klasîk, pir dewlemend e. Ev dewlemendî bi dîtina min, meseleyek kulturî û ferhengî ye. Kultur û ferhenga kurdî di qirên 17, 18 û 19'an de bûye beşeke zîndû, beşek pirjiyan ji kulturên Rojhelat û kultura îslamî.

Edebiyata kurdî ne tenê bi serê xwe jiyaye û ne jî ji edebiyatên dewrûberên xwe û kultura milletên din hatiye birrîn. Bi dîtina min sebebêkî vê dewlemendiyê jî ev e: Sebebê ferhengî û yê kulturî ye. Lewra em dibînin ku piraniya şa'irên me yê klasîk, sê-çar ziman zanibûne. Em Cezîrî bigirin, Ehmedê Xanî, Nalî, ya Mewlewî bi kêmanî her yekê wan bi sê zimanan kurdî-erebî-farisî caran jî bi turkî şî'r nivîsîne, hem jî şî'ra baş a bilind nivîsîne.

Nimûneyên ku li ber destên wan hebûne, wek standard ji edebiyata erebî û mirov dikare bêje zêdetir ji edebiyata farisî bûne. Lê nimûneya berz, nimûneya edebiyata farisî bûye, wek berhemên Mewlana Celalêdînê Romî, Hafîz, S'adî û wekî din. Şa'irê kurd xwestiyê ku ew jî bibe wek yekî mîna Hafîz, yekî wek Mewlana. Em vê meselê bi aşkîra di şî'ra Melayê Cizîrî de dibînin ku dibêje:

*Ger lû'lû'yê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn, te bi Şîrazê çi hacet?*

Yanî (Mela) xwe ji Hafîz kêmtir nabîne. Mirov dikare bêje ku ew xwe ji Hafîz mezintir jî dibîne. Ev xwemezinbînî yan xwekêmtirnedîtî bi dîtina min dewlemendiya kultûr û edebiyatê pêşan dide. Lewra Melê û wan şa'îran, xwe beşek ji vê edebiyat û kultûrê dîtine.

Nalî jî di şî'roke xwe de dîsa eynî mane, eynî pîrs bi kar aniye, dibêje:

*Faris û Kurd û Ereb hersê m be defter girtuwe
Sahibî sê mulka emro, Nalî dîwanî heye!*

Weke ku em dibînin, yanî şa'îrê kurd ê klasîkî xwe di nav edebiyateke zengîn, edebiyateke dewlemend de dîtîye ku mirov dikare bêje: "Edebiya Rojhelat"ê û "Edebiyata Îslamî" bûye. Her yek ji gelên Rojhilata îslamî, bi edebiyat û bi kultur bi ronakbîrên xwe ve tê de beşdar bûye.

Îro mixabin edebiyata kurdî û herweha edebiyata mîletên din jî ji hev dûr ketine; gelek sînor di nava mîletan de çêbûne, sînorên siyasî, yên ekonomî, yên ferhengî jî çêbûne. Îro mirov nikare bêje ku ronakbîrêkî kurd bi giştî edebiyata erebî, ya turkî û ya farisî nas dike. Lê mumkin e ku ronakbîrêkî ji Bakûrê Kurdistanê edebiyata turkî nas bike, lê edebiyata farisî û erebî nas nake. Herweha ronakbîrêkî ji beşên din jî, xeyrê edebiyata farisî û erebî edebiyatên din nas nake.

Lê weke em dibînin di sedsalên 17, 18 û 19'an de ronakbîrên kurd, ronakbîrên wê serdemê bê (ji xeyn) edebiyata kurdî bi kêmanî edebiyatên sê mîletan -faris, edeb û turk- baş naskirine. Ev dewlemendî (ya klasîkan) ji vê hatiye.

- Ji ber ku ez dizanim tu ji nêzîk ve li ser Ehmedê Xanî dixebitî, ez ê bixwazibim tu çend kurtepirsên min bi bersiveke fireh bibersivînî. Mîna tê zanîn di sala 95'an de kurdan sêsedsalîya nivîsandina Mem û Zîna Ehmedê Xanî pîroz kirin. Ji bo wî civîn û konferans li dar ketin, bend û pirtûk hatin nivîsandin; gava mirov vê jî li ber çavan bigire, gelo bi rastî kurd îro Ehmedê Xanî nas dikin? Ya ku Ehmedê Xanî kiriye Ehmedê Xanî çi ye? Mem û Zîna wî behsa çi dike? Felsefeya wî çi bû? Wî xwestiye bi vê beytê çi bibêje: Şerha xemê dil bikim fêsane / Zînê û Memê bikim behane.

- Berî her tiştî, divê ez çewtiyeke ku di nava me de belavbûye rast bikim. Ev çewtî ji kur û ji kê hatiye, nîzanim lê mirov dikare bêje "Çewtiyeke teknîkî, çewtiyeke zanistî ye: Piraniya Kurdan sala 1995'an wek Sêsedsalîya Mem û Zînê danîne. Lê ev rastiya xwe ji aliyê tarîxî û 'ilmî ve tune, tişteki ne rast e.

Lewra Ehmedê Xanî sala 1061'ê Koçê-Hicrî ji dayîk bûye, ku dibe hemberê 1651'ê Zayîne. Ev tişteki rast e û kes nikare bêje ne wuha ye. Paşê, Ehmedê Xanî di **Mem û Zîna** xwe de gotiye:

Îsal gehîşte çil û çaran

Wî pêşrewê gunehkaran

Eger em 44 bêxin ser 1061'ê ku Xanî ji dayîk bûye, dibe 1105'ê Koçê. Îro em nikarin bi zor tarîxa Zayînê li ser Ehmedê Xanî ferz bikin. Lewra wî hisaba Koçê kiriye. Bi hesaba Koçê ku 1105 e, dike hemberê 1693. Yanî Mem û Zîna Xanî di 1693'an de hatiye nivîsîn. Eger em *Sêsed-saliya Mem û Zînê* li gor tarîxa Zayînê hisab bikin, sala 1993 dikaribû bibûya tarîxa *Sêsed-saliya Mem û Zînê*. Ev jî, li gor hisabê me, lê li gor hisabê Ehmedê Xanî dîsa ne rast e. Eger em li gor tarîxa Hicrî 1105 ku *Mem û Zîn* hatiye nivîsîn hesab bikin, sêsed-saliya wê dike 1405'ê Koçê, hemberê wê (tarîxa Zayînê) 1984 dike. Eger em li gor dilê Xanî sêsed-saliya wê hesab bikin, bi rastî sala 1984 dibe sêsed-saliya nivîsîna *Mem û Zînê*. Ev meselake teknîkî ye ku cara yekem e ez bi nivîs behs dikim.

Li ser pirsyara ku "*Gelo Kurd Ehmedê Xanî nasdikin?*" ez dikarim bibêjim ku piraniya Kurdan îro Ehmedê Xanî nas nakin. Ne tenê piraniya Kurdan, bê tirs ez dikarim bêjim ku %5'ê ronakbîrên Kurdan -ez nizanîm ku çend ronakbîrên Kurd hene, lewra statîstîk li ba min tune- *Mem û Zîn* an Ehmedê Xanî nas dikin. Ewên din -%95- Ehmedê Xanî nas nakin, felsefeya wî nas nakin û *Mem û Zînê* nas nakin. Rast e ku xwendine, rast e ku her yekê sê-çar caran jî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî xwendine, lê nas nekirine.

Ez niha naxwazim bi dîrûdirêjî bêjim ku çima nas dikin û çima nas nakin, lewra meseleyeke dirêj e û mirov dikare li ci-

hekî din behs bike.

Di mesela Ehmedê Xanî û *Mem û Zîna* wî de, du nuqteyên girîng hene; yek forma/ şeweya *Mem û Zînê* ye. Piraniya (kesên) ku behsa *Mem û Zînê* dikin, yan dibêjin "beyt" yan "çîrok", lê pirsra wek termekî edebî ku pir girîng e mesela "mesnewî" yan "mesnevî" ye kêma kes behs dike. *Mem û Zîn* bi xwe *mesnewî* ye û çîrokek e ku bi forma *mesnewî* hatiye nivîsîn.

Mesnewî ji qernê 14 heta yê 18 jî di edebiyata Rojhelatê de formeke gelekî meşhûr û populer bûye. Berî Ehmedê Xanî gelek şa'îrên fâris û turk jî bi *mesnewî* nivîsîne. Reng e ku yek ji wana yê herî naskirî jî Nîzamî Gencewî ye ku Ehmedê Xanî gelek-gelek di dibê tesîra wî de bûye. Pênc *mesnewiyên* Nîzamî Gencewî hene ku her jê re "xemse" yanî "pênc *Mesnewiyên* Nîzamî" dibêjin.

"*Mesnewî*" di nava Kurdan de hatiye naskirin, bi raybetî li ba Ehmedê Xanî û hin şa'îrên din. Lê di roja îro de kes "mesnewî" nanivîse û wek formeke edebî rola wê jî nemaye. Lê ev girîng e ku mirov bizanibe *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ji aliyê form ve "mesnewî" ye û beşek e ji edebiyata Rojhelatê.

Ya din, mesela feylesûfbûna Ehmedê Xanî ye ku di nava Kurdan de pir mezin kirine. Bi rastî Ehmedê Xanî ne feylesûf bûye, lê wî felsefeya serdema xwe baş nas-kiriye. Û diyar e ku felsefe di rojgarên Ehmedê Xanî de ne gelek belav bûye. Sebebên wê gelek in ku çima û çiqas felsefe

di nava Kurdan de belav bûye. Lê felsefeya ku zêde hatiye naskirin, ya *tesewufê* -sofîzm- ye. Ehmedê Xanî sofîyekî mezin bûye, mirov dikare bêje ku wî felsefeyê bi riya tesewufê nas kiriye. Ehmedê Xanî gelek di binê tesîra felseya "Wehdet-ul



ku modela çep nemaye, îcar gelek kes dixwazin ku Ehmedê Xanî tenê wek kesekî neteweyî nişan bidin, ev jî ne rast e. Erê rast e ku ev tişt, ev bîr û bawerî di *Mem û Zînê* de hene, lê mirov nikare bêje ku felsefe û baweriya wî nişan didin.

Felsefe û

Wucûd"ê de bûye ku felsefa Muhyedîn Îbn-ul Erebi ye. Mirov vê felsefê bi aşkira di piraniya beşên Mem û Zînê de jî dibîne. Bê vêya Ehmedê Xanî felsefene din jî naskirine; felsefa îslamî naskiriyê û çî ke-tiye ber destên wî jî xwendiyê.

Her kes Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi şêweyê xwe, li gor îdeolojiya xwe, li gor dîtina xwe tefsîr kiriye. Berî 15-20 salan ku piraniya Kurdan çep bûn, Marksîst bûn, gava ku behsa Ehmedê Xanî dikirin weke çepêkî (yekî çep) behs dikirin û dixwestin ku bêjin: "Ehmedê Xanî alîgirê çepîtiyê bû, alîkarê karker, cotkar û proletaran bûye." Ev gotin bi nivîsîn jî hene, ne ku me bihîztiye. Bêguman ev ne rast e, ne rast bû û niha jî ne rast e. Herweha îro

îdeolojiya herî serdest a di Mem û Zînê de tesewuf û sofîzm e. Lê wek însanekî hişyar, yekî têgihîştî derd û kulên miletê xwe jî naskiriyê û xwestiyê ku miletê kurd jî wek miletên din rizgar bibê, azad bijî û xwestiyê ku rêyekê nişanî wan bide.

– *Bi qasî Ehmedê Xanî, tu li ser Melayê Cizîrî jî dixebitî. Ger tu huner, felsefe û zîmanê herdu şairan beramberî hevdu bikî, kîjan şair bêtir biserketî ye? Kûraniya felsefeyê bêtir bi kîjanî re heye?*

– Ev pirsyareke pir zehmet e. Bi taybetî jî, bo min gelek zahmet e. Rast e ku min li ser Ehmedê Xanî jî û li ser Melayê Cizîrî jî kar kiriye û niha jî kar dikim. Zehmetiyên min ji xwe jî vê tî. Ez hez ji herduwan dikim, bo min herdu jî miro-

vên gelek mezin û pîroz in. Lê bi kurtî eger ez karibin bersiva vê pirsyarê bidim; Ehmedê Xanî ji aliyê fikir û felsefeyê ve firehtir e. Mirov di *Mem û Zînê* de ronakbîriya wî, firehalîbûna wî baştir dibîne. Lê aliyê herî mezin ê Melayê Cizîrî *tesewuf* e û sofîyekî mezin bûye. Eger em weke şî'r lê binerin, bêguman ez dikarim bêjim ku hunera Melayê Cizîrî ya şî'rê gelek ji ya Xanî bilindtir bûye. Mebesta min ne ew e ku ez Xanî biçûk bikim. Rastî ev e ku ji aliyê hunerî ve formên cuda li ber destên Melayê Cizîrî hebûne. Lewra wî *qesîde*, *xezel*, *rubayî* (çarîne) û gelek formên din bi kar anîne. Lê Xanî yek form bi kar aniye ku ew jî *mesnewî* bûye û pê *Mem û Zîn* nivîsiye. Çend şî'rên Xanî jî hene, lê ne gelekî xurt û bilind in. Bila jibîr nebe ku *Mem û Zîn* ji ewel heta axir yek wezin, yek kêşe şî'r tê de bi kar aniye. Lê bo Cizîrî ne wuha ye, Cizîrî her nebê 100-120 xezel û qesîde û rubayî nivîsiye. Bêguman formên Melê zêdetir bûne ku hest, his, bîrbirin, îdeolojî û felsefeya xwe pê nîşan bide.

– *Em dizanin ku di edebiyata kurdî ya klasîk de bi qasî şî'rê nesîr (prosa) nehatiye nivîsandin. Sebebên wê çi ne?*

– Rast e ku di edebiyata klasîk a kurdî de pexşan (nesîr) nebûye, yan dereng dest pê kiriye. Eger mirov li sebebê wê bigere, ez bawer dikim ku desthelatiya siyasî sebebekî girîng e. Em dibînin ku milerên ku desthelata wan ya siyasî hebûye, pexşan li ba wan zûtir bi pêş ketiye, weke fa-

ris û turk. Şa'îrên kurd ji xeyrî şî'rê tiştên xwe yên din pexşan nivîsiye weke name yan tiştên dînî, lê pîranî zimanekî din bi kar anîne. Bo nimûne: Şa'îr û sofîyê mezin Mewlana Xalidê Neqîşbendî, gava şî'r nivîsiye bi kurdî nivîsiye, lê nameyên wî yên ku niha li ber destên me hene -nêzî 300 nameyên wî mane- bi farisî û erebî nivîsiye. Ez dikarim bi dilniyayî bêjim gava Melayê Cizîrî jî name nivîsiye bi farisî nivîsiye. Herweha Ehmedê Xanî jî... Lê şî'r bi kurdî nivîsiye.

Çewa ku min îşaret kir, bawer dikim ku desthelata siyasî hoyekî mezin e ku edebiyata pexşan dereng dest pê kiriye.

– *Di sedsala dawî de, rewşa edebiyata kurdî ya li bakurê Kurdistanê li ber çavan e, di heftê salan de heft pirtûkên bi kurdî derneketine, gelo rewşa edebiyata kurdî li başûr çawan bû? Ger tu resimekî heftê salane yê başûrê welêt, digel siyasî, şer, şoreş û demên aştîyê raxî ber çavan, wê resimekî edebiyatê yê çawan derkeve meydana? Di wî resimê de şî'r cihêkî çawan digire?*

– Li Başûrê Kurdistanê di van 150 salên dawiyê de û ta radeyekê li Rojhelata Kurdistanê jî, edebiyat roj bi roj bi pêş ketiye. Ji ber hindê mirov nikare muqayesaya rewşa başûr û bakûr bi hevûdu re bike. Sebebên siyasî, sebebên dînî weha kirine ku li başûr edebiyat bi pêş bikeve. Bi taybetî ji sala 1918-19 heta niha jî li başûr jiyaneke kulturî ya dewlemend hebûye û roj bi roj dewlemendtir bûye; rojname û kovarên kurdî ku di serdema Şêx Meh-

mûd de dest pê kirine, bûne sebeb ku edebiyat û ziman bi pêş bikevin. Herweha ji wan salan ve ye ku li başûr zimanê kurdî bûye zimanê xwendinê, zarokên kurd beşeke mezin ji xwendina xwe di mekteban de bi kurdî xwendine. Ev tişte-kî giring e. Jiyana rojnamegerî ji 1918-19'an dest pê kiriye û heta niha jî berde-wam e.

Rast e şî'r di nava edebiyata kurdî de forma herî mezin bûye, lê ev heta salên 40 û ber bi 50 weha bûye. Lê paşê rewş hatiye guhartin, êdî pexşan; çîrok, şano-gerî, rexne, gotar, nivîsarên siyasî û gelek şêweyên din yê edebî di edebiyata kurdî de dest pê kirine.

Niha gelekî zehmet e ku ez bikaribim di cihêkî weha de wêneyeke giştî li ser ferheng û kultûra kurdî li başûrê Kurdistanê karibim pêşan bidim û ne hêsan e jî ku dîroka ferhenga kurdî ya 70-100 salan di nava çend deqîqeyan de kurt bikim, lê bi giştî ez dikarim bêjim: Eger zordestî li ser Neteweyê Kurd hebûne jî û rewşa siyasî gelek jî xirab bûye; her şoreş bi girtin û kuştin hatine domandin, lê şanaziyeke mezin e ku ziman û edebiyat roj bi roj bi pêş ketine, geş bûne û berdewam bûne. Ev xaleke geş û girîng e di dîroka ferhengî û kulturî de. Lê rastî jî ev e divê em gelek mexrûr nebin, ji xwe bayî jî nebin û nebêjin ku *edebiyata me bi pêş ketiye û em gihîştine qonaxeke mezin*. Divê em bi çavêkî waqî'î û realistî li edebiyata xwe binnerin. Em dibînin ku em di gelek buwa-

ran de, di gelek mecalan de li paş mane. Erê rast e şî'ra kurdî bi pêş ketiye lê edebiyat ne wisan e. Bo nimûne ez dikarim bêjim ku rexne bi giştî di edebiyata kurdî de li paş maye û mirov dikare bêje ku rexne di edebiyata kurdî de tune. Herweha edebiyata zarokan jî paşketî ye û hin aliyên din jî hene ku paşketî ne. Lê dîsan jî mirov kêfxweş e ku Kurd roj bi roj dixwazin edebiyata xwe dewlemendtir bikin.

– *Ger mirov behsa demeke aktîv ya edebiyatê li başûrê welêt bike, mirov ê bikaribe di navbera kîjan salan de bike? Di wan salan de rewşa şî'rê çawan bû? Munaqeseya tendensên edebî mîna: surrealîzm, futurîzm, realizm û izmên din dihatin kirin? Tu bi xwe nêzîkî kîjan izmê bû?*

– Gava em li dîroka edebiyata kurdî ya başûrê Kurdistanê dinerin, bi rastî em çend qonaxên-serdemên cihê dibînin. Qonaxên herî aktîv û baş, mirov dikare bêje ku salên 1940-50 bûne. Paşê 1959 heta 1962'an qonaxek pir dewlemend û baş bûye. Lê ji wan herî dewlemendtir û bi pêşketîtir bêguman salên 1970 heta 74'an bûne. Di wan salan de bi rastî edebiyata kurdî bi pêş ketiye û mecaleke baş ji bo ronakbîrên kurd vebûbû ku berhemên xwe binivîsin û belav bikin, munaqesê bikin û behs bikin. Di vê qonaxa dawîn de gelek meseleyên fikrî û îdeolojî di teoriyê de hatin behskirin.

Jiyana min a edebî jî, di wan salan de dest pê kiriye. Di destpêkê de çî dikete destên min, min ew dixwendin weke şî'r,

teoriya edebiyatê, rexne û her çi hebûya, şî'r û meqaleyên min jî di kovar û rojnâmeyan de dihatin weşandin.

Wê çaxê min tenê du ziman -kurdî û erebî- dizanibûn. Paşê di salên dawiyê de Îngilîziya min baştir bû û ez farisî jî hîn-bûm. Di destpêkê de bi rastî ez pir nêzikî *surealîzmê* bûm û beşek ji wê qonaxê jî *dadaîzm* bû ku min hez jê dikir. Lê ew qonaxê kurt bû. Paşê sebebên siyasî-îdeolojî weha kirin ku ez şî'roke vekirîtir binivîsin da xelk jê rind fêhm bike. Ew jî îzmeke din bû. Lê van 15-20 salên dawî êdî ez nikarim bêjim ku ez ji aliyê edebî ve nêzikî çi îzmeke me. Eger mirov îzmeke bi kar bîne, ez zêdetir nêzikî edebiyata resewuf û sofîgeriyê me ku behsa hundurê însan dike û ku edebiyata beşên weşartî yên di ruh û giyana mirovan de tîne zimên.

-Tê gotin ku li welatekî Emerîka Latîni şair belaş li otobusan siwar dibûn, yanî ew ji nivîskarên nesîrê bi qîmettir bûn. Li hin welatên şerqê jî şair mîna pêxemberan dihatin dîtin. Li Kurdistanê rewşa we bi gel re çawan bû, an jî gel û civakê çi qîmet didan şairan?

- Bi giştî li Rojhilatê û li Kurdistanê jî, bêguman, ciyê şa'ir ciyekî bilind e û xelk bi çavekî rêz û xoşewîstî lê dinêre, lê ne hemû kes, kesên ku şî'r nas dikin û ku şarezayîya wan li ser kultûr û edebiyatê hebe.

Ciyê şa'ir li Kurdistanê jî ciyekî mezin bûye, bi taybetî di serdemên klasîk de û

heta salên 1920-30 jî. Lê ciyê şa'irên klasîk ji ciyê şa'irên îro mezintir bûye. Îro bi xwe jî li Kurdistanê ciyê şa'ir ciyekî baş e û xelk jê hez dike. Lê rastiyeke din heye ku divê mirov behsa wê jî bike ku siyaseta an nixêna siyasî îro cihê nixêna edebî girtine.

Di salên 70'yî de çaxê em li unîversîteya Bexdayê xwendkar bûn, li wir em sêçar şa'ir hebûn ku li eynî beşê dixwendin. Çi xwendekaran û çi xwendekarên beşên din ku edebiyat nas dikirin, ji me hez dikirin û bi çavekî rêz û xoşewîstî li me dinêrin. Ne tenê wan, mamostayên me jî bi çavekî taybetî li me dinêrin. Herweha şa'irên din ku di civata kurdî de nix û cihê wan hebû û ku xelkê hez ji wan dikir, pêşan dida ku ciyê şa'ir li Rojhilatê heye, lê ne wek berê.

- Min gelek caran ji te bihîstiye ku tu Goran mîna bavê şîira kurdî ya modern dibînî? Tu dikarî hinekî behsa modernîzma Goran bikî û tesîra wî ya li ser nivîsê li dû wî binî ziman?

- Li ser destên mamosta Goran çend aliyên nûkirin yan tazekirina şî'ra kurdî hene. Aliyê ku pir girîng e, mesela zimên e. Yek, mamosta Goran şî'rên xwe zimanekî nivîsiye ku zimanê kurdiya petî, kurdiya pak e. Duhem, ji aliyê forma ve: Şa'irên klasîk hemû "erûz" an weznên "behr" ên klasîk ên erebî û farisî bi kar anîne. Cara yekem mamoste Goran e ku li dijê wan forma derketiye û forma kurdî bi kar anîye û wan forma ji folk-

lor û stranên kurdî girtine. Ev guhartina formê ji bo şî'ra kurdî gaveke mezin bû. Sêhem jî bêguman naverok e. Goran şa'irekî romantîk bû, bi taybetî beşeke dûr û dirêj di jiyana wî de wek şa'irekî romantîk pir serketî û mezin bû. Navero-ka şî'ra kurdî ji wesfên klasîkî, ji wêneyên klasîkî, ji derbirrînên klasîkî rizgar kiriye û aniye qonaxeke din ku tazebûn û modernîzm tê de aşkira bûne. Ev çî ji aliyê bikaranîna zimên ve be, çî ji aliyê derbirrîn û ji aliyê wêneyan û metaforên şî'ri ve be ji gelek aliyan ve taze kiriye.

Di destpêkê de tesîra mamosta Goran li ser nîfşên an neweyên taze, mezin bû. Yanî şa'irên genc bixwazin û nexwazin jî, di destpêkê de diketin binê tesîra wî. Lê çawa ku zarokek gava mezin dibe hem şexsiyeta dê û bavê xwe digire, herweha şexsiyeteke taybetî bo wî jî çêdibe, bo me jî weha çêbû. Rast e ku di destpêkê de tesîra mamosta Goran li ser me hemiyan hebû, lê paşî her yekê me şexsiyeteke edebî, ya şa'irî peyda bû û bû sebeb jî ku em hêdî, hêdî ji binê tesîra mamosta Goran derbikevin. Lê îro mirov nikare bêje ku êdî tesîra mamosta Goran li ser nîfşa me û nîfşên ku li paş me hatine maye.

– *Mîna em dizanin niha gelek ji şa'irên kurdîya jêr li derveyî welêt, li Ewrûpayê dijîn. Li Ewrûpayê jî prosa di pêşiya şîrê de ye. Gelo tesîrên vê yên erînê û neyînî çî ne? An jî jiyana sirgûnê tesîrên çawan li şa'irekî dike?*

– Em kesên wek şa'ir ku me di salên

70-yî de dest pê kiribû, bawer dikim ku em şeş-heft kes bûn. Lê seyr ew e ku piraniya me ji Kurdistanê derketin û li dinyayê belav bûn. Bawer dikim ku niha tenê yek li Kurdistanê maye. Bêguman awayeyî û tarawge tesîreke mezin li şa'irî dike. Bi dîtina min ev tesîr jî du alî ne. Yek tesîra wê kultûr û ferhenga ku mirov dikeve navê ye. Eger em rohnîtir bikin, zimanên ku mirov fêr dibe û pê dixwêne, tesîr dike. Lewra mirov bi riya zimanan kultur, ferheng û edebiyatên miletên din nas dike. Her yek ji me jî, ezmûneke (tecrûbeyeke) me ya taybetî çêbûye. Ji ber ku her yekê me, em ketin welatekî cuda û çend zinanine cihê fêr bûn, çend edebiyatîne din nas kirin. Ji ber hindê jî, ev meseleyeke girîng e. Îcar mirov bi hêsanî care wê tesîrê di berhemên wan şa'irên kurdên li derveyî welêt de bibîne.

Giringiyeke din jî ev e ku psîkolojî ye; his û tecrûbeyên mirov di warê hunerê de zêdetir dibin. Mesela bo min tarawge (eksil) tecrûbeyeke pir dûr, dirêj û mezin e. Her nebe tesîr kiriye ku êdî ez şî'rê bi new'ekî din dinivîsim û bo min ne girîng e jî ku xelk şî'rên min fêm bike yan na. Bo min ne girîng e ez behsa tiştêkî bikim ku li ber çavên xelkê be jî, lewra ez behsa tiştêkî dikim ku ne li ber çavên xelkê ye, dixwazim bîr û hestên hundurê mirov pêşan bidim û derbirrim.

– *Gotina alimekî heye, dibêje carinan pirtûkek dikare ji şerekî mezintir bibe. Bi hêlên vê yên erînê û neyînî re, şî'rek jî dika-*

re ji şerekî mezintir bibe. Di welatên ku di şerê azadiyê de ne, doza şîra şerker ji şairan tê kirin. Herweha şîr ji bo yên ku ji bo azadiya wan welatan an jî sinîfan bûne sembol jî hatine nivîsandin û tê nivîsandin. Mîna tê zanîn, di dema şerê siyasî û civakî yê Bolşevîkan de li ser Lenîn gelek şîr hatine nivîsandin. Serkêşê tevgera Futurîzma rûsî Mayakovskî bi xwe gelek şîr li ser Lenîn nivîsandine. Di dema şerê xelasîyê li Tirkîyeyê û piştî wê bi heftê salan jî ji aliyê şairên Tirkîyeyê yê bijarte mîna Nazim Hikmet, Atilla İlhan, Fazil Hüsnü Dağlarca û bi dehan şairên din li ser Mustafa Kemal gelek şîr nivîsandine. Li ser Mustafa Berzanî jî gelek şîr hatine nivîsandin. Îro jî li ser hin serokên din jî gelek şîr tên nivîsandin. Tu şîra bi vî babetî çawan dibîni? Tu dikarî hinekî bi firehî behsa tekiyên huner û politikayê biki?

– Ez li virê naxwazim ku teoriyeke din bînim meydanê û ji xelkên din, ji ronakbîr û şairan bixwazim ku li gora vê teoriyê bifikirin û kar bikin, ez tenê behsa bîrûbaweriyên xwe dikim. Ew mesela ku "nivîskar bo kê dinivîse" û "divê ku pêwendiyên nivîskar û xelkê çewan be" bawer nakim ku taze be û ev mesele ji zû ve heye û pir jî hatiye behskirin. Lê ewên ku hemîşe xwestine û kar jî kirine ku ev mesele jîndar bimîne, kesine wisan bûne ku li meselê bi ruwange û çavên siyasê nehiştine. Di nava wan de bi taybetî ji hemîyan zêdetir bo marksîstan girîng bûye ku bo mebestên xwe yê siyasî edebiyatê

jî, şîrê jî û hunerê jî berdest bikin û ji xwe re bikin mîna nêrdewanekê. Hemîşe jî yek beyan û yek belgeyê wan hebûye ku xizmeta millet, ya kesên hejar, feqîr û belengaz bikin, lê wek yasayeke qanûneke polîtî bi kar anîne bo îşkencekirina hunermend, bo dîlkirina hunerê da bexin nava çarçevayekê. Yanî pîvaneke ne edebî û ne hunerî, bo meseleyeke edebî û hunerî bi kar anîne.

Ez nikarim bêjim ku şîra baş bila bo hemû kesî be û her kes jê têbihêgîje. Gotina ku "çima bila hemû kes jê fêm bike" jî, lewra her kes li şîrê nagere, naxwîne û jê fam jî nake. Herweha hêsanbûna şîrê jî nabe delîl û belge bo başbûn û çakbûna wê. Eger şa'ir bi azadiya xwe arezû be ku aliyekî bigire û ji xwe re bereyekî hilbijêre, bila bike û ez ne li dijim jî. Lê kesekî din eger şa'ir mecbûr bike ku ew aliyekî hilbijêre, ne rast e û dijî hunerê ye jî.

Ez ê ji edebiyata kurdî behsa çend nîmûneyan bikim: *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî di nava hemû berhemên edebiyata kurdî de zêdetir hatiye naskirin. Lê çewa ku min berê jî behs kiriye, ez bawer nakim ku ji ronakbîrên Kurd ên ku *Mem û Zîn* fêm kirine, ji sedî pênc zêdetir bin. *Lê gelo ev tê wê manê ku Mem û Zîn ne edebiyateke bilind e? Yan ne baş û ne girîng û ne mezin e! Na, ez weha nabînim! Herweha nayê wê manê jî ku Mem û Zîn ne bo mirovê Kurd, ne bo Neteweyê Kurd, ne bo hejar û belengazên kurd hatiye nivîsandin. Ev mesele ne tenê bo Mem û*

Zinê, bo şa'irên din jî wek şî'rên Melayê Cizîrî, yên Mewlewî û yên Nalî jî her weha ne; edebiyatîne pir bilind û berz in, lê gelek kêx xelk wana fêx û nas dike. Ev kêmnaskirin û kêmfêmkirin hergîz nabit belge ku qîmeta wan ya edebî jî kêx dike.

Eger mirov nimûneyên şî'ra hêsan û sade bixwaze, ew jî gelek in: Şî'rên Qanî yên Cegerxwîn bibîne, yên Hejar, ta hedekê yên Hêmin jî.

Mesela ferheng û edebiyatê ku bi xelkê re bin û bibin pêşeng û rêşanên xelkê jî, ji aliyê lojîkî ve ne rast e û gotineke ne zanistî ye. Ev derbîrîn û gotineke siyasî ya rût e. Ev derbîrîna siyasî jî weha dibîne ku *dinya hemû di nava şer de ye û mirov hemû ber bi şerekî mezin ve dişin, divê ku ronakbîr û hunermend jî digel şî'r û dîwanên xwe bikevin pêşîya wan û herin şer*. Lê eger ferheng û edebiyat ku bixwazin bibin pêşeng, komel û civatê biguherînin herweha bibin sebebê bipêşketina bîr û têgihîştin û eqlê mirovan, ne karê rojekê-du rojan e, ne karê salekê-du salan e jî. Ev bi dehan sal û bigire bi sedan sal jî digire. Ev meseleyeke şaristanîyet e, meseleyeke kultûrî û ferhengî ye ku jê re wextekî dîrûdirêj dixwaze.

Li ser şî'ra berengarî yan berhelîstî ya siyasî, bêje nebêje ku bo şerê rizgarî bi kar bêt, diyardeyeke (fenomeneke) ku li ba mîletên bo rizgarî û serbixweyîya welatê xwe xebat dikin heye û bi pêş dikeve. Tebî'et û siruştî dagirkirina welatan ji aliyê

hêzên bêgane ve û xebata gelên bindest bo rizgariyê, ji gelek aliyan ve weke hev in. Ev fenomen û bagera gelek mîletan ku hene, bûne sebeb ku şî'ra berhelîstî û şî'ra xebatkarî çî ji aliyê form ve û çî ji aliyê naverokê ve li cem mîletên cihê-cihê wek hev in. Bi gotinên wek *"Em can û ruhê xwe dibexşînin, em dar û kevirên welat bi xwîna xwe dixemilînin, em axa bab û bapîran rizgar dikin, em serbazên dijmin jî welatê xwe derdixînin"* hin wêne ne ku em di edebiyata gelek mîletan de jî dibînin. Lewra ev cûre şî'r erkekî xwe yê siyasî heye, da bi giştî xelkê germ bikin û wan bo xebatê amade bikin. Ev bikaranîn kareseyeke hunerî ye bo mebesteke siyasî.

Hin welatên ku paşê rizgar bûne û ku hêzeke siyasî, şoreşgêr û xwedanê îdeolojiyêke radîkal ku desthelatî girtiye destên xwe, ev fenomen û diyarde pileyek e û dereceyeke din jî bi ser dikeve. Wê gavê şî'r ne tenê dibê şî'reke siyasî, herweha dibê mîkrofona îdeolojiya desthelatdaran û şa'ir jî di dezgehên masmediyayê de dibin karmendên wê îdeolojiyê. Ev jî eger şa'ir, şa'irekî baş be karmendî dikeve destên wî, lê eger ne baş be wê gavê şa'ir tenê dibê polis.

Siruştî şî'ra berhelîstî ya şerker û cengawer bi xwe weha ye ku kêx caran cih bo nîrxên hunerî û estetîkî dihêle. Lê dîsan jî şa'ir hene ku dikarin aliyê estetîkî û siyasî bi hevûdu ve girêbidin, şî'reke hunermendane û şoreşger binivîsin. Lê gava mirov li dîroka edebiyata mîletan dinere,

bi rastî yên weha gelek kê m in. Mumkin e Nazim Hikmet nimûneyeke baş be ku mirov behsa wî bike, lewra wî siyaset û huner bi hevûdu re guncandiye û kiriye berhemeke serketî ya baş.

Ger ez bi kurtî bêjim, ez weha dibînim ku ciyawaziya di navbera çend nîrxên cihê-cihê de ji hev dûr in; nîrxên estetîkî, nîrxên hunerî, nîrxên îdeolojî û siyasî... Bi dîtina min, nîrxên îdeolojî û siyasî zû dimirin û temenê wan kurt e. Lê temenê nîrxên hunerî, nîrxên estetîkî dirêj e û zêdetir dijîn. Herweha mirov dikare ji wan re bêje ku nemir in. Lewra hin nîrxên însanî hene ku ji deh hezar salan ve ye hêjî wek xwe mane û nehatine guhartin. Lê kîjan nîrxê siyasî hebe, nikare ji sed, sed û pêncî salan zêdetir bijî. Me di vê sedsala dawîn de dît ku hin deyan û siyaset hatin û heta ku nêzikê nivê dinyayê jî girtin, lê paşê rûxiyan û mirin. Ew, tenê bûn beşek ji dîrokê û mirov kare wan êdî di muze-xaneyan de bibîne.

Bi dîtina min, çi şa'irê ku bixwaze şa'irê baş be nêzikê nîrxên nemir, nîrxên estetîk û yên hunerî dibe, ji nîrxên ku zû dimirin jî dûr dibe.

– Ger tiştekî din ku tu bixwazî lê zêde bikî, tunebe, ez dixwazim em hevpeyvîna xwe bi pîrseke ku ji mêj ve tê munaqesekirin ve girê bidim. Şa'irê kurd kî ye? Yên ku bi kurdî nanivîstînin û bi zimanin din dinivîstînin, mirov dikare wan mîna şa'irên kurd bihesibîne? Bi gelemperî di edebiyatê de û bi taybetî jî di şa'irê de ji bo te rola zi-

man çi ye?

– Li vir gelek faktorên siyasî, îdeolojî û yên din hene ku rola xwe dilîzin. Îro li dinyayê gelek sînor hene û bûne hoyek ku bo nîrxên me jî sînor bêne danîn. Eger em piçekî di dîroka edebiyatê de berepaş biçin, em dibînin ku giringîya zimên li ba şa'irê berî hezar salî weke îro tune bûye. Ez ê nimûneyek ji edebiyata Rojhelatê bînim: Şa'irê weke Mewlana Celaledînê Romî û wek Nîzamî Gencewî. Dirokvanên edebî dibêjin ku Mewlana Celaledîn ji aliyê etnîkî ve "turk" bûye. Lê rastî ew e ku wî şa'irê xwe bi farisî nivîsîne. Ez bi xwe gava şa'irê Mewlana dixwînim, ez nafikirim ku ew turk bûye, faris bûye yan wekî din, ji ber ku şa'irê wî gelek girîng in, gelek bilind in, hunerî û nemir in, ji ber hindê ez ji wan hez dikim.

Ez keçeke Emerîkî nas dikim ku edebiyata Rojhelatê, bi taybetî jî ya farisî baş nas dike. Ew ji du aliyan e; aliyek Cihû ye û aliyek jî Fileh e. Rojekê me behsa edebiyata Mewlana Celaledîn dikir ku gava mirov şa'irê wî dixwîne, mirov tê de sînor û neteweyan nabîne; mirov dinyayeke pir fireh a unîversal dibîne. Wê got:

– Ez bi xwe Emerîkî me û ji du kultûran tîm. Gava ez jî şa'irê Celaledîn dixwînim, li ba min jî eynî his û şa'irê çêdibe.

Wê keçê jî mîna min, Mewlana wek mirov, wek şa'ir didît û li ziman, etnîk û bawerîya dînî nedifikirî.

Herweha Nîzamî Gencewî jî, em dizanin ku diya wî kurd bûye û mumkin e ku bavê wî -wek Azerbêcanî dibêjin- turk bûye. Lê bi farisî şî'r nivîsiye. Ev yek jî bo min nabe sebeb ku ez nîrxê Nîzamî kêmbikim, lewra ew bo min şa'îrekî mezin e.

Ev meseleyên ku min behs kirin, di dinyaya me ya îro de hatine guhertin. Îro dinya parçe-parçe bûye û sînor zêde bûne. Bo vê jî îro nebûna zimên, bikarneanîna zimên, yan perçiqandina zimên netîce û encamên xwe yê din hene. Bo nimûne: Eger zimanê miletekî bête qedexekirin, ew millet jî ber bi mirinê ve diçe û dibe sebeb jî ku ji azadiya xwe dûr bikeve. Niha ziman bo millet êdî bûye meseleke jiyana û mirinê. Bo vê jî mirov nikare êdî wek berê li zimên binere.

Îro bo min şa'îrê Kurd, ew kes e ku bi kurdî dinivîse. Ji ber ku roleke girîng a zimên heye û bo her miletekî, bo her neteweyekî jî bûye nasname.

Şa'îr û nivîskar eger bi kîjan zimanî binivîsin, di encamê da berhemên wan dibe milkên wî zimanî. Ev mesele îro êdî eşkera ye, lê hin sebeb hebûne ku şa'îr û nivîskarên hin miletan nikaribûne zimanê xwe bi kar bînin. Mesela miletê Cezayîrê çendî ku Ereb e jî, lê baştirîn şa'îr û nivîskarên wan bi frensî dinivîsin. Li Senegalê şa'îrê mezin Léopold Sédar Senghor ku paşê bû serekkomar jî, bi zimanê frensî dinivîsî, niha jî endamê akademiya Frensî ye.

Berhemên şa'îr û nivîskar, du aliyên

xwe hene: Aliyek ew e ku wek însan ji kîjan miletî ye pir girîng e. Eger em nimûneyekê bidin wek Yaşar Kemal, tu bixwazî û nexwazî jî ew kurd e. Ew bi xwe jî, xwe kurd dibîne. Lê aliyê edebiyata wî, Turk e û bi turkî berhem dinivîse. Herweha Selman Ruşdî jî hindî ye, lê edebiyata wî îngilîzî ye.

Lê ji bo min, di nav çarçewa dîroka edebiyata kurdî de, nivîskarê kurd ew kes e ku bi zimanê kurdî dinivîse. ■

AZADÎ

Suleyman Demir


Heger ku tu vexwarinek bûya
ji bo ku tu bûba xweşt û biketa bedena min
min ê seranserê şev û rojan
bixwesta ez te vexwim.
Heger tu xwarinek bûya,
ji bo ku tu bûba xwîn û can
û biketa nav goştê bedena min,
min ê bixwesta te rojê sê dahnan bixwim.
Heger tu darek, ya jî gulek bûya,
ji bo ku min bikarîba te her demê bibînim û bêhn bikim
min ê tu bi destên xwe
di hewşa xwe de biçanda.
Heger tu qîzeke taxa me bûya
bêguman tu dê pîrr spehî bûya
min ê bê hedan bixwesta tu bibî a min
bawer be, min bi saxî tu nedida tu kesên din.
Lê heger tu birevandina ji ber min,
ez ê sozdarê te bima ma
bawer be dîsa wek aniha
hera ez li darê dinyê sax bûma.
Lê tu jiyana î,
te nadin min,
ciyê te asê ava kirine
kirasekî ji şînê li te kirine,
nirxekî ji xwînê li te kirine,
û tu buha yî û ez jî xizan im.
Lê ez dîsa dev ji te bernadim
ez ê her te bixwazim.

Ez aşîxwaz im,
îcarê ma gelo ji bo ku tu,
qet nebe bikaribî bê welatê min,
divê ez xwe bidim kuştin?

Tu dê bê,
bêguman tu dê bê...
tu dê wê çaxê bibînî
bê em çiqasî ji te hez dikin,
em ê kirasekî ji aşîtiyê li te bikin,
em ê li sûk û kuçên bajaran,
li gasînên gundan,
li ser benderan,
şai û dîlanên dirêj ji te re lidar bixin...
li hêlekê qîzên me di destên xortan de
û li hêla din jî dêyên xortan bi serbilindî
wê bidin ber hevdû û ji hatina te re bilînin,
wê xortên me te wek bûkeke salê hilînin û deynin
wê te ji bo jiyaneke seranserê emrê dirêj li ba xwe bigirin
wê welêt ji serî heta binî ji te re ava bikin
wê rûmeteke bilind bidin te
wê navê te li zarokên xwe bikin.

Tu dê bê,
tu dê rojekê bê,
lê nizanîm bê kengî!
Ev hêviyê mezin e,
xwestineke bêhedan e,
ez nikarim ji dilê xwe derxim.
De ka mizgîniyekê bide min
bila êdî qîz û lawên min
hemû bi te re mezin bibin
bila nema bîn kuştin.

Min bi tenê nehêlin



Sidqî Hîrorî

Berî sê heyvan, hevalê min yê nêzik Babê Gulê, di jiyê 57 saliyê de li Stokholmê mir. Ez bi hindê gelek xemgîn bûm. Hedara min pir bi wî dihat û ez ji wî hînî gelek tiştan bûbûm. Mebesta min di warê pirsê gel û welatê me û di warê ziman, rênivîsa kurdî û her wisa di edebê çîrok û romanên de. Ya herî girîngtir, ew bo dostanî û hevaltiya pir xweş bû û ji her kesekî re û nemaze ji dostan re hindî jê bihata pir arîkar bû. Babê gulê, ji Diyarbêkrê bû. Bi Kurdistanî û

miletperweriya xwe pir naskirî bû û gelek caran li ser hindê, li welatî, li ser destên desthilatdarên tirk hate girtin û êşandin û deh salan hate zindankirin. Piştî ku cûntaya tirk sala 1980'an li Tirkîyê hatiye ser hukmî, desthilatdarên Enqereyê xwestin derbeke li Babê Gulê bidin, lewma neçar bû, ne ji dil nîştîmanê xwe yê li ber dil û canê wî pir şîrîn bihêle û bi riya qeçaxçiyên xwe bigehîne Swêdê.

Li swêdê her ji destpêka hatina xwe, xwe da ber pirsên ziman û edeba kurdî û xwe di wî warî de pir pêxist û bi berdewamî di redaksyonên gelek kovar û rojnameyên ku bi kurdî derdikevin kar

dikir û dinivîsand. Tiştê ku wî dixwest bigehyê ew bû ku bikaribe roman û çîrokên baş bi kurdî binvîse, lê roman û çîrokên weha ku girêdayî xelk û welatê wî bin, girêdayî maf û azadiya mirovan li welatê wî bin, ku pê bikaribe perîşanî û bindestiya xelkê welatê xwe yê li bin dagîrikirinê ji herdu aliyên civakî û netewî bîne berçavan û riyê li ber rêçareyan xweş bike.

Rast e ji bîlî nivîsên wî yên di kovar, rojname û belavokên kurdî de hatine weşandin çî pirtûkeke wî ya çapkirî nîne. Lê hêştaw ew yê sax, wî pênc romanên xwe û du pirtûkên kurteçîrokên nîşanî min dabûn û ji min xestibû ez wan bixwînim û dîtînen xwe weku xwenedvanekî li ser derbibrim bona ku li gor wan dîtînen min guhertînen pêwîst li ser wan bike. Mebesta wî ji xwendina min bo wan ew bû bizanibe ka zimanê wan ji min re weku xwenedvanekî çawa ye, hêsan e û bê zehmet dihête xwendin yan giran e û xelîk nikarin baş fêhim bikin û xweşiya xwe tê de nabînin. Dixwest bizanibe ka xweş û bê rawestan dihêne xwendin û mirovî bi xwe re dibin û dikîşînin bo nav û mereqê li ba mirovî çêdikin ku mirov li ser xwendina wan berdewam bibe û bixwaze dawîya wan bizane? Weha û ji ber gelek egerên din jî dixwest berfî çapkirina wan, ne ku bi tenê ez, lê her kesek be bila bibe, bixwîne bona ku li gor têbînîyên wî yan wan çend xwenedavanan çîrok û romana xwe avabike ve. Niha gotineke wî ya pir girîng di warê pêşketina karê nivîskariyê de dihête bîra min, wî digot "ez nikarim

gelek di nivîskariya xwe de pêşbikevim, ji ber ku bona ku ez bikarim berhemeke çêtir, avatir û hunerîtir ji yê berê biafirînim, pêwîstiya min bi awirdan û têbînîyên xwenedvanan û rexneyên rexnegiran heye û ew jî nayêne kirin ji ber ku pirtûkên min nehatine çapkirin û nehatine xwendin"

Bi dîtina min ew herpênc roman û herdu pirtûkên kurteçîrokên wî hem di warê hunerê teknîk û avakirina roman û çîrokên de û hem jî di warê zimanê wan yê xwerî kurdiyeke hêsan û sivik û xweş de pir li pêş in. Lê mixabin ew mir û wî berhemên xwe bi çapkirî ne dîtî. Ew li vir bêkar bû û ji fermamberiya arîkariyên civakî pareyekê pir kêr digehişt destên wî, hema bi xurtî debara xwe û jiyana rojane pê dikir. Ew ji hejarên Swêdê bû û weha niakribû pirtûkên xwe çap bike û xweziya wî ew bû rojekê zû welatê wî azad bibe û pirtûkên xwe li wê derê çap bike.

Wî jin û sê kur û kiçek hebûn. Hemû jî li Stokholmê bûn. Kuran, jin û zarokên xwe hebûn û kiçê berfî salekê şûkiryê. Ez hersê rojên taziye heta derengî şev li mala wan dimam û bo nivîstinê vedigeryam mal. Roja sê, dema min xatirê xwe xwestî û rabûm da ku bizivrim mal, pîreka wî li cem zarokên xwe yên ku li wir bûn ji min xwest rabiwestim ji ber ku tiştê min heye ku ez ligel xwe bibim mal. Ew û kurekê xwe çûn odeya wî ya nivîsînê û kartoneke mezin bi xwe re anîn. Jina wî kaxezkek girtî xiste nav destê min û got "ev name û ev karton mêrê min berfî mirina xwe ji te re hiştine û te ya

rast bivêt ez nizanim ka çi tê de ye." Min şerim kir li wir nameyê û kartonê vebikim, lewma min xatirê xwe ji wan xwest û ez bi nameyê û kartonê ve vegeryam mal.

Li mal, hê min dergeh li pişt xwe negirtî, min lempe hilkirin û karton deyna ber xwe û min sehkirê tiştên ku di kartonê de. Paşt min name vekir û xwend. Nameyeke pir kurt bû, ev tê de hatibû nivîsandin: *"Birayê hêja û xweştivî! Ez dizanim eve barekî giran e ez bi hêviya te ve dihêlim, lê min kesekî weku te cihê baweriyê be û xudanê peyman û soza xwe be nîne. Eve berhemên min in yên bi dawî hatî û yên bi nîvîmayî û yên hêsta destlêndayî. Te mafê hindê heye ku tu li gor zanîn û hezkirina xwe wan ji çapê re amade bikî û çap bikî. Daxwaza min ya yekane ji te ewe ku ev berheme nemînin di wê kartonê de û zû bikevin nav destên xwendevanên kurd. Serkefî bî di kar û jiyana xwe de. Birayê te Babê Gulê."* Paşê careke din vegeryam ser kartonê, Karton du beşbûn; ji serve kaxezeke stûr ya sipî li ser bû û li ser nivîsandibû "Berhemên amade bo çapê", ew jî her pênc roman û du pirtûkên kurteçîrokan û ferhengeke kurdî - kurdî û pirtûkeke li ser dîroka edebê kurdî bû. Di bin wan de kaxezeke dî ya spî hebû û li ser nivîsbû "Berhemên ne timambûyî", gelek kaxez û destnivîs û têbînîyên li ser parçe kaxezan di bin de bûn

Ez nêzî heftiyekê ketim ber wan kaxezan û min xwendin. Di piraniyê de hê di zerfên xwe de bûn û ji adresan û hejmarên postê diyare ka ji kûderê harine û kengî. Ji wan

kaxezan yekê bala min pir kêşa, lê çi navnîşanek ji bilî yê Babê Gulê li ser zerfê nebû. Kaxez jî bi kurdiyêke xweş hatiye nivîsandin, lê ne kurdî û destxerê Babê Gulê ye. Xuyaye ku name ji ba kesekî hatiye û Babê Gulê xwendiyê, lê çi destkarî tê de nekirine. Xwe wî hertim digot min "berî tu tiştêkî ji nû de binivîstî divêt tu gelek caran bi dirêjîya demekî ne destnîşankirî bixwînî bona ku babet di serê te de, di nava te de bigehe loka afrandinê û te ji nav de neçar bike ku tu dest bidî nivîsandinê, ku berhemekî hêja û bi kêrhatî ji wê nivîsê yan wê hizrê durust bikî". Ez li vir nameyê bê çi guhertin, ji bilî hinek rastkirinan di warê rêziman û rênivîsê de, diêxim ber çavên we û eve jî deqa wê ye:

"Heyho dinyayê! Em hindî dijîn xweziyên rojên borî dikîn. Wey pa rojeke xweş bû, çi cara ji bîra min naçe. Min di wê rojê de hest pê kir ku laşê min xwe hew li min digire û tiştêkî ji min dixwaze. Çi tamên xweştir ji ya wê gavê nînin. Eger tirs û şerma min ji xelkî nebaya, min ew gav dikirin roj û meh û sal û min laşê xwe ji laşê wî venedikir.

Hersal xwîşk û birayên min diçûn çiyayê Cûdî bo ser canê Nûhî û hersê ewliyayan, lê ez bi xwe re nedibirim. Çûna wê derê jî li ba min bibû mereqeke pir mezin, bi taybetî piştî ku ji wê derê vedigeryan mal û behsa serhatiyên xwe yên herşê rojên seredana xwe li Cûdî dikir. Di wê salê de keçikên hevjiyên min destûr ji malbatên xwe stendin ku biçin wê seyranê, evca bû lave lava min jî, li dawîya dawiyê malbata min qayilbû ku ez jî bi

birayên xwe re biçim.

Roja şembî, giş qolên ku ji deverên cuda cuda ji dorhêla Cûdî hatin li binê çiyayî xirvebûn, bona ku bi hehu re lê serbikevin. Ve-ger jî divêt nîvroja pêncşembî be. Çinkî, dibêjin ku êvariya roja pêncşembî canên wan hersê ewliyayan di rengên sê kotiran de ji esmanan dihêne xwarê û li ser Cûdî dadidin û hemû roja eyniyê li wêderê dimînin. Û eger kesek li wir be canên wan nêzikî Cûdî nabin. Lewma jî divê Cûdî spêdeya roja pêncşembî bihête berdan, da ku ew cih bi hatina canên wan hersê ewliyayan bihête pîrozkin.

Ji bo serkeftina çiyayî rêyeke taybetî heye, ew jî pir sext û zehmet û asê ye. Lewma li wêderê rêberên ku rêbarên çiyayî baş nasdikin hene û ew dikevin pêşiya birên mirovan û wan ber bi gupîska Cûdî dibin. Xwe râyên hêsantir jî hene, lê bo seredanê û bona ku bi xêr bihête nivîsandin divêt mirov di wê riyê de here. Vê çendê jî serhatiya xwe heye.

Dibêjin dewrekê... zemanekî ewliyayek ji devereke dûr bo seredana canê Nûhî li serê Cûdî hat. Dibêjin piştî pazde rojên riyeye dijwar û zehmet ewliya mandî dibe, ji hêz dikeve. Evca li cihekî li bin girê cihê mebesta xwe rûdîne û bêhna xwe dide. Di wê gavê de kalekî porspî, dêmsirîn û rû xweş, rastî wî dibe. Ewliyayê westiyayî piştî silavê û bi xêrhatin lêkirinê pirsyarê jî pîremêrî dike ka çend dem ji wî re maye bona ku bigehe ser gorra Nûhî. Kal jî ku şeytan bû û xwe bi wî rengî guhertibû ji ewliyayî dipirse:

– Ma ev çend rojên te ne tu bi rê de yî?

– Evro pazde roj in ez bi rê de me, ewliya

weha bersivê dide.

– Heyho ewliyayo! Şeytan wilo lê vedigerîne. Hêş ya bi zehmet li pêşiya te ye. Te heta niha nivê riyê biriye û hê nivê diwartir maye.

Piştî wê axiftina xwe Şeytan rêya xwe digire û diçe û ewliya di bêhvbûnê de dihêle.

Ewliya bêzar dibe û di xwe re nabîne ku pazde rojên din jî bi rê ve bimîne û nizanibû ku ew Şeytan bû û derew li wî kiriye û nizanibû ku gora Nûhî çend gavekan wêvetirî wî bi ser wî de ye. Lewma ew ji Xudê dixwaze ku canê wî li wir jê bistîne. Xudê jî bêdiliya ewliyayê xwe nake û daxwaziya wî bicih diîne.

Çaxê em gehîstine wê derê rêberê me destê xwe dirêjî girekê mezinê berhûr û keviran kir û got:

– Aha wê hanê ye cihê ku Şeytanî ewliya lê rawestandî û bêhiv kirî.

Hê rêberî axiftina xwe timam nekirî hey li wî û babê wî yê zû dest bide ber û keviran û li wî girê bide, her weçku Şeytan bi xwe li wir e û dixwaze me di serda bibe û em bera li wî didin ji bona ku ew xwe ji rîya me bide paş.

Êvarê, ber bi roj avabûnê, em rawestiyan dema rêberî cihek ji me re destmîşankirî û gotî ku ew cihê rûniştin, bêhinvedan û xwarinê ye. Her çend kesek yan çend malek çûn nav çeperokekî ku mîna dîwarên xanîkan, lê nizim çêkirî bûn û codelî û tiştên xwe rawêxistin, mèdeken xwe vekirin û dest bi xwarinê kir.

Ez dizanim ka hûn çend bêhinteng in û

hûn dixwazin zû dûmahiyê bizanin. Ez jî serê gelek li we gêjnakim û dê yekser çime ser behsa tiştê di wê seredanê de li ba min herî girîng, ew jî çavên wî xurtî bûn. Raste me hemûyan, keç û xurtan di bin mijûlankên çavên xwe re bi dizîkî ve temaşayî hevûdu dikir, lê çavên wî ji min re ne weku hemû çavan bûn. Berêxwedanên wî weke birûsiyekê xwe li laşê min werdikir û lertzîkek pê bi min dîkefî. Te digot qey çavên wî bi destên min digirin û cilikan ji ber min dikin, diperritînin. Yê ji gelek xurtan bîstehtir bû, çavzilkanê jî digel min dikir. Min li ber wan berêxwedanên wî yên pir mê û dijwar ser li xwe diçemand. Lê di rastiye de ez nikaribûm wî dêmî û wan çavan ji hizra xwe dûrbêxim.

Min li wir didît ka çawan gîz û xurt xwe ji dayik, bab, kes û karên xwe divedizin û diçin pişt wan ber û keviran û ya dîtir di navbera wan de diqewimî. Lê min ew bîsteh nedikir û her weku dibêjin ez disotim û ne dihate gotin.

Wî xwe gelek caran nêzîkî min dikir û çavên wî tiştêk ji min dixwest. Ez di daxwaza wî digehîstîm, lê ez pir dîtirsiyam û min xwe di wî nedigehand. Ma qey ez dikaribûm xwe bilivînîm!? Nê hersê birayên min zêrevanên dayik û babê bûn ligel min.

Heyamekî, min dît ku birayên min ne xuya ne, çi xîş têde nîne ew jî bi qîzan re bûn. Xwe piraniya keç û kuran ne ji bo seredana canê Nûhî û hersê ewliyayan, lê ji bo kêfa dil û laşên xwe dihatin wê derê. Min hingê, ji nû ew rastiye zanî û min digote xwe "xwezî

ez berî niha hatibame vî cihî."

Roja duwê, xurt û keç çûn ser gupîtka çiyayî û ji kombefran berifanî ji bona ku wê bihelînin û bikin ava vexwarinê. Roja dîtirê, roja softî û feqeyan bû. Hemû li ser banê mezarî xirvebûn. Wan hinde gotin bi stirankî û bi zîmanekî biyanî, dibe ku erebî bû, digotin û hinan jî li defan dixist. Du sê kesek jî li hindav serên xelkê ku hatiye seredanê bûn, şiftan di dest wan de bûn, her kesekê ku henekên xwe bi zîkrî kiribana şiftan li piştta wî didan û eger dev ji hindê bernedabaya ew kes jî wê derê derdixist. Li wê derê kesine ku bi durustî zikir dikirin jî hebûn, ew jî dil û can diketine nav hundurê xwe, di dawiyê de xwe ji bîr ve diki, bi cezbe diçûn, xwe ji serbanî dihavêjte xwarê û livînên wesa sehimdar dikirin, çirrîseyê pê serê mirovê digirt.

Bibûrin ku min hûn careke din ji bîngê serhatiyê dûrxistin. Kurt û kurmanc, em roja pêncşembî nêzîkî nûvro ji çiyayî xwarkeftin û piştî nûvro gehîştin binê Cûdî, wî cihê ku em û rêber jê ser bi çiyayî keftin. Li wê derê rûbarekî avê di rê de ye, ji bona ku em vebigerin diviyabaya me derbasbikraya. Hinan deling û dehmanên xwe hildan û hinek xurtan şel ji piyên xwe kirin û xwe dan avê û rê li keçên ji xwe biçûktir girtin û ji wan xwestin ku siwarî piştên wan bibin bona ku ew wan derbasî aliyê din yê avê bikin, bê ku cilkan wan ter bikin. Piraniya qîzikan siwarî piştên kurikan bûbûn û weha li avê derbas dibûn. Hinekan jî, qîz li nîva rûbarê dixistine nav avê û bi wî awayî beşê keyf û laqirdî û henekan dest pê dikir.

Di wan gavan de, ez hema hind dibînim ew xurtê ku laşê min bi çavên xwe dikêla yê li hember min e û ji min dixwaze ku siwarî piştta wî bibim, bona ku min derbasî rexê dî bike. Dev li min alizî û min nezani çî bersiv bidim û çavên min rik man li çavên wî. Ewî jî xwe li benda min û bersiva min ne girî, her wekî wî dizanî ka ez di nav xwe de çî dibêjim û çî dixwazim, hema yekser piştta xwe da ber min, ez jî bê hizirkirin lê siwar-bûm. Li nîva rûbarî, weku piraniya xurtan, wî jî ez xistim nava ava ne kûr, lê destê min yê rastê jî destê xwe yê çepê berneda. Dest da gilizankên min vekirin, min kire kenî û av li wî reşand. Xwe avête min û ez hêl kişandime ber xwe. Cilkên min yên tenik û terbiyî di avê de bi laşê min ve nûsiyan û her wisa yên wî jî. Laşê min bi laşê xwe ve şidand. Di wan gavan de ez çûme dinyayeke dîn, kêf û tirs û xuh û qute quta dilî û tiştine dîn di nava min de ariyan. Di avê de ez bi pêştra wî ya gerim hesiyam xwe dişidîne ser pêştra min, ez bi tilên wî hesiyam serên memikên min digirin û diperixînin û wan rep dikin. Ez bawer nakim çî gawek ji wê gavê xweştir be û ew ji her tiştêkî bêtir li bîra min e.

Niha ku diînim bîra xwe, ez her wê tama cara yekem jê sehdkim, dema laşê min yê mê bo cara yekem bi laşêkî nêr ve nûsiyayî. Her di wan gavan de, digel wê xwe pêkvenûsandin û gemirandîna laşan de, devê xwe anî bo binguhê min û got:

– Xwe piçek sivik bike, ez dê li pişt kevirê hanê li benda te bim, min axiftinek heye ez dixwazim bibêjim te.

Min nerî ku birayên min û yên niyas bi hevûdu ve mijul in, min jî xwe ji wan vedizî û ber bi wî kevirî çûm yê ku wî xwe li pişt veşartî. Wê gavê laşê min pir arwayî bû û her parçeyekê awazek û daxwazek hebû. Her çende em weha hatibûn perwerdekirin ku ew kar û tiştêkî qedexe ye, guneh e, xelkê me jî hertim weha digot, lê piraniyê guhdariya wan şîretan ne dikir û bi dizîkî ve, bi veşarkî, ew dikir. Ez jî yek bûm ji wê civakê, min jî hez dikir lê şerim dikir û ditirsiyam, lê li pişt wî kevirî tirs û şerim hatine serjêkirin û min bo cara yekem di jiyê bîst saliyê de ew xweştî tam kir. Min zanî ku navê wî Memo ye û hevbajêrkîyê min e. Xwendinkar e li sala dawiyê ya lîseyê (amadeyî) û dê piştî hîngê xwendîna xwe li universîteyê li Diyarbekrê li fekulta ekonomiyê bidomîne. Ez bi xwe wê çaxê xwendinkara klasa dawiyê ya navîn bûm. Ew çar salan ji min mezintir bû, lê xurtir ji jiyê xwe dihate ber çavan.

Jivan û çavpêkeftinên me dubare û sêbare û çend bare bûn û xelkê jî pê zanî. Dayûbabên min ji wê danûstandîna min û Memoyî pir nerehet bûn û xwestin ez dev ji wî berbidim. Lê bi rastî, êdî ji hindê derketibû û ez Memoyî ez bi hemî ve dagîr kiribûm û ez nikaribûm bê wî bijîm. Serî li we gêjnakim, dawîya dawî û her çende bi dilê mala me nebû jî, min şû pê kir.

Salekê piştî zewacê xwest bihête derveyî welatî. Mesele çî bû...çî nebû; ez weha têgehandim ku ji ber xebata wî ya siyasî MÎT li pey wî ne û eger ne derbikeve dê bihête girtin. Nizanim di çî rêxistin û partiyê de bû,

lê wî jî mîna birayên min bi şev û roj qala şoresgerên tirkan dikir û ew in ku dê Tirkîyê kine beheştê ser rûyê dinyayê. Ez ji we naveşêrim ku birayên min gelek hewil dan ku ez şû bi yekê tirk bikim û digotin min ku divê ez bê yek û du şû bi wî bikim ji ber ku ew çep û şoresgerê tirka ye. Bi rastî min gub neda wan, ji ber ku; yek min hez ji wî kesî nedikir, du min pir hez dikir mêrê min kurd be.

Belê, mêrê min ez bi zikê heşt mehî ve bi tenê hêlam. Sal û niv bi ser wexera wî ve çûn, ne nûçe û ne name ji wî hatin û ne jî me zanî ka ew li kuderê ye û ka çi hatiye serê wî. Ez ditirsiyam ne ku Xudê neke tişteki xerab hatibe serê wî. Dûmahiyê birayên min yên bi şev û roj pirsyara dengûbasên wî dikirin zanîn ku ji Stembolê çûbû Almaniyayê û ji wê derê çûye Swêdê û niha li wê derê rûdine. Xelkê digot ku wî jineke swêdî aniye û Delalê, şikra min, nabe cem xwe. Lê, kesê ev suhbete li nik min nedikirin, ji ber ku wan dizanî ez pir hez jê dikim û ez bawer ji wan nakim. Bi rastî jî weha bû, ku kesekî bi xerabî qala wî li cem min kiriba ez dikaribûm wî kesî bi destên xwe bixeniqînim.

Navnîşana wî bi dest min keft û min ka-xezek jê ra şand û tê de jê xwest ku min jî bibê cem xwe bo Swêdê, heke ne ji ber min jî be hema ji ber keça xwe ya du salî. Lê bersiva wî tunebû. Hejmara telefona wî bi dest birayên min keft, wan jê re telefon kir û jê xwest ku çareyekê li min bike û wan gef jî lê kirin eger ew bi ya wan neke.

Piştî çend rojekan wî telefona mala me kir

û xwest bi min re bipeyive. Cara yekem piştî derketina wî, dengê wî hate ve guhên min û ez pir pê dişad bûm. Lê ez ji kêf û xeman nikaribûm biaxivim û peyiv di geuriya min de asê dibûn, kizgiryokê ez girtim. Hindî ew bû, bi dengê xwe yê normal bû, herçku ne yê xerîb bû. Lê min xwe bi hindê qayil kir ku zelam ne mîna jinan lawaz û nazdar in. Wî gote min ku dê sefareta swêdî li Stembolê bişîne dî min û dema ji min dipirsim ka ez çi ya wî me ku bibêjim ez dezgirtiya wî me û dê li Swêdê şû pê bikim. Lê çi xeber ji sefare-tê nebûn.

Min telefona wî kir û pirsra çûna sefaretê jê kir ka çi lêhat, wî got ku niha bizehmet keftiye û ne got ku wextê hatiye Swêdê ne gotiye ku jina wî li welatê wî heye. Weha, niha hêsan nîne wê bi awayekî fermî bibe Swêdê. Ji ber ku ji bona ku bi hêsantî û bi fermî min bibe Swêdê divê li gor zanîna daîreyên peywendîdar yên swêdî ez jina wî bim û wan çi agadariyêke wisa ji Memoyî ne bihîstibû dema daxwaza mafê rûniştinê li Swêdî kirî.

Hêve û wêve bir û li dawîya dawî û li bin fişara birayên min, bi riya geçaxçiyekî ez anîme Stokholmê. Min zû mafê rûniştinê li vir stand û em li fermanberiyên swêdî bi jin û mêrên hevûdu hatine nivîsandin. Herdu salên pêşîn ne hind dijwar bûn, herçende kêr li mal dîma û çi cara arikariya min di karûbarên navmalê de nedikir, lê dibe hê ez jî bi hizra reuşa jinê li welatê dijîyam, lewma min hest bi tişteki weha nedikir. Di wan du salan de min keçeke din jî jê bû. We rast bivê wî dixwest ku zarokê vê carê bibe, kur

be, lê eza xulî pêwer çî bikim qîz bû. Bi rengekê vekirî nerazîbûna xwe anî berçavên min û li cem hevalên xwe yên kurd jî digot "ji min re çî kiç be û çî kur be feriq nake".

Li ser navlêkirina zarokan jî bû şeredeva me; min dixwest qîza nûbûyî navekê kurdî hebe û herwisa navê qîza din jî ji tirkî bikime kurdî. Ew li dijî min derkeft û got ku çî kurdîni di navan de nîne û navê tirkî ji wan re pêwîste heke hat û em vegeryan ve Tirkîyê. Lê li dawiyê û bi piştevaniya hinek dost û hevalên wî yên ji wî kurdîr, me navên kurdî xistine ser zarokan. Ya mezin me kir Şîrîn û ya biçûk Şermîn.

Carna min weha fêhim dikir ku mêrê min di nav xwe de du kes e; ew gotin û fikirîn û reftara wî ya di nav malê de ne wekî wê ye ya di nav hevalên wî yên kurd de û ka çawa bi swêdiyan re reftar dike, ez wê nizamim, dibe ku di kesekî sêyem de digel wan dijît. Wî, li mal, xwe gelek ji min dixeyidand dema ez bi kurdî bi zarokan re dipeyivim û wî dixwest ez jî mîna wî li mal bi tirkî bi wan re biaxivim. Belê li derveyî malê jî kurdperwer û kurdperwerê mîna wî tune.

Ji sala sêyem ji mana min li Swêdê û virde min hest bi hindê kir ku peywendîya Memo-yî bi min re ne hinda germ e. Evca çî min nû hest bi hindê kir ji ber hişyarbûna min li ser mafê jinan û wekhevîya di navbera mêr û jinan di komelgeha swêdî de, yan çî di rastiyê de evîna wî bo min ne weku caran e û sisit û xav bûye, dibe jî ku ev herdu pîrs bi hevûdu re hatin. Weku rêçareyek ji vê problemê re, min bizav kir ji wî re hê çêtir bim;

di navmalê de ji wî re xizmetxweştir bim û dema carna bi şev nevedigeriya mal min pit pit bi serî de nedikir û min jê nedipîrsî ka çima nehate mal û ka li kûderê bû.

Swêdiya min nebaş bû, ji ber ku piştî ku min mafê rûniştinê stand, Şermîn ji min re çêbû, û ez nikaribûm biçûma xwendîngeha zimanê swêdî. Piştî jiyê Şermînê bûye du sal, li batî ku xwe hînî zimanê bikim, wî hezkir ku ez kar bikim û weha jî çêbû; bi arîkariya wî ku hevalekî wî li kargeheke cilşûstinê bû, karek ji min re li wir peydabû. Kar jî ûtîkirina cil û pateyên ku her li wir dihêne şûstin bû. Herçende reuşa abûrî ya mêrê min pîr baş e; tirimbêla wî ya mercedes ya nû heye, xaniyê me çar odeyî û modern e û her tişteki bixwazî di malê de heye, lê wî xwest û min jî dil li ser karî hebû, bona ku belkî bi tîkîlîkirinê ez fêrî swêdiyê bibim. Lê, li wir hînbûna zimanê zehmet bû. Ji ber ku pîraniya karkeran kurd û tirk bûn û ez bi wan re yan bi kurdî yan bi tirkî diaxiftim. Ya rast li cihê ku ez swêdiya xwe pêşbixim min kurdiya xwe baştir lêkir. Min subê zû zarok dibirin zarokxaneyê û ji wir bi bez xwe digehande tirênê û paşî ji tirênê peya dibûm bona ku bi otobusê biçim cihê karî. Her weha piştî ku êvarî ji karî derdiketim, yekser bi xardan, min xwe digehande otobusê bona ku bi tirêna xwe re bigehim û biçim kiçan, di wextî de, ji zarokxaneyê bînimê malê. Li mal jî her ez bûm ya ku diviya xwarinê ji zarokan û ji mêrî re çêbike û ya ku dumahiyê dînivîst jî.

Digel vê hemûyê min gazinde nedikirin û ez pêxweşbûm ku bi mêrê xwe û zarokên

xwe re me. Hecareka ez torebibam û ez nê-zîkî şeredvê bibam, min reuşa li welatî dî-anî berçavên xwe; pispisa niyas û kes û kar û cîranan li ser min ya mêrê wê li derve û ew bi tenê bi keçê re hiştî û ka wan gotinan digel gilî û gazinên dayik û babên min ez çend diêşandim.

Lê, di sala pêncem de piştî hatina min, şil-qênek mezin û hêvîbir bi jiyana me keft. Min qet hizir nedikir ku Memo karekî weha bike, lê ya li bin berikê veşartî xuyabû. Car-na dereng yan hema bi yekcar nedîhate mal û ez bi hindê qayil dikirim ku civînên wî yên siyasî û kulturî û wexerên girêdayî wana bo derveyî Stokholmê û derveyî Swêdê hene û pîrsa millet û welatî li cem wî ji ya malê girîngtir e û weha dev li min digirt. Min bawer nedikir ku mêrê min derewan li min bike û min bixapîne.

Rojeke şembiyê êvarî, ez û kiçên xwe li mal bûn û Memo weku piraniya van rojên dawiyê bi mihaneya ku kombîneke wî bi partiyên siyasî re heye ji mal derketibû. Telefonê lê-xist, hildigirim, jinek dipeyive û bi swêdî dipirse ka Memo li mal e yan na û ka çima li-gor gotîna xwe neçûye cem wê, mala wê. Herçende swêdiya min ya pelîşqe ye jî lê min ew fêhim kir. Ez ji kulovanka serê xwe heta binê piyan lerizîm û ezman li min alizî. Lê jina li ber telefonê li ser pîrsyarkirina xwe berdewam bû:

- Tu nizanî dê ew kengî hête mal?
- Dibe spêdeya subehî.
- Bibêjê ku Karola li benda telefona te ye.
- Ez dikarim bizanim ka çi karê te bi

Memoyî heye?

Berî bersiva vê pîrsiyara min bide keniya û paşî got:

- Tu dikarî vê pîrsiyara xwe ji Memoyî bi xwe bikî, lê ka tu bibêje min ka tu li mala wî çi dikî?

Dema min gotiyê ku ez jina wî me, her weçku min xencerek li dilê wê dayî û demekê xweş deng ji wê nehat û paşî bê xatir xwestin telefon deyna.

Êdî heuyana min nehat û min ji xwe re got ku xuyaye ev jineye ya ku Memo ji min dîrxistî û ji min dizî. Çav li min tarîbûn û min hezkir bizanim ka ew jin li kîderê dijî, bona ku biçim û destan bidim hefka wê û bixendiqînim. Pîrsyarên min piştî pîrsa jinê zêdetir bûn û pa eger Memoyî ev hevale hebe û neçûbe cem wê, pa xwene wî yeke din ji heye û niha li nik wê ye? Û bi dehan pîrsyar û gumanên din di nava min de ariyan.

Piştî Memo hatiye mal ava xwe ya sar li eza min ya şaryayî kir û ez bédeng kirim û got ku çi tiştêkî weha nîne û ez xelet di swêdiya wê jinê gehiştîme û ya rast ew hevala wî ya cihê karî ye û karê wan bi hevre ye. Proje-yekî wan yê karî heye û divêt heta duşembî durust bikin û wê jina swêdî hez dikir ku Memo biçe cem wê û li mala wê wî karî xelas bikin. Herwisa Memoyî got ku dezgirtiyê wê heye, lê ew, şikra xwe, heznake biçe cem wê bo mala wê, ji ber ku qîzeke nerehet e û naxwaze xwe taloqetî kesekî weku wê bike. Bi wan gotin û şirovekirinên Memoyî çi gumanek nema li nik min û ez ji tingijîna xwe hatim xwarê.

Pey hindê bi çend rojekan, Memoyî got ku daweteke kurdekî hevalê wî heye û divêt biçeyê, lê wî pê nexweş e ez û keç pê re biçin, ji ber ku alkuhol tê de ye û her weha ji ber ku divêt piştî dawetê derengî şev biçe cem hevalan bona ku heta subê kar bikin û kovara xwe ya kurdî li datayê bidin.

Wê şevê Memo nezivirî mal. Roja dîtir, Zeyneba Mehemedê Sîtiyê telefona min kir û got:

– Eve tu çima wehayî, boçî xuyanabî?

– Bo Zeyneb, ma çi bûye?

– Hey mala te ava, ne hosa jî. Car û baran were nav xelkê. Tu çima duhî nehatiye daweta Bêwarî?

Bi rastî Memoyî negot daweta Bêwarî ye heke da her çim. Ji ber ku yek mala Bêwarî li welatî cîranên me bûn û du Zeyneb hevala min ya zaroktiyê, xwişkê Bêwarî ye. Min jî gote Zeynebê:

– Bawer bike Memoyî ne got ku daweta Bêwarî ye, bes hind got ku daweta kurdekî ye, lê alkuhol tê de dihête vexwarin û heznerkir ji ber zarokan ez bihêm.

– Alkuholê çi, hê kurdên me wilo lê nehatiye ku alkuholê li dawetan jî vexwun. Bi rastî ya xweş bû û Şivan jî tê de bistirî. Erê baş bû hate bîra min, erê jinek digel Memoyî bû, ez dibêjim navê wê Perwîn bû, ew kî ye?

– Çi...jin..., ez pir têkçûm. Tu dibêjtî jinek pê re bû, ew ji kî bû? Ew kî ye?

– Ez nizanîm, lê birayê min got ku faris e, Zeynebê got, xatirê xwe xwest û telefon danî.

Herê herê, karê wî û derketina wî ya bi şev û rojan eveye; çûna cem jin û keçên cur bi

cur e, yekê berdide bona ku yeke din bigre. Piştî ku roja din vegeriya ve malê min gazinda xwe jê kir û min jê xwest ji min re bibêje ka Perwîn kî ye. Lê li batî ku weku carên pêşîn bi awayekî şûka xwe ji avê derbêxe, vê carê xwe li min tal û tirş kir û li min kire qêrî û ji min xwest ku ez devê xwe bigrim û pirsyarên weha jê nekim. Lê ez neşiyam devê xwe bigrim û min jê xwest ku rastiya peywendiya xwe bi wê kiçê re ji min re bibêje. Li şûna bersivdanê, wî destên xwe bilindkirine min û ez dame ber şeq û zilleh û pêhînan.

Piştî wê bûyerê, wî ji qam bire der û êdî bi rengekî vekirî û aşkira peywendiyên xwe yên seksî bi keç û jinên cur bi cur re domandin û kurdên ew û ez nas dikirin pê agadarbûn. Ez û ew bûn qaçikê nav devê kurdên ku me nas dikin. Aşê gotgotkan jî bi gelek rengan dihate gêran; hinan ku kêmanî bûn, digotin ku Memo neheqiyê li Delalê dike û Delal jî neke baş û li ber xwe rawestiyayî ye, hinan jî ku piranî bûn, digotin ku heqê Memo ye wisa bike, ji ber ku jina wî nikare wî dîlxweş bike û nikare xwe li gor rewşa swêdê pêşbixe. Belê, weha bû û gehiştê guhên min ku wî ya swêdî û ya faris hêlane û niha du yên din hene; yeke Şilî û ya din romanî ye. Dibêjin jî ku ji bilî wan yeke fînlandî û yeke swêdî jî hene. Her weçku Memo dixwaze bibe şehrezayekî internasyonal di warê seksê de. Di vê hemû qonaxê de ez xizmetkara malê, zarokan û wî bûm û çi danûstandîneke seksî di navbera me de nemabû û em li ser yek cihî jî nedinivistin, her yek li joreke cuda. Eve sal û

nîve min seks nekiriye û ew her roj yan her çend rojekan bi jinên dostên xwe dike û qet nabêje xwe ka ez çawa xwe bê seks digirim. Xwe eger ez bi kesekî din re rabikevim bêguman dê min bikuje. Zelam e û wî mafê hindê heye her tiştekî bike, lê nabe jina wî wan tiştan bike û divêt ez namûsa wî biparêzim.

Vê dawiyê kêm dihête mal û hindek caran ku nahêt, telefonan jî nake. Belê, niha destpêkiriye dibêje ka diçe ba kîjan jinê, her weçku dixwaze min baş birîndar bike û biêşîne. Berê çendekê min zanî ku jineke wî ya tirk û keçeke wî ya sê salî jê heye. Bi riya Zeynebê hejmara telefona wê jina tirk bi dest min keft. Ez di telefonê de digel wê axifim û min qala bexîte xwe yê reş jê re kir û min jê xwest ku dev ji mîrê min berbide. Jina tirk got ku Memo bela xwe jê venake û dibêje ku ji dil û can hez ji wê dike û gotiye ku hez ji te, şikra min, nake û dê te berbide.

Weha wî dergêhên hêviya li ber min bi yekcarî giritin. Vê dûmahiyê gote min:

– Tu baş bizanibe ku ez dê her yê ho bim. Tu pê qayil bî û xwe bê deng biki û çî cara pit pitê neki û ji çî kesekî re qala jiyana me neki, te bernadim û dê hosa jiyana xwe birêvebibîn. Lê hema tu dengêkî ji xwe binî û gili û gazinên xwe li cem hevaleki min yan ji birayên xwe re bi telefonê biki, ez dê te berbidim. Baş bizane, te berbidim jî tu li vir namîni û divêt tu biçîye cem malbata xwe li welatî. Tu piştî berdanê bi gotina min neki û şû bi kesekî li vir biki, dê te kujim.

Wesa, rû bi rû gote min. Ez pir tirsiyam û min xwe li vê Swêda azad, Swêda azadiya

mirovan û azadiyan jinan, dît bê pişt, bi tenê û dihême perçiqandin. Ez nizanim çî bikim; pê re bimînim dê her kul û derd û xem û tirs behra min û zarokan bin û dê her li dûmahiyê jî biçê ser berdanê. Daxwaza berdanê jê bikim, kulmamla wî ewe û dê pir pê dibweş be ku ez wê dawazê bi awayekî resmî jê bikim bona ku bikaribe bibêje ku ew daxwaza jina min bû û ez li dijî nerawestiyam. Ez jî dixwazim em ji hevûdu biveqetin û serê min ji vê sergêjiyê rehet bibe, lê çarenivîsa min û keçên min piştî berdanê dê çî be?

Her çende ew heft sal in ez li vir dijim, lê ez swêdiyê baş nizanim û we ya rast bivêt ez bawernakim ez bikarim bi hêsanî biçim bo nav kultur û komela Swêdê. Ez di nav xwe de, xwe pêtir dibînim girêdayî kurdewariyê û hez dikim danûstandinên min bi kurdên li vir hebin û bi hêz bin. Weha, di nav kesên heziman û hevkultur de, ez xwe dibînim ku heme, heke wesa nebe ez ditirsim heftarê min ji destên min derbikeve, berze bibim û bibim keseke bê pênasname û metirsiya wê ji li ser zarokên min dê bêguman nebaş be. Evca heke ez bême berdan ew qebûl nake danûstandinên min bi kurdên vir hebin û heke bi yekcarî qut neke dê hêne kêmkirin bona ku avrûya xwe di nav kurdên vir de biparêze û mezinatiya xwe ya vala ya siyasî li Kurdistanê xwe ya vir bidomîne. Ez di wê bawerê jî de me heke ez li vê derê mam û min zilmek ji xwe re dît ku pê re bijim dê derbekê li min bide. Ya vegeerê bo welatî, ez pir hez dikim biçim ve bajêrkê xwe, nav kes û karên xwe û jiyana xwe bi xweşî û nexweşiyên ve li

wir bi xelkê xwe re bibim serî. Lê ne weha hêsan e, li wê derê, bo jineka mêrê wê berdayî û ji Swêdê derêxistî çî buhayekî min namîne û nikarim çî mêran bikim, ji berku ya berdayî me û her weha jî dê gotinên xerab bi min ve hêne nûsandin. Min ji bîr kir ku bibêjim ku dayika min ji çawan korebûye û babê min berî du mehan miriye. Weha rewş pir zehmet bûye û birayan jî jin û zarokên xwe hene û rewşa wan ya abûrî weke pîraniya xelkê Kurdistanê lawaz û jihevketiye. Evca ez jî biçim û bibim barê ser milên wan ji min re pir sext û qurs e ez weha bijîm. Kar jî bi zehmete bi dest min bikevin. Eger ez vê hemûyê jî bidim aliyekî û ez ne di xema xwe de bim, divê ez hîzra zarokên xwe û pêşeroja wan bikim û ya çêtir ji wan re hilbijêrim.

Min pêr telefona hevalekî wî kir ku pesnê wî di nav kurdên vê derê de gelek dihête hildan. Ew ji min mezintir e û wî destê nivîstî-nê jî heye û sê çar zimanek jî dizane û ew jî gire gireke û serekê rêxistineke kurdan ya li vê derê ye û ya ku xebatê li vir bo azadikirina Kurdistanê dike. Min bi telefonê gilî û gazinek xwe gihandinê û min daxwaza şîretê û arîkariyê jê kir. Pirsra herî girîng ya ku bala wî kesî kişandî, pirsra seksê bû û ka çawa ez dikarim xwe bêtir ji sal û nîvan bê seks bigrim. Ka ez çawan wê tadarîyê li xwe û laşê xwe dikim. Peyvên wilo digotin, bi wan bîra min û çavên Memoyî yên seksî yên ku min li ser Cûdî dîtînan dianîn. Hema baş bû bi telefonê ez digel diaxiftim. Ez bi bawerim eger ew nêzîkî min ba, da dest bo wan peyvên wî çêbin û da min ya ji aliyê laşî ve jî te-

peser kirî êxe bin fişareke din.

Duht min meheke bêhinvedanê ji cihê kari stand û min evro daxwaza berdanê bi nivîskî pêşkêş kiriye. Her îro ez çûm ba polîstî jî, min pirs hemû jêre got û min got jî ku min biryardaye ku dê li vir bim, dê hewildim li vir şûbikim û ez ditirsim ku ew min bikuje.

Min ev biryar daye ku serê xwe bilind bikim, qanûna heyî bo parastina xwe û mafên xwe bikarbînim, serî li ber çî rengêkî bindestkirinê neçemînim, lê hêvîdar im hûn yê xwedî wujdan û bi mirwet û baş min û yên weke min di jiyan û berxwedana xwe de bi tenê nehêlin."

Ji min re bû mereqeke mezin bizanim ka ew jina ev name nivîstî kî ye û bizanim ka niha di çî rewşê de ye. Lê bi riya nameyê û zêfê wê bi tenê ez vê nekeftim, ji berku ne navê wê yê rast û ne jî adresê wê li ser e. Min pirsyar ji jina Babê Gulê kir, wê got ku mêrê wê behsê gelek nameyan û pirsên cur bi curên wan dikir, lê wî kêr car navên kesên ku problemên xwe yê taybetî jê re dinivîsandin, jê re digotin.

Rojekê dayika Gulê telefona min kir û got ku jineke kurd jê re telefon kir û serxweşî li wê kir û her wisa pirsyara nameyên mêrê wê kir. "Wê got ku wê nameyek ji mêrê min re şandibû û wî li berbû wê bike pirtûkek û dipirsî ka ew kiriye pirtûk yan na û eger kiribe pirtûk, ew amadeye ku ji çapkirina wê re arîkar be". Her weha dayika Gulê got jî ku wê ji wê jînê re goiye ku hemû name û destnivîs li cem min in, şikra min û telefona min daye wê, bona ku di

wê pîrsê de bi min re bi peyive. Ez pîr me-
reqdarê telefona wê jinê bûm, her ku tele-
fonekê lê xistiba, ya ji min ve dê ew jin be
û dê weha dawiya wê çîrokê zanim. Lê eve
du meh bi ser pîrsîna jinê ve derbasbûn û
wê çî peywendiyek bi min nekir.

Berî çar rojan û bi durustî roja şembî ya
buhurî, ez li ber derê sefareta Tirkîyê bûm,
digel çend sed kurdekan beşdarî xwenîşan-
danekê li dijî êrişê Tirkîya bo nav Kurdis-
rana başûr dibûm, dema ji nişkave jineka
esmer ya bejin kurt xwe nêzikî min kirî, si-
lav li min kirî û gotî:

– Merheba mamosta, got û destê xwe jî
dirêjî destê min kir.

– Merheba xwişkê, li ser çavan, min ev
bersiv lê da û min hindî hizra xwe kir ka
ew kî ye lê min nasnekir.

– Ez dibêjim me berî niha hevûdu nedî-
tiye lê min ji xelkî dengûbasên te bihîstine
û weha ez te nasdikim, herweçku dizanî
min dixwest wê pîrsyarê jê bikim.

Axiftina xwe domand û got:

– Ez gelek wextê te nastînim, lê ez dix-
wazim vê nameyê bigehînim destê te, digel
axiftina xwe name jî xiste nav destê min.

– Ev çî name ye û kê ji min re şandiyê?
Lê wê bersiva pîrsyara min neda û got:

– Bibure, ez bi lez im, lê ku tu nameyê
bixwînî dê bizanî ka ji ba kê hatiye, ew
axiftina xwe got û xatir xwest û zû ji bet çav-
vên min wunda bû.

Her zû wê gavê min ew name vekir û
min dest bi xwendina wê kir. Name ji wê
Delalê bû ya ku min berî niha çîroka wê di

nameya wê de bo Babê Gulê ji we re berç-
avkirî û her bi eynî destxetî jî ye. Bê kê-
m-
kirin û bê li ser zêdekirin û ji bo zû gihaştî-
na wê bo ber destên we, ez li vir deqa wê
belav dikim:

*"Piştî şex mehên daxwazkirina berdanê ez
bi awayekî resmî bûm jineke berdayî û êdî
min xaniyê xwe hebû û herdu keçên min jî
bi min re ne û ez niha li Erikson beşê elekti-
ronîk kar dikim. Memoyê gelek hewildan
min bitirsîne û webike ku ez vebigerim ve
Tirkîyê lê bêtir ji kerbên wê û ji bona ku bi-
zane ku nikare heta hetayê tadariyê bike û
bona ku ez jî baweriyê bi xwe bînim, bibim
xwedîya biryara xwe, min guhdariya wî û
gefên wî nekir û min jî gef lêkirin ku ez her
gotineka wî bigehînim polisî.*

*Piştî gelek telefon û geflêkirinên wî, polisî
ez agadarkirim ku wan gef li wî kirine û jê
xwestine dev ji min berbide. Piştî hingê bo
heyamekî bela xwe ji min vekir. Ez ketim di
hundurê Komîteya swêdiyan ya parastina
mafên mirovê kurd û her weha xaça sora
swêdî de. Ez niha dixwazim xwe hem ji ali-
yê zimanê swêdî ve û hem ji aliyê xwerew-
şenbîrkirî ve li gor komelgehê ve derê pêşve
bibim, ew jî bi beşdarbûnê di kursên cuda
de, bi xwendina rojname, kovar, pirtûk û bi
têkilîkirinê bi kesên reuşenbîr û intelektuwe-
lên me û vî welatî. Ez her wisa giraniya xe-
bata xwe, di wextên xwe yên vala de, didim
ser pîrsa zêdekirina dostan bo mîletê me yê
perîşan û zêdekirina dengên nerazibûnê li
dijî siyaseta dagîrkirina Kurdistanê, perç-
iqandina mafên mirovî û mirovî li welatê*

me yê bindest û dabeşkirî.

Ha... min ji bîr kir bibêjim ku piştî ti-mambûna şeş mehên li benda xweberdanê min xurtekî kurd di kurseke civaknasîyê de nas kir û piştî demekê, dostaniya me bi hevûdu re zêdebû. Eve 15 salên wî ye li Swêdê ye û navê wî Şahîn e. Ev kesê vê carê, ne bi çavzilakanê bû hevalê min, lê piştî nêzîkî pênc mehên bi hevûdu re danûstandinê min ew bankire cem xwe mal. Şahînî xaniyê xwe hebû û piraniya rojan piştî karî dihate mala min, lê bi şev nedima. Wî pir hez ji zarokên min dikir û her wisa zarokan jî hiyê xwe dabû wî. Min weha hizir dikir ku hema Memo bi vê çendê bizanibe wê dinyayê biqulîpîne ser hevûdu û bêguman wî pê zanîbû lê çi dengê wî nebû û min got xwe dibe ku dev ji rahêlana min berdabe û ji vegera min bêhêvî bûye û naxwaze çi sergêjiyan ji xwe re li Swêdê çêbike.

Rojekê seet heftî êvarî, ez û keiçên xwe bi tenê li mal bûn û Şahîn wê rojê nehatibû nik me. Dergehê xaniyê me hate qutan, di kunê de dinerim dibînim ku polîs li ber derî ye. Vedikim, polîs pênasnameya xwe û kaxezeke destûra pişkinandina xanî nîşa min di-de û dibêjin ku wan fermana sehîsikirina xaniyê min heye.

– Çi qewmiye ku hûn xaniyê min bipişkinin?! Min bi hêbetbûn pirsyar ji wan kir.

– Em niha nizanin, polîsî got. Em dê pêsiyê sehkinê û da bizanin ka dê çawabe.

Piştî wê axiftina xwe polîsan seyê xwe ye mezin da pêsiya xwe û ketine hundurê xanî. Eza ku gelek ji xwe bawer ku min seda sed çî

xerabiyek nekiriye pir tirsîyam û bû qute quta dilê min. Keçên min jî tirsîyan û revîn bo hembêzên min. Ev hatina polîsî ya ji nişka ve, polîs û mîtên tirkan anîn bîra min dema ku ji nişka ve êriş dikire navmalan û ew di-anîn serê mirovan yên ku kes neîne serê heywanan jî. Çi kun û qulaç neman ku seyê bi wan re ew ne rakişandinê. Paşî, ji nişka ve se li ber textê min yê nivistinê rawestiya û bû hew hewa wî, serê xwe dirêjî bin textî kir, her weku digote polîsan ha eve ew tişt li vê derê ye. Her zû polîsan text ji cihê wî livand. Berê xwe didimê ku wan kîsekê spî yê naylonî yê bi tiştêkê spî yê mîna podrê dagirtî ji erdî rakir. Polîsê ku kîs rakirî vekir û tilîka xwe têhiland, ew tiliya podir pêvemayî nêzîkî difna xwe kir, bêhin kir, paşî zimanê xwe ji devê xwe anî derê, dirêjî podirê kir, tam kir û paşî tif kir û got hevalên xwe:

– Rast e, ev e ew e.

Her wî polîsî gote min:

– Fermo ligel me were polîsxaneyê, te mafê advokatekî heye û tu berpirsyarî ji her gotîneke xwe.

Ez ji wê hemû bûyerê û wan gotinên polîsî bê hiş mabûm û min nedizantî ka çi rûdide û min bawer nedikir ku ew rastiye.

– Niha hûn nabêjin min ka hûn hatine mala min çî û ka eve çiyê we di mala min de di wî kîsê hanê de dîtî? Min bi xeydîn û ne li ser xwe pirsyar ji wan kir.

– Ev eroyîn e, me li mala te girtiye, polîsê ku eroyîn di destan de got. Euro spêdeyê agadariyek bi telefonê ji me re hatibû ku te eroyîn li mala xwe veşartiye.

– Bextê Xudê ez û eroyîn, bû bexte bexta min. Ev ne karê min e û şaşiyek di vê pirsê de heye.

– Em nizanin ka ev karê teye yan yê kesekî din e, lê eve me eroyîn li ber çavên te û van polisên din di mala te de girtiye, evca fermo bi me re were polîsxcaneyê heta ku em rastiya vê çendê dizanin.

– Ū ez çî li keçên xwe bikim, piştî ku ez bêhêvîbûm û min zanî ku dê min bibin min ev pirsyara xwe arasteyî polîsî kir:

– Em dê niha wan jî bi te re bibin polîsxcaneyê û tu li wê derê telefona kesekî xwe yî nas bike ku wan bibe cem xwe heta ku bizanîn ka dê çawa be.

Weha ez hatim girtin û li ser pîstirîn tişt tawanbarkirin. Min telefona Şahîni da polîsî bona ku ew telefona wî bikin û ew bihêt û keçan bibe cem xwe lê Şahîn ne li mal bû. Evca min telefona Zeynebê da polîsî û xuyaye ku ew li mal bû ji ber ku polîs hatin keçên min ji min standin û gotin ku Zeyneb hatiye û dê wan bi xwe re bibe mal û polîsî jî teqwa li wê kiriye ku çavê wê li wan be heta ku ez vedigerim mal.

Piştî birina zarokan, polîsî dest bi pirsyaran ji min li ser wan 250 gramên eroyînê kir û ka min ji cem kê anîne û dê bime nik kê. Hindî ez hatim ku wan têbigehînim ku haya min ji wê eroyînê tuneye lê wan bawer ji min nekir. Bi rastî ez neêzandim û neji dest-dirêjkariyek kire ser min, lê bi metodên xwe yên pisîkolojîk û li gor rêdana qanûnê hewildan rastiya wê eroyînê û ka çawa gehîştîye nav xaniyê min bizanin. Yekser advokatek jî

ji min re anîn bona ku mafê min biparêze û berevaniyê ji min bike. Min çî digote polîsî her eynî tiştî digote advokatî jî. Advokatî xwest ji min bizane ka kê dihête mala min û piştî ku zanî ku bes Şahîn dihête nik min, wî gumana xwe bire ser Şahîni, lê ez bi diwarî li dîjî wê gumana wî rawestiyam û min jê xwest ku bi hiç rengêkî wê hizra xwe negehîne polîsî.

Piştî sê rojên pîrî pirsyarkirin û li dûçûnan polîsî ji min xwest ku ez bi wan re arîkar bim, ji bona ku ew bikaribin zû min berbidin û gotin ku her eynî wî kesî yê ku agadarî li ser min dayî agadariyeke din daye wan ku Şahînê hevalê min ew eroyîn li mala min veşartîye û ev gelek care weha dike. Ew gotina wan qet neçû di serê min de, lew min yekser û bê yekûdu got:

– Qet rastî ji bo vê gumanê nîne û Şahîn tiştê weha nake.

Lê polîs yê li ser gotina xwe rik bû û ji min navnîşan û hejmara telefona wî xwestin. Li pêşiyê min nexwest wan bidime polîsî, lê li dawiyê min gote xwe ku ew mirovekî baş be û ev nekiribe dê hête berdane û heke wî ev tiştê kiribe û mirovekî di rastiya xwe de yê weha be, hema bila bigrin û bila bigehe sizayê xwe û wisa min bi ya polîsî kir.

Piştî hîngê bi niv seetê polîsî ez berdane û dema ku hatime mal dibînim ku Zeyneb li wir bi keçên min re ye û wê got ku Şahîn piştî karî heta derengî şev dihate cem zarokan û xwest bihête cem te jî lê polîsî rê nedabûyê. Min zanî ku piştî berdane min bi setekê polîsî Şahîn girt û bi rastî ez pir pê êşî-

yam, lê ez ya pişt rast bûm ku ew ne karê Şahînî ye. Lê problem di hindê de ye, hema girtin bi tenê li ser tiştêkê weha genî bese ku mirovî pîs bike û mirovê paqij ji nav de azar bide. Şahînî hewilda polîsî têbigehîne ku ew ne karê wî ye û ne jî karê min e û divê ku kesekê dî di vê meselê de hebe. Rojekê advokatê Şahînî hate cem min û ev gumana Şahînî gehande min. Li pêşiyê ez pê nerehet bûm. Ji ber ku, bi dîtina min ya wê gavê, eger Şahîn şika dibe ku kesekê sêyem di pîrsê de heye, divê ku ew kes hatibe mala min û wê çaxê ku Şahînî ew kes ne anîbe mala min, divê ez bim ya ku ew anîbe mal, ji ber ku kilitên xanî bes li nik me herduwan bi tenê hene. Lê advokatî pîrsyareke din ji min kir:

– Aya kesek heye ku neyarê te û Şahînî be?

– Bes Memo ye yê ku hez ji me neke, piştî gelek hizirkirinê min ev got.

Advokatî got ku polîsî dengê wî kesê ku agadarî li ser me dane tomar kiriye û ew hezdike digel wî biçim ba polîsî bona ku guhdariya wî dengî bikim belkî binyasim. Ez pêre çûm, lê li pêşiyê polîsî pêşniyara advokatî nepejirand, ji ber nihîniya pîrsê û ne ku xwediyê dengî binase û çî peywendiya wî bi eroyînê jî nebe û bibe egera problemine din. Lê, paşî bi ya advokatî kirin û wekirin ku ez guhdariya wî dengî bikim. Deng yê Memoyî bû û polîsî bêtir ji sê caran pîrsyar ji min kir ka ez ji dengê wî pişt rastim û min gote wan ku bê hiç gumanekê ev dengê wî ye.

Polîsî ji min xwest ku ez xwe niha bêdeng bikim û vê pîrsê jî çî kesekî re nebêjim heta

ku ew lêkolînekê li ser dikin ka ew çawa kariye biçê nav xaniyê min. Polîsî çû cem dayîreya avahiyê ku xaniyê min tê de ye û ji wan pîrsî ka di roja ez tê de hatime girtin yan berî wê rojê kesekî ji wan xwestiye ku ew dergehê xaniyê min jê re vebikin. Piştî li dûçûna dayîreyê xuyabû ku kesekî simbêlreşzirav û çavreş, bejin dirêj û bedleyekî xulîkî li ber, spêdeya wê roja ez hatime girtin, ku ez wê demê li ser karî bûm û keçên min li xwendîngê bûn, hatiye daîreyê û gotiye wan ku wî kilita xaniyê xwe, şikra xaniyê min, wunda kiriye û kopiya wê di mal de hiştiye û ji wan xwestiye ku dergehê jê re vebikin û wan jî derê xanî jê re vekiriye bê ku daxwaza pênasnameyekê yan kaxeza kirêdariyê jê bikin. Ji polîsî re aşkira bû ku ew kes Memo ye, ji ber ku ew hemû nîşanên ku zelamê ku ji dayîreyê pêre çûye û derî jê re vekiriye, gotin di Memoyî de bûn. Hate bîra min jî ku di eynî rojê de ku ez êvarî piştî karî bi keçên xwe re hatime mal deriyê xanî yê pêvedayî bû lê bi kilitê ne hatibû girtin û ya ji min ve min spêdê dema ji mal derkeftim ji bîra kiribû ku bigrim.

Agadariya min standî ew bû ku polîsî bi şev çû ser mala Memoyî û piştî pişkinînê kîlo û nivên eroyînê di mala wî de girtin. Weha bi kirin û firotina wî tiştê pîs û xeter li ser jiyana mirovan hate sûcdarkirin û girtina ti-vavekî weha yê wî tiştî di xaniyê wî de û piştî wê ya aniye serê me û gotinên me di dadgehê de li ser wê pîrsê belgeyekî pir bihêz û li berçav e ku bo demeke dirêj pê bihête sizakirin.

Piştî girtina wî, heval û dostên wî yên her-
tim bi wî re û ew diparast, destpêkirin nihi-
niyên wî aşkira kirin û tiştên weha digotin:

– Bi sexteyî gelek pare xirvekiribûn.

– Mirovekî pir hîz, doxînsist û tirsonek
bû.

– Gelek hez ji mezinatiyê dikir.

– Milet û welat li cem wî nanpêxwarin
bûn, yên herî girîng li nik wî bi tenê berje-
wendiyên wî bi xwe bûn.

– Ji aliyekî ve te hindî dîtiba bi rengekî
vekirî li dijî desthilatdarên tirk û dewleta
Tirkîyê dipeyivî û digot ku ew pêyekî xwe
naxe nav axa Tirkîyê heta dewleta kurdan
ya serbixwe nehête avakirin, yan tirk mafên
kulturrî û netewî yên gelê Kurdistanê nepeji-
rînin, lê ji aliyekî din ve danûstandinên xwe
bi Tirkîyê jî didomandin weku çîna wî ya
par bi awayekî veşartî bo Tirkîyê û mana wî
mehekê di xizmeta leşkerê tirkan de û kirîna
xwe jî serbaziye û kirîna lêbuhurîne jî dam
û dezgehên desthilatdar yên Tirkîyê bi 60 he-
zar koronan.

– Belê, ji aliyekî ve li derveyî welatî siya-
setmedar û rewsnêbîrê Kurdistanê bû û dijî
dagirkerên Kurdistanê bû û ji aliyê din ve
çav bes li şexsê xwe û berjewendên xwe yên
taybetî bûn.

Herçende pir baş e ev rastiye dihêne go-
tin û aşkirakirin lê ya baştir ew bû ku wan
ev tiştine di wextê xwe de û dema ku nû pê
zanîbû û hê ew negirtî gotiban. Lê wisa ye;
dema ew azad û çî metirsî li ser neyî çavên
wan hevalên wî li pareyên wî bûn yan jî bê-
tir çav li wî bi xwe bûn ku xwedî pare û pê-

çêbûn û desthilat û bêzekê ye di nav komel-
geha wan ya Swêdê de û wan zimanlost bo
wî dikir. Niha jî piştî ku ew ketî, wan he-
mûyan piştî xwe dayê û bi xerabî qala wî
dikin, ev hevalîniye jî mîna dîwarê li ser bef-
rê ye; ku roj bihelêt û tîrêja wê geş û gerim
bibe, berf dibeliyê û ew hevalîni jî namîne.
Yan her weku li cem me dibêjin ew hevalên
gavê ne.

Şahîn piştî girtina Memoyî hate berdan û
piştî demekê me daweta xwe kir û em biîne
jin û mîrên hevûdu. Rast e ew heft salan ji
min mrezintir e lê ya girîng ew e ew hez ji
min dike, min fêhim dike, hez ji mala xwe
dike û di karûbarê malê jî de ji min re pir
arîkar e. Her weha di sexbêrîjêkirina zaro-
kan de û di birna wan de bo xwendîgehê û
vegerandîna wan bo mal yarîderekê bê ga-
zînde ye.

Ya rast ez bi vê bûyerê pir herîşim û êşi-
yam û min qet ne dixwest ku çî kesek heta
Memo bi xwe jî hevrûstî belayeke wisa bibe.
Mixabin ku mirov xwe bigehîne vê dereceya
xwe nizimkirin û bêbihakirin û rezîlkirinê.
Mixabin ku mirovekî kurd li biyanîgehê,
yan her mirovek li kûderê be bila bibe, xwe
wunda bike. Mixabin ku mirov ji bo xerab-
kirina mirovan kar bike. Bi hêviya ku em
yên bindest û perîşan hevûdu bi tenê nehêlin
û em hertim hewil bidin ku nîrên zilma ne-
tewî û civakî ji ser xwe bavêjin. Xwişka we
Delal" ■

Birçî

S
K
E
Ç



Bûbê Eser

Darê Salih di dest de, ji mêrdîwe-nên bînya sahnê hêdî hêdî ber bi jora sahnê hildikişê, tê ser sahnê, lê perde girtî ye. Li pêşiya perdê aliyê çepê sê zarok ji xwe re dilîzin. Salih li ser sehne disekine, bi piştta destê xwe yê çepê xwêdana xwe paqij dike. Ber-bi jor dinêre û ji xwe re:

Salih: Kuro lawo ji serê sibê heta niha ez bi rê de me. Ez ji tîna ketim, ji birçîna mirim. De qet xem nîne, vaye min xwe gîhand binya gund, ez ê herim oda gund û li wir têr avê vexim û

xwarin bixwim. Bi qedandina axaftinê li dora xwe mêze kir, dinêre ku wa ye çend zarok ji xwe re dilîzin, hema bangî wan dike:

Salih: Wa birazîno! Hela werin werin, ma gelo oda gund kîjan e.

Zarok hemû bi hev re ber bi wî de bezîyan. Berê zarokekî xwest bersiv bide, lê yekî din ew dahf da, xwe xista pêşîya wî û bersîva Salih weha da.

Zarok: (*Tilîya xwe ber bi jora gund vekir û got*) Wa xalo, oda gund ew mala jor ya ku bi kilsa spî hatiye boyaxkirin e. Eger tu di vê kuçeyê de herî tu ê raste rast xwe bighîni odê. (*Zarok li hevalên xwe nerî weke karekî gelekî baş û qenc kiribe. Bi çavekî aqilmendî li hevalên xwe nerî û weke ji wan re bêje, we dî ez şîqa ji we zanetir im.*)

Salih bi lez û bez rêya oda gund girt, xwe gîhand ber deriyê odê, ewilê weha hêdîka li derî xist, lê tu kesî bersiva "fermo"nedayê. Ji xwe ne adet bû ku meriv li deriyê oda gund bixista. Weke ku ji navê wê jî diyar e, ew oda gundîyan ne. Ji herkesên li gund û mêvanan re vekirîye.

Salih derî vekir, kete odê, bi ketina odê re dît ku hemû gundî di ser xwarinê de ne. Hina kevçiyê tije dixistin devê xwe, hinan kevçiyê vala dixistin nava xwarinê, dema Salih li wê rewşa wan nêrî, av bi devî wî ket, kêfa wî hat û di ber xwe de:

Salih: (Gelekî baş e, êdî ez ê têr xwarinê bixwim û ava cemîdê vexim, kuro hela tu binêre bê xwesiya min çiqajî min hez dike. Ma ev şansa bi dest kê dikeve).

Sekinî bi awayekî kêfxweşî silaveke ji dil da ku gundî banî wî bikin da ku ew jî xwarinê bixwe. Bi dengê bilind:

Salih: Selamuneleykum.

Kesekî bersiva wî neda û tu kesî li aliyê wî jî mêze nekirin. Salih weha bi çavekî birçî li wan kesên xwarin dixwarin nerî, rûyî wî tîrş bû. Lê tu tişteki ji destê wî bihata tunebû, loma li ser tejiya raxistî rûnişt, destên xwe xistin zikê xwe yê birçî û li benda ku kesek bangî wî bike, rawestîya, lê çavên wî hey li xwarinê bû.

Pîştî li erdê çih da xwe, bi zikê birçî û çavên beloq li wan kesên xwarin dixwarin dinêrî.

Salih: (Dîsa wî di berxwede got: Kuro hela tu li van binêre lo, yek jî wan banî min nake ku ez jî xwarinê bixwim.)

Ji nava kesên ku xwarin dixwarin kesekî bi navê Seîd qutiya xwe ya tûtî-nê ji bêrika xwe derxist û dirêjî Salih kir:

Seîd: Pismam kerem bike ji xwe re cixareyekê bipêçe.

Bi dengê wî, hema Salih bi yek carê serê xwe ber bi wî de zivirand. Hêviya ku ew kes wê bangî wî û xwarinê bike, dikir. Lê mixabin çavê wî li wê qutiya tûtî-nê ya ku Seîd ber bi wî dirêj kir ket, mecbûr ma qutî ji destê wî girt, lê çavên wî li xwarinê bû û di ber xwe de:

Salih: Kuro hela tu li vî binêre lo! Ez dikim ji birçîna bimirim, ew qutiya tûtî-nê dirêjî min dike. Hey malxierabo, ji dêlva vê qutiye ma tu nikarî bangî min bike ku ez jî çend parî xwarin bixwim.

Bi wî zikê birçî cixareyek pêça, lê xîreta ku cixarê pêxe pêre nemabû. Loma cixare weha di nava tiliyên xwe de hişt û qutiya tûtî-nê li xwediyê

wê vegerand:

Salih: Pismam kerem ke qutîya te. Seîd tişteq negot, qutî girt û di bêrika xwe de bi cih kir.

Mêrikekî din ku xwarin dixwar bala xwe daye ku mêvan cixare xwe pênexistî ye. Wî jî çaqmaq ji bêrika xwe derxist û dirêjî Salih kir:

Mêrik: Fermo ji tere çaqmak û cixare xwe pêxe.

Salih çaqmakê destê mêrik girt, kire nuçe nuç û wî dîsa di ber xwe de got:

Salih: Kuro tu li van weşan binêre lo. Ez dikim ji birçîna bimirim. Bangî min û xwarinê nakin, yek qutîya tûtînê dirêjî min dike, yên din jî çaqmaq. Hey malxierabno ma qey hûn henekên xwe bi min dikin. Ji dêlva hûn qutîya tûtênê û çaqmaq bidin min, bêjin kerem ke were xwarinê bixwe, ma hûnê bimirim ku hûn weha bêjin. Lawo adetên weha li ba me tune ye.

Piştî axaftina xwe, wî him li xwarinê dinêrî û him jî cixara xwe pêxist, dûmana wê bi ser serê xwe de berda. Bi wî zikê birçî kişandina cixarê ew mest kiribû. Çavên wî li wan kevçiyên ji nava xwarinê derdiketin û dike-tin devî yekî ji wan bû, Salih, xwe ji bîr kiribû ku cixare di nava tiliyên wî de ye. Wî jî bê hemdî xwe ew destê cixare têde weke ku kevçî be, berbi devê xwe bir, lê dema dest nêzikê devê wî bû, wê cixara pêxistî xwe gî-hand lêva Salih ya jorîn, bi lêvşewitandinê, ew hate ser heşê xwe, çend caran kire nuçe nuçe, bi hêrs li kesên xwarin dixwarin nêrî.

Seîd dîsa bi çavekî hîlebaz li rewşa Salih nêrî. Weha xuya bû ku dixwest tiştina ji wî pipirse:

Seîd: Wa pismam ma tu ji kîjan hêlê tê?

Bi dengê Seîd, Salih veçiniqî, li wî nêrî û bê dilê xwe:

Salih: Ez ji wan joran têm.

Seîd: Gundê ku mala min jî lê ye, li wê jorê ye. Ew gundê ku li kêleka rêya îpekê. Li ber zinarê Bûma. Gelo rêya te bi wir jî neket. Salih nêrî ku kesek banî wî nake ku ew ji parîyek xwarin bixwîe, loma di ber xwe de got:

Salih: (Bise hela ez nêta vî fam bikim. Li gor daxwaza wî, ez ê qencîyakê pê bikim belkî ew banî min û xwarinê bike.) Serê xwe bi hêla wî kesî de zîvirand, bi aweyekî ji xwe bawer:

Salih: Belê qurban ma çawa min nedît. Ew kesên ji wî alî de bê û gund

nebînin çêdibe.

Seîd: Gelo te mala min jî dît, ew mala li teniştê gund ya di ber qîş de û di nava hewşeke mezin de.

Salih: Belê qurban min ew jî dît.

Seîd: Gelo te riya xwe bi wê malê xist.

Salih: Weh çawa pê nexim. Ma ew kesên di wir de derbas bin mumkun e ku rêya xwe bi wir nexin.

Kêfa Seîd ji vê gotina Salih re gelekî hat, dengê xwe hinekî din berz kir, serê xwe rakir û axaftina xwe bi kêf domand. Lê Salih jî gelekî birçî bû, loma wî bi herekerên xwe jest û mîmîkên xwe birçîbûna xwe dida dîyarkirin.

Seîd: Rehme! te dîya Cengê min jî dît.

Salih: Salih xwe bi xwe: (Tu bise hela, min daxwaza dilê wî fahm kir, divê ez qencîyeke weha pê bikim, ku hema bila ew ji cihê xwe rabe û min bide rûniştandinê)

Salih: Te got dîya Ceng! Bermalîya wê malê. Hustûna wê malê. Ma ne ji wê be kîyê here wir. Xwedê quwetê bidê, qet rûniştandin lê tunebû. Hema nanê sêlê lêdixist û ji mêvana re dianî. Carna jî dihat hundir odê, ji dêlva te û xwe xêrhatin li mêvanên nuh hatî dikir. Wê merdê, qet tunebûna te li wê mala nedida xuyakirinê. Wê him wazîfa te dikir û him jî ya xwe. Piştî vî karî ew dîsa vedigerîya ser nan û xwarinçêkirinê. Hema ez çî bêjim hindik e. Min hîn jineke weha bi van çavan nedîtî ye.

Seîd kêfa xwe dîantî, bi paya mezinbûnê diket. Serê xwe bi wir de û wê de dihejand weke ji wan kesên xwarin dixwarin bêje, we dît bê hela ez çî egît im. Mala min ji mêvana qut nabe. Eger min ji we re bigota, we yê bawer nekirana. Serê xwe ber bi Salih de xwar kir û axaftina xwe domand.

Seîd: Ma kurê min, şêrê ber dilê min Ceng çawa bû. Wî çî kar dikir, gelo?

Salih: Hema qet me bê. Ew jî weke dîya xwe jêhatîbû, qet rûniştandin li wî jî tunebû, ew nanê germ û xwarina xweş hema dikşand oda mêvana. Kesên têr dixwarin, dema diçûn destşokê, Cengê weke şêrekî, bi misînek ava sargermî, bi qalîbek sabûn û xewlîyekê av li destê mêvana dikir. Dû-re sifra vala radikir, ji mêvanên nûhatî re xwarina germ û xweş dianî.

Êdî mêrikê me xwarin ji bîr kiribû û hey pirsên xwe ji Salih re dido-

mandin, ew mêvanê ku zikê wî ji birçîna dikir qure qur, ketîbû tatêla çenek xwarin ku bixwe. Loma wî jî bi awayekî qenc pirsên Seîd dibersivand. Çavên wî yên birçî hey li xwarinê bû ku berî xwarin biqede ew jî xwe bighîne çend parîyekî, ji ber vê yekê bû ku wî êdî nema zanîbû ku ew ê çi bike, ji bona parîyek xwarin bixwe, dest bi derewan kiribû. Lê ew derewên wî hemû jî li xweşa Seîd dîçû. Loma Seîd jî êdî dev ji xwarinê berdabû û hey pirsên xwe rêz dikir.

Seîd: Pismam rehme, deva min çawa bû, ma gelo hîn ne zabû, berî hatina min ya vir li ber zayîne bû. Rewşa wî çaba bû?

Salih: Deevee (Hebekî sekîni, nema zanîbû çi bêje, devê xwe bir û anî, lê axaftina xwe top kir û domand) Deeveee, ooo deve gelekî baş bû, dema ez bi binya gund ketim û ber bi mala te diçûm, ew jî li binya gund di nava çêrê de bû û gîha dixwar. Weha xuya bû ku kêf kêfa wî bû.

Seîd: Tu bi Xwedê kî, kûçikê me, ew şêrê ber derîyê me, çawa bû, ma hîn wî xarî ser mêvanan dikir? Hîn wî û Cengê min bi hev re dilîstin?

Salih: Kuçikê teee ...(Li vir Salih hebekî difikire û ji xwe re: Kuro hela tu bala xwe bide vî nemêrî lo. Min ew di nava van kesan de kir paşa, kir axa, lê hîn wî bangî min û xwarinê nekir, weha xuya ye ku ev nemêra ji qencîyan fam nake, bise hela ez hinekî xerabîyan jî bi wî bikim, bê halê wî yê çawa be. Bi Xwedê ez weha bawer im ku ya rastîn jî wê ev be, weke pêşîyên me jî gotîye: "Kesên ji qencî fahm nekin, ew ê ji xerabiyê fahm dikin." Qet çareya min nemaye, bise êdî ez dest bi tiştên xerab bikim.) Ha te got kûçik, wele ez gelekî xemgîn im ku ew şêrê ber derîyê te miribû.

Seîd: Te got çi, te got kûçik mirîye! An min şaş fahm kir.

Salih: Na wele te şaş fahm nekir, ew miribû.

Seîd xwe şaşo maşo kir, wecê xwe tirş û tal kir û gotaina xwe domand:

Seîd: Niha tu bi rastî dibêjî, niha kûçikê min, şêrê ber derîyê min mirî ye ha! Baş e gelo çawa bû ku mir. De ka vê ji min re bêje.

Salih: Bi Xwedê hîngi wî goştê devê xwaribû, ew mir. Ji ber ku goştê devê gelekî bi dohn bû, dema kûçik ew goştê zêde û bi dohn xwar, tehamul nekir û mir.

Seîd: Te goot çi, te got goştê devê, ev çi ye kuro, qey nebe deve jî mirîye. Niha tu çi dibêje lo!

Salih: Bi Xwedê deveyê te miribû. Min nexwest ji te re vê bêjim, lê gele-

kî mixabin tîşteki ku mirov bike tuneye. Bila hema tu sax bî.

Seîd hîn bêtir tewşo mewşo bû, lêvên wî ricifin, porê serê wî gij bû, êdî nema dikarîbû, li kesên li dor xwe binêriya. Bi awayekî kelogirî, li Seîd nerî û axaftina xwe ya xemgînî domand:

Seîd: Niha bi rastî deveyê min mirî ye. Ev çawa dibe, hela zû ji min re bêje.

Salih: Bi xwedê dema deveyê te ji bona çêrê dihare nava mezelê gund, nigê wî dikeve wê qula ya di ser mezelê dîya Ceng û di wir de asê dimîne. Heranî gundîyan xwe gîhandinê, deveyê te xilas nebû. Gundîyan xwe ne gîhandinê wî serjê bikin. Ew heramkî çû û êdî termê wî bi kûçikan mabû, kêf kêfa kûçikan bû, loma kûçikê te jî hingî goştê bi dohn yê devê xwar û mir.

Seîd: Te te te got dîya Ceng, qe nebe ew jî. Ya na ew jî miii rîf ye. De ka vê jî bêje. Ew çawa bûye, çi bû ku ew jî... de zû.

Salih baş têgihîşt ku Seîd êdî nema dikare rawest e. Wî jî bi awayekî cidî pirsên wî dibersivand.

Salih: Qurban wê jî emir da te û çû rehma Xwedê. Ma em çi bikin mirin emirê xwedi ye. Kesek nikare vê bide sekinandinê.

Seîd: Niha dîya Ceng çûye rehma Xwedê, niha tu rast dibêjî, baş e, ma çi bû ku ew çû rehma xwedê. De ka vê jî zû bêje.

Salih: Heyran, qurban, ez ji axayê xwe re vê jî bêjim. Dema Cengê te yê wekî şerekî dimre, dîya wî, ji ber mirina Cengê xwe dayax nake, hingî digrî û li xwe dixe, ew jî dikeve û ranabe. Mirin emrê xwedê ye. Bila tu û hazir sax bin.

Bi xelaskirina gotina Salih, Seîd tewşo mewşo dibe, radibe ser xwe, dike gazî û qêrîn û ber bi derî ve baz dide, lê qîre qîra wî ji derve hîn dihat ku Salih jî hêdîka ji cîhê xwe rabû, hate cîhê Seîdî yê vala, çamîkî rûnîşt, kevçiyê Seîd kire destê xwe, kevçî di nava xwarinê de rakir, kevçiyê tije kire devê xwe. Kêfa wî hatibû, loma bi dengê berz weha:

Salih: Ew kesên ji qencîyan fahm nekin, çi xweşik ji xerabîyan fam dîkin, de here û Xwedê bi te re be.

Dest bi xwarinê dike û perde tê girtin. ■

Arif Damar: "Ez dostê Mûsa Anter bûm"



Arif Damar

Arif Damar yek ji şairên Tirkîyeyê yê bi ber û bijarte ye. Wî heta Anîha zêdeyî deh pirtûkên şîran nivîsandiye. Herweha ew yek ji çepên Tirkîyeyê yê kevin e. Me ji bo xwendevanên Nûdemê ev hevpeyvîna li jêr pê re çêkir:

Nûdem: *Di kovara Yeni Düşün de rûniştinek li ser helbesta tirkî hebû. Ez bawer dikim tu bû, Kemal Özer bû, Can Yücel bû. Hûn li ser helbesta tirkî ya piştî 1980 û berî wê peyivîbûn. Ger mirov helbesta berî 1980 û ya piştî wê beramberî hevdu bike, bi ya te çi pêşketin, an jî çi guhertin heye?*

Arif Damar: Niha, berî darbeya 1980 li Tirkîyeyê helbestkar û nivîskarên sosyal–realîst hebûn, pir bûn, lê belê piştî hatina cûntayê, gelek ji wan hatin girtin, îşkence dîtin, pirr asteng derketin pêşberî wan. Gelekan ji wan jî xwe kişandin quncikên xwe û bêdeng man. Yanî darbeya eskerî darbeyek li hunera pêşverû jî xist.

Gotina min ya sosyal–realîst bila şaş neyê fêhmîkirin. Di eslê xwe de huner îndîviduel e. Helbestkarên mezin mîna Nazim Kıkmet û Pablo Nerûda jî îndîviduel bûn. Lê belê îndîviduelên ji pîrraniyê bûn. Ez jî helbestkarekî weha me. Lê ez perçeyek ji gel im. Dilşahiye min, xemgîniye min bi temamî bi bûyerên civakî ve girêdayî ne.

– *Reuşa helbesta tirkî ya di plana navneteweyî de çawa ye?*

– Ez dikarim vê bibêjim, berê edebiyata dinyayê, helbesta dinyayê li Tirkîyeyê zêde nedihate zanîn. Lê îro êdî ji edebiyata dinyayê gelek berhem têne wergerandin. Di nava van wergeran de helbest jî cihêkî berbiçav digire. Îro helbesta dinyayê li Tirkîyeyê baş tête taqîbkirin. Îro ji helbesta Emerîka Latînî, ya Emerîka, ya Fransayê bigire, heta ya Îtalya û Yunanîstanê li Tirkîyeyê tête zanîn. Gava mirov li van helbestan dinihêre, helbesta tirkî qet ne kêmtî wan e. Ji ber ku tradisyoneke hunera helbestê jî li Tirkîyeyê heye. Tradisyona edebiyata Dîwanê, ya hozanên gel mîna Pir Sultan Abdal, Dadaloglu, Köroglu û hwd. heye. Loma, ji xwe li Tirkîye di nava şaxên edebiyatê de helbest ya herî li pêş e. Hel-

besta tirkî ji çîrok û romana wê pêşdetir e. Ger îro helbesta tirkî di plana navneteweyî de mîna helbesta yunanî, ya îtalî, ya fransî deng nedabe, ji ber zimanê tirkî tê, ji ber ku ew bi zimanê tirkî hatine nivîsandin. Şansê zimanê tirkî mîna yê zimanên din tune ye.

Li Tirkîyeyê helbestkarên mezin hene, lê haya dinyayê ji mezinahiya wan tune ye.

– *Gelek nivîskar bi helbestê dest bi nivîsandinê dikin û paşê derbasî şaxên din yê edebiyatê mîna çîrok, roman, piyes û hwd. dibin. Lê ye te, mîna xortekî heftê salî tu he jî helbestan dinivîsinî. Ji bo çi tu derbasî prosayê nebûyî?*

– Ji bilî helbestan min hin tiştên din jî nivîsandine. Xebata min ya li ser romanên jî çêbûye, min hin çîrok jî nivîsandine. Lê belê mijûliya min ya sereke helbest e. Ji ber ku şerdên zehmet yê jîyanê destûr nedida ku ez bikaribim bi salan li ser berhemekê rawestim. Ji bo jîyanê diviyabû min ji bilî edebiyatê karin din bikira. Ez gelek salên dirêj di fabrîkayan de mîna midûr û ekonom xebitîme. Ev karên zehmet in, mirov pê diweste. Îcar digel vê zehmetî û westandinê, şerdên xerab yê siyasî rê li ber gelek tiştan digirt. Di sala 1963'an de, ji ber hezkirina min ya pirtûkan, min pirtûkxaneyek vekir, lê belê wê jî gelek wextê min digirt û hatina wê pir kêmtî bû. Di nava van hemû bêîmkanî û teşqeleyan de, min helbestnivîsandina xwe dom kir, ez têk neçûm, min li ber xwe da û heta îro jî ez her helbestan dinivîsinim. Îro nêzikî deh pirtûkên min yê

helbestan hene.

– *Ez dizanim ku tu yek ji çepên kevin î, ji ber fikrên xwe yên siyasî tu di girtîgehan de razayî. Gelo cara dawî tu kengî hatî girtin û sedema girtina te çi bû?*

– Cara dawî ez ji ber helbesteke xwe hatim mehkemekirin. Ew helbesta min jî helbesteke kevin bû, min di salên şestî de nivîsandibû, lê ew di sala 1982'an de di kovarekê de hate weşandin. Ji ber wê ez dame mehkemê lê ez nehatim girtin. Ez di sala 1984'an de jî hatim girtin. Ew jî hinan li min gilî kiribûn, ku min di pirtûkxaneyê de propaganda kiriye. Li ba polisên siyasî îfadeya min hatibû girtin. Ez hingî di hucreyê siyasîyan de dimam. Di wan hucreyan de tije xortên şoreşger bûn ku îşkenceya nedîtî li wan dihate kirin. Yê min jî çavên min girê didan, ez dibirim odeya îşkencê û ji min pirs dipirsîn. Ji min re digotin ku ez endamê TKP me. Lê ger TKP'yan bibihîstana ew ê bikeniyana. Ji ber nivîseke ku min di kovara Yılmaz Güney de nivîsandibû de, wan çûyina min ya welatên sosyalîst qedexe bûbû. Ez bi antî Sovyetîzmê ve sûcdar dikirim.

Dewletê xwest min ji madeyên 141 û 142'an ceze bike, gava bi ser neketin, vê carê jî bi qanûnên sazûmana leşkerî, ez sê mehan mehkûm bûm, ez di 84'an de du mehan razam. Piştî ku ez derketim min pirtûkeke din nivîsand, min bi wê pirtûkê xelat wergert û wê yekê han jî azadiyek da min.

– *Niha di ser wê dîrokê re deh sal derbas*

bûne. Gelo li Tirkîyeyê di warê azadiya fikrê de tu guherîtin çêbûne?

– Ez dikarim vê bibêjim, madeyên 141 û 142 hebûn ku li Tirkîyeyê azadiya mirovan bi sînor dikir. Yek jî madeyek 163'an heyê ku ew jî li dijî şerîetparêziyê ye. Gava rewşenbîran xwestin madeyên 141 û 142 rabin, wan herweha xwestin ku madeya li dijî şerîetparêziyê, 163 jî rabe. Bi a min ew li vir xapîyan. Ji ber ku şerîetparêzî ne demokratîk e, ew li dijî sistema medenî ye. Vê carê jî, ji bo ku dewlet valahiyekê dagire, madeya bi terorê re têkoşîn derxistin. Ji aliyekî de mirov dikare bibêje ku madeyên 141 û 142 rabûne. Ez niha mirovekî ku wextî tekeve 70 saliya xwe, û hinekî jî navê me tê zanîn. Ez bawer im wê ji ber vê yekê be, ku êdî piştî 1984'an ji ber pirtûk û nivîsên min, tu ceze ji min re nehat, an jî tu mehkeme di derheqa min de venebû. Lê belê, nivîskar û şairên ciwan hene, hê kes wan nas nake, ew ji bo nivîsên xwe û şîrên xwe dikevin girtîgehan.

– *Mumkun e, tesîra bi emirbûn û navê te hebe, lê îro di girtîgehên Tirkîyeyê de gelek xortên kurd, nivîskarên kurd û heta nivîskarên tirk ku behsa pîrsgirêka kurdan dikin, hene. Bi taybetî di vê dema dawiyê de, gelek rewşenbîrên tirkan jî dest bi munaqeseya pîrsgirêka kurdan kirine, heta serokcumhûr Süleyman Demirel jî behsa realîteya kurdî filan kir, lê belê em dibînin ku di vê dema dawî de mîna ku li dijî kurdan jenosîdekê dest pê kiriye, gundên kurdan têne şewitandin. Ev çawa ye, hem realîteya kurdan qebûl*

dikin, hem jî tavilê înkâr dikin. Hem dibêjin kurd birayên me ne, hem jî malên birayên xwe dişewitînin, bajarên wan wêran dikin, êgir bi daristanên wan dixînin. Nêrîna te di derheqa vê yekê de çi ye?

– Ez bi vê rewşa han ji dibxembgîn dibim. Ez pir li dijî vê yeka han im. Li gorî nêrîna min ev pirsgirêkeke demokrasîyê ye. Li Tirkîyeyê hemû însanên ku difirin, di bin zulmê de ne. Rast e, gund têne şewitandin. Wezîrê mafê mirovan Azîmet Köylüoğlu bi xwe mukur hat, wî got gund hatine şewitandin. Hin wezîrên SHP'yê mukur hatin ku gund têne şewitandin. Lê serokwezîr, wezîrê karê hundur vê yekê înkâr dikin, qebûl nakin. Îro li Tirkîyeyê eskerî çî bibêje, meclîsa Tirkîyeyê nikare li dij derkeve, qebûl dike. Mesele “Millî Güvenlik Kurulu” naxwaze “Olağan üstü hal” rabe, meclîs jî mecbûr vê qebûl dike. Yanî li Tirkîyeyê meclîs bê tesîr e, eskerî Tirkîyeyê îdare dike.

– *Di dema Özal de ji bo kurdan termên mîna otonomî, federasyon û hwd. hatin bikar anîn, mîna rewşenbîrêkî tirk ez bawer dikim tu dîzanî ku li Tirkîyeyê pirsgirêkeke kurdan heye. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, çî celeb pêşniyazên te hene?*

– Bi a min kurd miletî cihê ye, divê ew li Tirkîyeyê bikaribin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin, di radyo û televîzyonan de weşana bi zimanê kurdî bête kirin, zilma li ser kurdan rabe. Lê ger mirov pirsgirêkê ne weke kurd, lê weke Tirkîyeyê bigire dest, wê baştir be. Mesele gava mirov dibê-

je Emerîkayî, di nav wan de îngilîz hene, alman hene, îtalî hene, spanî hene, cihû hene û hwd. Ev hemû Emerîkayî ne. Gava em bêjin Tirkîyeyî, kurd jî dikevinê, çerkez jî, laz jî, ereb jî. Gelo min bi te da fêhmîrin? Yanî ger mirov bibêje Tirkîyeyî wê baştir be.

– *Gelo bi ya te, rewşenbîrên tirkan bi qasî ku pêwîst e zilma li ser kurdan, zilma li ser ziman û edebiyata wan, zilma li ser kultur û folklorê wan protesto dikin?*

– Tu bala xwe bidîyê, li Tirkîyeyê yek ji wanên ku herî pir li ser pirsgirêka kurdan radiweste, Îsmail Beşikçi ye û ew bi xwe tirk e. Ez îro ne bawer im ku li Tirkîyeyê, tu nivîskarên tirk, tu alim û rewşenbîrên tirk bixwazibin ku kurd bêne pelçiqandin. Lê hinek kovar û rojname, hinek kanalên televîzyonan vê pirsgirêkê nabînin û bi navê rewşenbîran tevdigerin, ez bi xwe dibêjim, ew ne rewşenbîr in. Ji xwe pirsgirêka kurdî li Tirkîyeyê heta tabu bû, kesî newêrîbû behsa vê pirsê bikira. Ev tabuya han di dema Özal de şikest. Lê ew jî di vê pirsê de çiqasî cidî bû nayê zanîn. Ez bi xwe ne bawer im ku wê pirsê kurdan bi riyên eskerî were çareserkirin. Yanî tu rabî gundên kurdan bişewitî, kurdan ji cih û warên wan koçber bikî, ev ne çareserîya pirsgirêkê ye, ev pirsgirêka ku heye mezintir dike. Ez bi xwe li gel çareserîyê siyasî me. Divê pirsgirêka kurdan bi awayekî aşî, bi rîyêke siyasî çareser bibe.

– *Piraniya tirkan, piraniya siyasîvan û rewşenbîrên tirkan dibêjin ku ew bi sedsalan*

bi kurdan re jiyane, keç dane wan, ji wan zewicî ne. Pirsra min ew e, gelo haya rewşenbîrên tirkî çiqasî ji edebiyat û kultura kurdan heye? Tu bi xwe çiqasî edebiyat û kultura kurdî nas dikî?

– Ez bi xwe bi kurdî nizanîm. Lê hindik be jî haya min ji edebiyata kurdî heye. Demekê Mem û Zîn dihate firotin, min ew kirî û xwend. Min hin şîrên Cegerxwîn jî ku wergeriyabûn tirkî xwendine. Wekî din li Tirkîyeyê gelek nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, hene. Wek mînak, Cemal Süreya kurd e, Ahmed Arif kurd e, Yaşar Kemal kurd e, lê wan berhemên xwe bi tirkî nivîsandine. Gelo bi kurdî nivîsandin ji wan re zehmet bû, wan çima bi kurdî nenivîsandine, ez nizanîm. Min Cemal Süreya baş nas dikir, wî bi kurdî nizanîbû. Lê ger nivîskarên bi eslê xwe kurd, bi kurdî binivîsandina, wê îro zanebûna me ya di derheqê ziman, edebiyat û kultura kurdî de zêdetir bûya.

– *Gava min xwe bi we mîna nivîskarekî kurd ku bi kurdî dinivîsîne, da naskirin, we çî hîs kir? Hûn li Tirkîyeyê pêrgî mirovên wisa tên?*

– Ez bi xwe dostê Musa Anter bûm. Min di salên sihî de ew di nava TIP'ê de nas kir. Demekê mala wî pir nêzîkî dikana min ya pirtûkan bû, me gelekî hevdu didît. Min pir jê hez dikir.

– *Bi taybetî piştî salên 80'ê, bi hatina cûntayê û bi derketina kurdan ya derveyê welêt re, di ziman û edebiyata kurdî de geşbûnekê dest pê kir. Îro li Swêd û li hin welatên din*

yên Ewrûpayê di warê şîr, çîrok û romanê de mînakên baş têne pêşkêşkirin. Gelek kovarên xwerû bi kurdî derdikevin. Digel vê jî, hê li Tirkîyeyê ji hin der û doran, hin nivîskar û rewşenbîr dibêjin ku zimanê kurdî tuneye, ew bi tenê ji sî gotinan pêk tê. Tu ji van celebmirovên re çî dibêjî?

– An hinek ji wan bi rastî nizanin, an jî ew pir di bin tesîra îdeolojiya fermî de ne. Çawa dibe ku mirov di roja îro de kurdan û zimanê wan înkâr bike. Bi cildan pirtûk li ser dîrok, ziman û edebiyata wan hatine nivîsandin. Bi cildan pirtûk li ser gramera kurdî hatine nivîsandin.

– *Bi ya te têkiliyêke têrker di navbera rewşenbîrên kurd û tirk, nivîskarên kurd û tirk de heye?*

– Ez bawer im ger li Tirkîyeyê nivîskarên kurd hebin, wê di navbera me de jî têkiliyêke baş hebe. Lê tiştê ez dizanim li Tirkîyeyê, kesên ku bi kurdî dinivîsînin an tunene, an jî gelekî hindik in. Loma em qet pêrgî wan nehatine. Lê kesên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, hemû dostên me ne, em di nava hevdu de ne. Tirkîye ne mîna Ewrûpa ye. Va ye hûn dibêjin ku li Ewrûpa şîrên kurdî, çîrokên kurdî, romanên kurdî têne nivîsandin. An jî hûn kovareke weha berfireh mîna Nûdemê derdixin. Lê li Tirkîyeyê tişteki wisa tuneye. Ev dibe ku jî ji ber qedexebûna zimanê kurdî tê. Yanî îro ez li Tirkîyeyê der û doreke edebî, komeke edebî ya kurdan nabînim ku têkilî di navbera me de çêbibin. ■

Sê xwişk

Xwişkekê ji çîlekên bejî yên şêrîn hez kir,
yekê ji gulên sor,
ya din jî ji gulên li ser miriyan.

Xwişka pêşî zewicî:
dibêjin, ew dilşa ye.

Xwişka dudan bi hemû ruhê xwe hez kir,
dibêjin, ew dilşa nebû.

Xwişka sisiyan bû ewliyayek
dibêjin, ew ê taca jiyane ya bêdawî bi dest bixe.

Edith Södergran



Edith Södergran di sala 1892'an de hatiye dinyayê û di sala 1923'an de jî wefat kiriye. Ew bi eslê xwe finî (finlandî) ye lê di şîra swêdî ya modern de, xwediyê cihêkî taybetî ye. Digel ku Edith Södergran ji ber nexweşiya xwe -êşa zirav- demeke dirêj îzole jiyaye jî, dîsan wê gelek pirtûkên şîran nivîsandine. Temaya şîrên wê bi tevayî xwestekeke xurt ya jiyane, dilbijokiya erotîzmê û bêrikirina durtî jiyane ye. Södergran ji şîra klasîk ya bi kêşan bi durtî ketibû û bi zimanekî taybetî şîrên xwe yên serbest anîne pê. Qîmet û rola Edith Södergran ya di modernîzekerîna edebiyata swêdî de mezin e.

Celad

Celad
Tu ê çî bikî jî milên min?
Yekî jê bike
Yê din jî jê ke
Çavên min te dibînin
Te tecawizî min kiriye
Nayê bîra min
Tenê bi min ecêb hat
Tu ê niha lingên min jî jê bikî
Pêşî yekî
Paşê yê din
Û tu çavên min dibîni
Tu dibîni çavên min dijîn
tu dibîni çav dijîn.
Hinekî jî jorî çimên min jî jê bike –
tu dibîni çavên min hê jî dijîn
Erê
Tu çî dibêji, Celad
Ma ev kêfxweşiyê dide te?

Gunnar Ekelöf



Gunnar Ekelöf di sala 1907'an de hatiye dinyayê û di sala 1968'an de wefat kiriye.

Roleke Gunnar Ekelöf ya navendî di şîira swêdî ya 1900'î de heye. Şiirên wî bi filozofiya rohilatê, muzîka barock, romantîzm û modernîzma navneteweyî ve hatine hûnandin. Lê wî bi zimanê xelkê û li ser jiyana rojane jî gelek şîir nivîsandine. Herweha ew bi pirtûka xwe ya bi navê "Dîwan" ku li ser bîzansiyan e û behsa mîrekî kurd "Mîrê Emigjonê" dike, navdar e.

Ekelöfê ku demekê li Stembolê jiya-ye û di akademiya Swêdê -komîteya Xelata Nobelê- de jî cih girtiye, digel gelek pirtûkên şîiran, wî gelek ceribandin jî nivîsandine.

Dilê Dinyayê

Bêje, dilê dinyayê li ku dişewite,
dilê dinyayê ji êgir?
Ew bi komira girs ya kevnar diji:
cariya reş, şeva gurr, kaûs,
Li wir bigere!
Dengê êgir wilo ye:
Bi hêza dijmîn xurt e,
Bi xwe têkoşîn e, şerêkî bêkêmasî-
tu dengê din tune.
Û biserketin? Gava tarîfî bi rivînê hiltê?
Ma serketin mirin e?
Pirsa vala û tîrsa vala!
Dilê dinyayê agir e,
û agir dixwaze bi ser bikeve.

Karin Boye / Werger û amadekirin: Firat Cewerî



Karin Boye di sala 1900'î de hatiye dinyayê û di sala 1941'ê de ji xwe kuştiye. Bi temenekî 41 sal wê di edebiyata swêdî de cihêkî xwe yê nemir çêkiriye. Ew îro yek ji pêşevanên edebiyata swêdê ya modern tête hesabandin. Şiirên wê têkoşîna şexsiyetê ya bi zehmetiyan ve tîjî radixe ber çavan. Herweha şîrên wê ku di bingeha xwe de mîstîk in, bi kemilandîneke întelektuelî hatine hûnandin.

Karin Boye li ser hev pênc pirtûkên şîran, du roman û gelek nivîsên din ên cihêreng nivîsandine. Digel ku demêke dirêj di ser xwekuştina wê re derbas bûye jî, disan ew li Swêdê her tim aktuel e û mîna lehengeke neteweyî tête bibîranîn.

Romana Kurdî

L
Ê
K
O
L
I
N



Nacî Kutlay

Êz pir xemgîn im kû li ser romanên kurdî nikarim pir tiştan bêjim. Di vî warî de xeberdan wisa ne hêsa ye. Ji ber kû hejmara romanên kurdî ne zêde ne. Em kurd di warê edebiyata nivîsandî de pir ne dewlemen-din, nemaze di rewşa romanên kurdî de hêjî paş ve mane. Min dixwest kû di prosesa edebiyata kurdî de çiyekî fireh bidim ro-manan û li ser vê babetê bikari-bim hêjî zêde bipeyivim. Lê hê-vîdar im kû ew demên bîn, romanên kurdî yê her zêde bibin û salên pêş de kurdên fîrsetên fireh bibînin û mînaqêşe bikin. Yê kû ez zanim romanên kurdî berî 1935'an çap nebûne. Li Erîvanê romana Erebe Şemo, "Şivanê Kurd" 1935'an de hat weşandinê. Pirtûkên din, wek Mem û Zîn, Dîwana Melayê Cizirê û afrandinên olî hatibûn çapkirinê, lê romanên kurdî negihîştibûn xwendevanan.

Berî hertiştî, ez dixwazim di vî warî de çend pirsan bêjim.

Min gelek caran ji xwe û hevalan pirsî, gelo çima helbest, çîrok û pirtûkên dîni hatin nivîsandinê, lê belê roman nivîsandin awqasî pêş de neçû?

Bi dîtina min çend sebebên girîng hene. Yek, ew hemû dewletên kû kurd tê de dijiyan, kurdî nivîsandin ne serbest bû. Li Turkiyê qedehe bû, li Îran û Sûriyê dem dem pir zehmet bû û li Iraqê her hêsan bû. Di vê rewşê de zimanê kurdî fîrsetên pêş-deçûyîne nedît. Enstîtû, çapxane û pirtûkxanên taybetî tunebûn. Lewra jî zimanê kurdî, nemaze di nav kurdên kû li Turkiyê dijîn, qels ma. Roman nivîsandin zimanekî dewlemend dixwaze. Meriv xwestinên xwe dikare bîne ser ziman, lê, teswîr, îfadekirina bi cî û tem, zimanekî her dewlemend dixwaze. Wisa nebe, tem û lezeta afrandinan kêrma dibe. Wêk xwerineka bê xwê, bê tem, pê re kêfa meriya nayê. kurdî bi xwe zimanekî dewlemend e, lê di nav xwendiyên de feqîr maye. Di bajarên de kurdî bûye zimanê çarşî û bazarvaniyê. Ev ziman têra pêwîstiya jiyane dike, lê her sal û her çûyî di hêlekê de jî feqîr bûye. Bo afrandinên çandî û edebiyatê ev kurdiya me ya kû li bajarên Kurdîstanê de tê xebirdan, têrê nake.

Tiştêkî din jî heye, romannivîsandin û xwendin karê civateka pêş de çûyî ye, xwendayên wî welatî gerekê zêde bin, ji xwendinê hez bikin. Gere em qebûl bikin kû, civata kurdî di vî warî de gelekî şûn ve maye. Jimara xwendiyên, di van salên dawî de hinekî zêde bûn. Hetanî meriv gelekî û him jî gele gelekî romanên nexwîne, bi xwe

nikare roman binivîse. Mêjî gerek bi romanxwendinê têr bibe, tijî bibe, wê çaxê demek tê, meriv bi xwe jî dikare tiştên nû bîne holê. Lewra, ez têdigihêjim kû çima romanên kurdî kêrma in.

Ez dixwazim bêjim kû, gelek astengên me yê din jî hene, ezê tenê wan bînim bîra we.

Em kurd cur be cur elfabeyan bi kar tînin. Taybetî kurdên Turkiyayê herfên elfaba erebî nizanin, ji ber vê yekê, ew romanên kû kurdên Îranê, Sûriyê an jî Iraqê nivîsîne, em nikarin wan bixwînin. Bi vî tehrî yê Sovyetîstana berê ji bi tîpên Kirîlî ne. Her çiqasî jî kurdên Îran, Iraq, Rûsyayê û Sûriyê tîpên latînî bizanibin, dîsa jî zehmetiyê dikişînin, bi tîpên latînî re pir kêfxweş nînin.

Xên jî van zehmetiyan, em dizanin kû, niha kurd li hemû welatên Ewropayê bela bûne, li wan deran bi halê penaberiyê de dijîn. Hinek ji van kurdan roman anjî pirtûkên din dinivîsin. Lê belê pirtûkê belav kirin di nav kurdên Avrûpayê de nehatine organîzekirin. Lewra jî, romaneka kurdî li van welatan kû çap dibe, dereng an jî qet nagihêje destê kurdên kû li welatên din dijîn. Caran haya meriya jî qet pê nabe. Ev hal bi serê xwe astengeka mezin e.

Di nav van astengiyan, yek jî ev e kû, di kurdî de zaravên me yê cur bi cur, ji hev dûr in. Yek kû soranî, kurmançî anjî zazakî binivîsin, gelekî ji hev fem nakin. Zaravên romanên girîng e, dema kû meriv wî zaravî baş nizanibe, meriv tem û xweşiya romanê

hîlnade. Kêfa meriya jê re nayê. Bo xwendin û nivîsandinê gere meriv wî zaravî baş bizanibe.

Kovarên li ser edebiyat û çanda kurdî, yên merkezî kêm in. Ev kêmasiyeke mezin e. Yên heyf jî bi heremîn e, nagihêjin destên pir xwendewanan. Lewra jî gelek xwendevan ji romanên çapbûyî bêxeber dimînin. Di vî warî de înstîtu û rêxistinên kulturî kêm in û hewcedariyê nikarin binin cî.

Zimanê kurdî bi rîtm û dengê xwe ve, ji bo helbestan gelekî baş e. Yekê jî, tradîsyona helbestnivîsandinê di nav kurdan de pir kevn e. Bi çend sed salan vir de helbestên devkî hatine gotinê û nêzîkî 7-8 sed salin kû helbestên nivîsî di edebîta kurdî de cîh girtiye. Ji bo wê jî, helbestnivîsandin her hêsa ye, em kurd him ji bo aheng, rîtm û dengên wê yî kû hez û kêfê dide însanan, gelek helbest hatine nivîsandin. Kêm kesan berê xwe dane nivîsandina romanan.

Lê belê, gere em tu carî ji bîr nekin kû ji bo van kêmasî û astengan yek çare heye, ew jî her zêde kurdî bixwînin û binivîsin.

Van zehmetî û astenga, yek ji nivîskarên kurdên Sovyetîstana berê, Çerkezê Reş di pêşgotina romana Eliyê Evdirrehman “Şer Çiyada” bi vî tehrî tîne ser ziman: “...Pirs ew e, wekî roman janra lîteraturiyê ye here giran, çetin û sext e.”

Hine nivîskar bi eslê xwe kurd in, lê, afrandinê xwe bi taybetî tirkî, farisî, erebî, rûsî an jî bi zimanekî din nivîsîne. Navero-kên van berheman di derheqê kurdan bin jî, wek edeta dinê, ev kesan û ev pirtûk û

romanên “berhemên kurdî” nayên qebûl kirin. Nivîskarên wisa, yên bi gelek giranbiha di wan hemû welatên kû Kurd tê de dijîn hene. Ne hewceye em yek yek navên van hunermendan bêjin. Lê ev hevalên bêhempa, bi qedr û qîmet in, bi kîjan zimanî nivîsîne bi wî tehrî “nivîskar” tên qebûl kirin.

Di jiyana hemû gelan de demek hatiye, pirsên civakî û yên gundîtiyê li pêş hemû pirsan ketiye. Ji ber vî sebebî, ev babet, gundîtî di romanên de cîh girtiye. Lê jiyana kû hatiye guhartin û ber bi bûrjûwaziyê - bazarvaniyê- çûye, vê guhartinê xwe di hemû curên edebiyatê de nîşan daye, her wisa, di romanên de jî. Ev naverok guhartin ne bi xwestina me dibe, ji ber zordayîna jiyana ev bûyer pêk tên. Bi ya min, ev tişt wê di edebiyata kurdî de jî wisa bibe. Ana durîfê “gundîtî”yê li ser edebiyata kurdî ye. Meriv ku li roman, çîrok û helbestên kurdî dinhêre, vê rastiye dibîne. Hela edebiyatê bidin alîkî, babeta gundîtiyê xwe di pir aliyên de nîşan dide. Hûn li navên me yên “anonîm” binihêrin, “Gundî, Gavan, Şivan, Çiya, Berxvan...” navên herî zêde ne. Ev tiştêkî pir normal e kû edebiyata me jî demeka dûr-dirêj wê “gundî” be.

Civat kû pêş de diçe, meriv hêdî hêdî ferq dike kû lîteratura wê civatê jî, ne bi lez be jî, pêş de diçe û tê guhartinê. Îşaretên guhartinê di nav edebiyata kurdî de xwe dide xuyakirin. Guhartina edebiyatê di pey guhartina civatê de xwe nîşan dide.

Lê bi pîvanên navnetewî ve, ez romanên

kurdî qels dibînim. Rohat, ji bo kurdên kû kêmasî 20 mîlyon in û meriv tenê dikare navên qasî 20 romana bîne ser ziman, wêya kêmasîke mezin dibîne. Lê dîsa jî di kovara "Nûdem"ê de pêşerojên gelekî tarî nîşan nade.

Nivîskarê romana "Labirenta Cinan" Hesenê Metê di hevpeyivîna xwe ya di Nûdem'ê de, di vî warî de awha dibêje: "...Kêma zêde romana kurdî jî di rewşa çîroka kurdî de ye..." "...Em veşerî ser romanên xwe. Min berhemên heja bi kurdî jî xwendine. Lezeta roman û novelên kû min ji pênuşên biyanî girtiye, di berhemên kurdî de jî ez rastî wan lezetan hatime. Lê mixabin, hebûna nivîskarekî û romaneke bi vî lezetê ji bo min têr nake kû ez behsa romana kurdî bikim û bidim ber romanên navnetewî..."

Yekî kû di nav kurdan de pirtir roman nivîsiye, Memet Uzun e. Ew di vî warî de rojên pêş ronahî dibîne.

Ez dikarim bi kurtî hinekî jî qala van romanên kû min bi destxistîne û xwendine, anjî yên kû derheqê wan de zanadariya min heye, bikim.

Romanên kurdên Sovyetîstana berê

Ez dikarim bi taybetî çend xûsûsiyetên wan nivîskar û romanên wan bêjim. Gelekên wan kurdên Osmanî bûn û piştî Şerê Dinyayê yî Yekemîn ji kurdîstana Tirkîyayê, derdora Qers'ê, Wan'ê û wîlayetên din revîbûn, çûbûn Ermenîstan û Gurcîstanê. Hema giştî jî kurdên Ezdî ne. Ew di serpê-

hatiyên xwe de dibêjin kû, "em ji ber zora Romê revîyan." Naveroka berhemên wan gelek cara li ser wê demê ye. Piştî wan rojên bi birçîbûn, rev û qirbûnê, di bin rejîma sosyalîzmê digihêjine jiyaneke bêtirs û baş. Di dibistanên kurdî de dixwînin û li radyoyên kurdî guhdarî dikin. Piraniya romanên wan di vî naverokê de nin. Wek nivîskarên din li Sovyetîstanê, ew jî sosyalîzmê meth û sena dikin. Bi ya min di vî warî de hinekî jî pêş de diçin û wê çaxê lezeta van romanên kêma dibe.

Lê ev êşkere ye kû, romanên kurdî berê pêşîn bi destên kurdên Sovyetê tên nivîsandin. Yê herî ewil jî Ereb Şamîlov e. Ji bo wî gelek kes "Bavê romanên kurdî" dibêjin.

R o m a n ê n E r e b Ş a m î l o v:

Di romanên xwe de xezanî, feqîrî û jiyana kurdên wê demê -salên piştî Şerê Dinyayê Yekemîn- tîne pêş me. Bindestî, feqîrî, rojên reş û dîsa di wê demê de dilşahî, azadî û hêvîkirinê wek sêveka tîrş bi me dide xwarinê. Romana wî ya ewlîn, "Şivanê Kurd" e. Serpêhatiya nivîskar bi xwe û rewşa kurdan di romanê de bi hev re diçe. Roman li Erîvan'ê sala 1935'an de çap bû. 1978'an de li Stembolê hat weşandin. Paşê Şivanê Kurd bi navê "Berbang" dîsa li Erîvan'ê, 1959'an de çap bû. Roman serpêhatiya Ereb Şemo ye.

Romana "Jiyana Bextewar" û "Hopo" li Erîvan'ê 1969'an de di "Beravok"ê de çap dibin. Kurdên koçer ji Turkiyê çawa direvin tên Sovyetîstanê û paşê rojên qenc dil-

şayıyê dibînin, naveroka van romanên e. Erebe Şemo behsa jiyaneke nû, pêşdeçûyîn û avakirina sosyalîzmê dike. Romana wî ya çarê "Dimdim" di sala 1966'an de dîsa li Erîvanê çap dibe. Romaneka dîrokî ye. Li Kurdîstanê Îranê, Xanê Kurd Lepzêrîn - Çepzêrîn- bi çend eşîrên din ve dijt Şahê Îranê Ebbasê Duyem re şer dike. Kurd di kela Dimdimê de, Îranî ava wan dibirin, lê jin, bûk û mêr heta mirinê ber xwe didin. Romana Dimdim li Swêdê sala 1983'an de dîsa çap bû.

Eliyê Evdirrehman

Romana "Xatê Xanim" di sala 1958'an de hate weşandin. Li ser kurdên Tirkîyeyê hatiye nivîsandin. Xatê Xanim Dersimî ye, mêrê wê kû dimre, wek mêrên eşîra xwe rêva dibe û li dijî dewletê şer dike.

Romana "Gundê Mêrxasa", dîsa rewşa kurdên kû li Tirkîyayê piştî Şerê Şêx Seîd penaber bûn hatin Sovyetîstanê, pêşberî xwendevanan dike. 5700 mal mihacir dibin. Di Sovyetîstanê dergê xêrê, xweşiyê, xwendin û pêşdeçûyînê dibînin. Lê bi ya min di vê romanê de Eliyê Evdirrehman xwe dike zehmetîke giran, dema kû Xezala keça serokê eşîrê dike komînîstê ciwan - komsomol-, bi destê wan rêxistinên sosyalîstî pêşberî xwendevanan dike. Ev roman jî li Erîvanê, di sala 1968'an de çap bû.

Romana "Şer Çiyada", 1989'an de li Erîvanê hat weşandin. Eliyê Evdirrehman jî bo naveroka vê romanê bi xwe dibêje kû: "... Eva nemaze li ser şerê kurdan, di nav salên 1928-1930'an li bereka Girîdaxê ye,

wekî kurdan nava wan salan da li pêşa Girîdaxê şerekî çawayî giran danîne..." Meriv jî nivîskar û pêşgotinê fem dike kû gere ev roman du pirtûk bin. Di ya duemîn de li ser rêvabirên Şerê Girîdaxê Îhsan Nûrî û Biroyê Hesikê Tellî bihata nivîsandinê. Lê mixabin ev pirtûk derneket û nivîskar çû ber rehma Xwedê. Qehremanê sereke di romana Şer Çiyada Şêx Zahir e. Min bi xwe jî derheqê Şêx Zahir de gelek tişt bihîstin. Meta min Besê di nav Şerê Girîdaxê de bû, her tim qala Şêx Zahir û Simbilê dikir. Simbil qîza Mehmûd Begê Torîna Mala Kose bû. Şêx Zahir Simbil bi zorê revandibû. Simbilê ev yek qebûl nekir û xwe bi tiyinga Şêx Zahir kuşt. Wê demê meta min jî li wir bû. Ev bûyer di romanê de tunin. Roman Şêx Zahir bi tehrekî din nişan dide. Bi ya min ev şaş e, xeletî ye.

Di romanên dîrokî de meriv "şexsan" û "qehremanên romanê" nikare bi tehrekî din nişan bide. Taybetî qehreman kû di nav xelqê de yekî nas be, meriv nikare şexsiyetê wî biguhurîne. Şêx Zahir nexwendibû, li hêla Qersê û Girîdaxê bû. Di romanê de yekî xwendî ye û hezkiriya xwe, li Wanê jî dibistanê hildide, tên Girîdaxê û bi tev şer dikin. Ya din, Eliyê Evdirrehman di romanê de kurdan gelekî qehreman nişan dide û tirkan bi zanebûn nebaş pêşber dike, lê di dawiyê de nikare bo serneketina kurdan re sebebên taybetî bibîne... Hêlek bi silah û jimar zêde ne, bi top û balafir in. Lê di romanê de Kurd wisa qehreman in kû meriv têngahîje kû çima Kurd bindi-

kevin.

Nivîskarê ezîz Eliyê Evdirrehman di 1984'an de di hevpeyvîneke xwe de eşkere kir kû li ser romanekê kû bi navê "Murtule Beg" dixebite. Lê mixabin kû em nizanin ev xebata çi bû. Ji bo Murtule Beg'ê nivîskar, "çawa tê zanîn ew xweşmêrê navça Mûksê bû..." dibêje.

Romana H e c î y ê C i n d î "Hewarî" di sala 1967'an de li Erîvan'ê çap bû. Di vê romanê de jî naverok ew kurdên kû ji Tirkiyayê koç dikin û diçin Ûrîsetê nin. Belengazî, zordestî û tedaya kû dibînin, bi zîmanekî zelal hatiye nivîsandin.

Romana S e î d ê Î b o "kurdên Rêwî" jî li Erîvanê sala 1981'an de ket destên xwendevanan. Çawa min di destpêkê de gotibû, ev roman jî qala kurdên ji Tirkiyayê direvin diçin Ûrîsetê û Sovyetîstanê dike. kurdên bêsitar, mal-milkên xwe, hemû tiştên xwe bi cî de dihêlin, dixwazin xwe xelas bikin. Paşê tevî avakirina Sovyetê û jiyana nû dibin.

Romana piçûk "Dê û Damarî" jî aliyê E g î d ê X u d o hatiye nivîsandin. Bi ya min gelek heyfe kû vê romana modern, bi naveroka xwe ve pirr dewlemend, pedagojîk û felsefî, bala xwendevanan zêde nekîşandiyê. Di Şerê Dinyayê yê Duemîn de xelkên Sovyetîstanê bi dil û can diçin tevî şer dibin. Dê û bavê Aleksander -Kurd jî wî re Îsko anjî Îskender dibêjin- jî diçin şer û Îsko zarokê çend mehî ye, di gundekî kurdên Êzdî de mezin dibê. Hebûna dê û bavê xwe nizane û wek yekî kurdên Êzdî

dijî. Di romanê de diya Îsko ya rastî û diya wî ya kurd bi dîtînen însanî û terbiyetên modern pêşberî me dibin. Roman li Erîvanê di sala 1986'an de çap bû û îsal bi tîpên latînî li Swêd di nav Weşanên Nûdemê de hat weşandin.

Romanên kurdên Sûriyê

Romana B a v ê N a z ê "Çiyayên Bi Xwî-nê Hatine Avdan" anjî "Çiyayên Bi Xwîn"; ev roman cara pêşîn jî kurdî hatiye wergerandinê û Erebi çap bûye. Paşê ji Erebi, bi Rûsî hatiye wergerandin û 1981'an de li Moskova'yê çap bûye. Prof. M. S. Lazaref pêşgotîneka giranbiha nivîsiyê. Bavê Nazê bi eslê xwe jî hêla Mêrdîn'ê ye, di vê romana xwe de asteng û problemên kurdên wan hereman nîşanî me dide. Xortekî cotkar, hişyarbûna însanan, xwestina jiyaneke nû û pêşveçûyî xwe pêşdar dike. Qehremanê romanê Çeto, di civatê de, gundîtî û bajarvanîyê, olperestî û kevneperestiyê datîne pêş me û li pey nûbûnê digere.

Romana duemîn ya Bavê Nazê, "Stokholmê Te Çi Dîtiye Bêje", piştî kuştina serok wezîrê Swêd Olof Palme hatiye nivîsandin. Di romanê de Bavê Nazê, gelek gotinên pêşyan û fikrên geleri tîne bîra me. Qala gelek dîtînen felsefî tê kirinê. Biyanî û Swêdî bi çi tehrî difikirin gele caran, ew cuda dîtînen û çandên cuda li ser însanan bi çi tehrî tesîr dikin, em di vî warî de digihêjin çend xelekên nû.

Çi heyf kû, di ber sebebên kû min di rûpelên berê de gotibû, ez kêman roman nivîs-

karên kurdên Sûriyê nas dikim. Wisa tê xuyanê kû jimara wan ne pirr in. Yên kû min bîhistine, lê belê romanên wan nexwendine, yek *A z a d B a v ê Ş e h î n e*, romana "Yên Perîşan" nivîsiye û ev roman di sala 1991'an de li Beyrût'ê çap bûye. Yê din jî *X e m g î n T e m o y e*. Vî hevalî jî romana "Pala Bê Şop" nivîsiye.

Romanên kurdên Îranê

Ez gelekî li ber xwe dikevim û xemgîn im kû ez nizanîm kurdên Îranê çi roman nivîsîne. Tenê haya min heye kû Rehîmê Gazî romanek bi navê "Pêşmerge" nivîsiye.

Romanên kurdên Iraqê

Ez dixwazim rexnekê li ser kurdên me yê Iraqê bêjim. Ev 75 salin, mecala wan ya bi kurdînivîsandin heye û dibistanên kurdî û dezgehên kulturî hene. Gelek rojname, pirtûkên helbestan û dîrokî hatine nivîsandin. Lê belê roman di nav wan de pêş de neçûye.

Romana "Jana Gel" ji aliyê Abûqat, nivîskar û siyasetvanê bi nav û deng *Î b r a h î m E h m e d* hatiye nivîsandin. Elî Şêr ev romana soranî wergetandîye kurmançî û 1992'an de li Stockholmê çap bûye. Nivîskar Sebrî Botanî, di kovara Nûdem, hejmar 9'an de dinvîse kû: "... Lê her çawa be, lê mala Elî Şêr ava be kû wî pirtûk jî kurdî wergerandiye kurdî..." Nivîskarê romanê Îbrahîm Ehmed di hevpeyvînekê de qala romanê dîke: "...Min rast û rast nika-

ribû behsî gelfî Kurd û kurdîstanê û rapêrî-nên wê bikim. Ji ber kû qedexa bû. Loma min bi mebesta kurdîstanê di romanê de behsî şoreşa Cezayîrê kir, mîna kû bûyer û hedîse li Cezayîrê dibihure û min roman pêşkêşî şoreşgerên Cezayîrê kir..." -kurdîstan Press, hejmar 89-

Îbrahîm Ehmed 20.06.1969'an de dibêje kû, "Di Nîsana sala 1956'an de min dest bi nivîsandina vê romanê kir." Ji ber sansora rejîma Nûrî Seîdê kevneperest û polîsên wî, Îbrahîm Ehmed "cî, wext û navên qehremanên romanê" êşkere nekiriye.

Bi alî serpehatiya qehremanê romanê Camêr, em pirtî tiştan hîn dibin. Hîşyarbûn, heps, îşkence, demonstrasyon û hêzbûyîn... Halê siyasî, aborî û civakî wek neynikekê tîn pêş me.

Di van salên dawiyê de kek Îbrahîm Ehmed romanek din nivîsî, di van nêzîkiyan de çap bûye. Bi zaravê Soranî ye. Lê çi heyf, ez derheqê vê romanê de nikarim tişteki bêjim. Navê wê jî nizanîm.

H u s e y î n A r î f, zêdetir çîrokan dinivîse, lê romanek bi navê "Şar" jî nivîsiye. Roman qala civata bajarê Silêymaniyê û dîroka vî bajarî dîke.

M i h e m e d M u k r î jî romanek nivîsiye û navê wê "Herest" e. Naveroka romanê li ser Şoreşa Mele Mistefa Berzanî ye. Min ev herdu romanên dawiyê nedîtin û nexwendin. Bi tîpên erebî ne û soranî hatine nivîsandin. Ev astenga girîng mecal neda kû ez wan bixwînim.

Romanên kurdên Tirkîyê

Wexta meriv qala romana nivîskarên kurdên Tirkîyayê dike, berê pêşîn Memet Üzûn tê bîra meriya. Li ber sebebên kûmin di destpêkê de qal kiribû, nivîsandina romanên kurdî li Tirkîyê pirr dereng destpêkiriye.

Eger şaş nîn bim, ya herî ewlîn, romana Memet Üzûn bi navê "Tu" ye. Memet xwastiye romanê bi çûrekî modern binvîse. Lewra, ne bi tehrê klasîk e romana Tu. Rewşa xelkê me kurda kû li gundên derdora Sîweregê dijîn, tîn ser ziman. Nûbûn, dîtînen ciwanan û yên bi sal zêde dide ber hev. Caran dîtînen felsefî dike tev. Romanê bala gelek kesî kişand, lê ne bi tehrê romanên kû heta niha kurdan xwendibûn, lewra bi gelek kesan re jî "ecêb" hat, lezet û temjê negirtin. Îşkence û ruhiyeta girtîkî tê analîz kirin. Roman di sala 1984'an de li Stockholmê çap bû.

Lê Memet Üzûn xeberên xwe yên li ser roman nivîsandinê her pêş de bir. Navero-kên romanên xwe ji kesên dîrokî yên kurdan digirt. Wek li ser jiyana Dengbêjê bi nav û deng Evdalê Zeynikê, Sekreterê Xoybûnê Memdûh Selîm û hîmdarê elifbaya kurdî ya latînî, zimanzanê mezin Celadet Bedîrxan roman nivîsî.

Di 1987'an de romana Memet Üzûn ya duemîn dîsa li Stockholmê çap bû. Navê wê, "Mirina Kalekî Rind" bû. Di vê romanê de kultûra kurdan, ya nesla kevn û nûtîne pêş hev. Ev herdu çîn bi hev re şerekî

bêdeng dikin... Memet Üzûn, tradîsyona kevn û nû nîşanî me dide. Tradîsyona nû bi çi tehrî dixwaze bi ser bikeve? Xetarekî kal, qehremanekî romanê ye. "Kalo" û qehremanê din yê ciwan jî Serdar Azad e. Kalo yê xetat afrandinê Melayê Cizîrê bi destên xwe yên hunermend neqîşandiyê. Di dawiyê de hatiye li gundekî bi cî bûye. Wek yekî penaber e. Ji bilûrê, tebîetê, rindiyê û başiyê hez dike. Di romanê de halê penaberiye, mihaciriye tê analîz kirin. Meriv halên wan ên hîsî û ruhî dixwîne.

Di van herdu romanên Memet Üzûn de taybetî hinek kes û bûyer ne zelal in. Lê di romana xwe ya sêemîn de jî "anonîmî"yê derdikeve, her tiştî eşkere û zelal dide pêş me. Romana sêemîn, "Siya Evînê" ye. Qehremanê romanê Memdûh Selîm e. Memdûh Selîm ji hêla Wanê ye. Li Stembolê ronakbîr û welatparêzekî kurd e. Paşê, dema kû Cûmhûriyeta Tirkîyê ava dibe, diçe li Sûriyê bi cî dibe. Kesekî modern e. Yek ji hîmdarê Xoybûnê ye. Li wir jî keçeka Çerkez hez dike, lê wê demê berê xwe dide Ararat'ê -Girîdaxê-, tevî Şoreşa Araratê dibe. Piştî belavbûna Şoreşa Araratê vedigere. Lê dibîne kû keça Çerkez bi yekî din re zewiciye. Di romanê de rewşa ciwata Kurd, rêvabirina Şoreşa Araratê û evîna keça Çerkez xweş hatiye pêş xwendevanan.

Romana Memet Üzûn ya çaremîn, "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" ye. Evdalê Zeynikê dengbêjekî gelekî bi nav û deng e. Ji derdora Araratê, Elaşgir, Qereyazî, Mi-

lazgir û Dutax'ê ye. Bi tehrekî din kû ez bêjim, Evdalê Zeynikê hembajariyê -hem-şehrî- min tê hesab kirinê. Em serhedî, derheqê wî de gelek tiştan zanin. Bi kurtayî dikarim bêjim, ew qurna 19'an de jiyaye. Dengbêjê Surmeli Memed Paşa bû. Surmeli Memed Paşa li Elaşgir'ê -Toraqqelê-rûdinişt. Begê Serhed'ê yê mezin bû. Bi eskerên xwe ve çû alîkariya Siltanê Osmanî kir li Kozan'ê, şerê Kozanoxlî kir. Li bergerma Edenê pirt kesên wî qir bûn. Kilama "Li Xozanê...Li Xozanê" li ser vê bûyerê ye. Dengbêjekî navdar, navê wî Silê, xelqê Diyarbekrê re bi kilaman ve ber hev didin, dikevin lecê. Ava reş tê li ser çevên Evdalê Zeynikê. Demeke dûr-dirêj Evdalê Zeynikê êdt nabîne. Navê kurê wî Temo û jina wî Gulê ye. Qulingekî topal û baskîkestî ji xwe re dike heval û quling pak dike. Kilamên xwe li ser "Quling, Temo, Gulê û te-bîetê" gotiye. Di romanên Yaşar Kemal de, pirt caran qala Evdalê Zeynikê tê kirinê.

Lê di romana Memet Üzûn de qala bûyerên Surmeli Memed Paşa û şerê Kozan'ê nayê kirin. Di 1935'an de yên kû kovara Hawar'ê derdixin, du bira Celadet û Kamûran Bedirxan Beg dixwazin kû hevalên wan yê dengbêj Ehmedê Fermanê Kikî qala Evdalê Zeynikê bike. Ev bûyerên romanê ji alî Ehmedê Fermanê Kikî hatine gotinê. Roman nîşan dide kû "edetên dengbêjîyê" gere bijîn. Ji bo vê hewildanek heye. Ji dema Evdalê Zeynikê heta bê bigihêje Ehmedê Fermanê Kikî, çi guhartin bûye û van edetan çi tehrên nû girtine?

Lê ez dixwazim tişteki din bêjim, di romanên dirokî de, dema kû jiyana kesên bi nav û deng tenê nivîsandin, gere meriv van şexsan bi raste rast bide pêş xwendevanan. Zêde an kêm kirin neheqî ye.

Bi kêfxweşbûn haya min bû kû Memet Üzûn romanêke pêncemîn nivîsiye, wê li Turkiyê çap bibe. Naveroka romanê, jiyana Celadet Bedirxan e û navê wê, "Bîra Qederê" ye. Tê zanîn kû Celadet Beg li Sûriyê bîreka avê dida kolandinê, ew li cem bîrê bû, erdê bîrê kû hulşiya, Celadet Beg birindar bû û çû ber rehma Xwedê. Di vê romanê de jiyana Celadet Begê, diroka malbata Bedirxaniyan û di dawiyê de çilo ji dirokê radibin, tê pêşber kirin.

Romana Memet Üzûn Baksî "Hêlîn" li Stockholmê di sala 1984'an de çap bû. Serpêhatiya Hêlîn'ê, ya qehremanê romanê, bi zimanekî xweş hatiye nivîsandin. Ji ber zordestiyê, malbata Hêlîn'ê, ji Turkiyê, bi sînoran ve direvin diçin Lubnan'ê û ji wir jî diherin Swêd'ê. Roman bi kêfa dilê ciwan û xortan e. Tirs, zehmet û xeterên li ser sînoran pirt baş tê tesfir kirin. Rohat, van beşan "edebiyata li ser sînoran" qebûl dike.

Romana Mehmûd Baksî, ya duemîn, "Gundikê Dono" ye. Dora 1950'an, traktor û motor kû dikevin gundên Xerzan, jiyana jî tevlihev dibe. Şerê gundî û axan zêde dibê. Di vê romanê de ev meselên nûhatî tînin pêş me. Rewşa jinan, ya zehmet û zewacawan a bêdil tê li ser ziman. Mehmûd civata kurdî baş nas dike.

H e s e n ê M e t ê jî romana "Labîrenta Cinan" nivîsiye û di sala 1994'an de li Stockholmê çap bûye. Qehremanê romanê mamoste Kevanot e û roman li ser serpêhatiya wî hatiye avakirin. Ev mamosteyê îde- alîst tê li dibistana, gundekî kar dike û demekê şûn de dîn dibe, tê ser riya gundiyan. Qil û qalên gundiyan, ayîn û bûyerên mîstîk hêdî hêdî mamoste jî wek wan dike. Ev romana sosyo- psîkoljîk numûneyeka pêşîn e, pirsegirêkên kurdî, yên civakî û psîkolojîk tîn ser ziman. Meriv kû romanê dixwîne analîzên Gogol, Çehov û Dostoyevskî tîn bîra meriya.

Ş a h î n ê S o r e k l î bi eslê xwe ve ji Sîwereg'ê ye, li Sûriyê bi cî bûye û niha jî li Awûstralyayê dijî, romanek bi navê "Wundabûn" nivîsiye. Di romanê de li dijî "nezanîn"ê disekine. Ji bo serketinê zanebûn lazim e. "Sûcê kêmasî û bêçarebûna yê bîndest" derdixe pêş. Di vî warî de carcaran ji heywanan mînak dide.


M e d e n î F e r h o jî di van nêzikiyan, dawîya sala 1994'an de romana xwe "Berxwedan Jiyane" çap kir. Min bi xwe hela hê roman nexwend, ji ber kû min li Swêdê bîndest nexist.

N a c î K u t l a y di 1988'an de li Stockholmê bi navekî anonîm -Nûrî Şemdîn- romana "Zeviyên Soro" pêşkêşî xwendevanan kir. Derdora 1950 de, dema kû makîne û traktor nû dikevin li gundên kurdan, şerê axa û gundiyan, li ser erdê her pêş de diçe. Li gundê Tendûrek'ê de berê Ermenî jî hebûn. Di Şerê Yekemîn yê Dinyayê de ew

hatin kuştin û sirgûn kirin. Erdên wan jî ket destê axayên kurdan. Romaneka axa, gundî, zordestî û bertîl xwarina rêvabir û memûran tê nîşandanê. Abûqatên durû, bajarvaniyên kû gundiyan dixapînin hene di romanê de, lê hişyarbûna gundiyan û Fata Jinebî jî heye. Romanê gere di demeka din de dom bikira, min ev pirs da xwendevanan kû wê jî binvîsim, lê hela hêjî min pirsra xwe nehanî cî.

Derheqê hinek roman, nivîskar û romanên wan de dibe kû min çend nav ji bîr kirin. Lê yên kû ez dizanim ev bûn.

Di nav me kurdan de nebûye edet kû em li ser romanên dîtînen xwe û krîtîkên îlmî binivîsin. Rohat di vî warî de hewil dide xwe kû vê bêdengiyê bişikêne. ■



Zeviyên Soro, romana Nacî Kutlay bi naznavê Nûrî Şemdîn di sala 1988'an de li Stockholmê derket.

Mirov û welat di helbestên Refîq Sabirî de

L
Ê
K
O
L
I
N



Xelîl Duhokî

Dasana Meqorêna min, bi nivîsînê girove nabe
Dê ji bo te vegêrim, ger çavê min bi yê te ketê ve.

HACI QADIRÊ KOYI

Refîq Sabir, helbestvan û şoreşge-
rrekî Kurdistanê başûr e, bi tîpên
erebî û kurmanciya jêrî (sorani) dini-
vîse. Di destpêka xortaniya xwe de,
dest bi nivîsînê kiriye. Wî ne bes ew
barê giran rakiriye, belku bi germî,
xwe avêtiye qada xebata siyasî jî. Ew
helbestvanekî xwedan taqet û şiyânên
bilind e di helbesta nû ya kurdî de.

Bi dirêjîya van bîst û pênc salên bûrî, wî cihêkê taybet û bi hêz di
qada edebiyatê de hebûye. Helbestên wî li Kurdistanê başûr pirr di
belav in û cihê wî di dilên xwendevanan de heye. Di çendîn fêstîva-
lên edebî de jî, helbest xwendine. Wî ne bes bi helbestên xwe xizme-
ta gelê kurd kiriye, belku di senger û çeperên, pêşmergetî û xwera-
girtinê de jî, xebata xwe berdewam kiriye. Ew xwedan bîr û bawerên
rêncber û karkeran e, kurd û Kurdistan, du armancên here pîroz in

di evîna wî ya mezin de. Ji aliyekê li dij faşiyên Îraqê û ji aliyê din jî, li dij axa û şexan, rewîştên kevin û feodaliyê bizav kiriye. Lewre cihê wî yê dirust, nav rêzên komonîstan bû. Vê çendê rê li baweriyên wî yên netewî negirtiye, çinku ew kurd e û sitema li ser milletî, dilê wî digivêşe û birînên wî kûr dike. Ew bi destekê qelemî digire û bi destê din jî, tivengê radike. Tevaya salên xortaniya xwe, dide xebatê û çendîn sala jî, li çiya û şkeftên Kurdistanê dibûrîne. Ew jiber rewşa aloza Kurdistanê û cidabûna bîr û baweran, nemaze giriftariyên şerê birakujiyê, xaça xwe heldigire û ber bi derveyî welatî diçe û heta niha jî, jiyana derbederiyê didûmîne, lê Kurdistan û gelê bêxwedî, di dil û mejiyê wî de ye.

Di sala 1970'ê de, gelê kurd bi xwîna hezaran şehîdan, karî pişkeka mafên xwe misûger bike û otonomiyekê li Kurdistana başûr bi dest xwe ve bîne. Hîngê rê li ber çand û edebyata kurdî firehtir bû û bi dehnan dezgehên çand û roşenbîriya kurdî ve bûn, çendîn kovar û rojname jî bi zimanê kurdî serên xwe hildan. Vê çendê rê li ber nivîskarên kurd jî xweş kir û bi germî hatine qada xebatê. Belê; di wê demê de, biza-veka nû ya edebî bi mebesta peydakirina riyên nû, wek guherîna zimanê şîrî, bûçûnên şîrî û teknîkên nû ji dayik bûn. Mebest ji wan riyên nû ew bû ku, bikarin derbirîne ji kovan, azar, xem û xewnên mirovê kurd bikin. Ji wan nivîskarên ku rola xwe leyztîr, yek ji wana Refîq Sabîr bû.

Yê helbestên wî bixwîne, bo xuya dibe

ku, ew berdeyam ber bi pêş de çûye û helbesta kurdî ya nû gehandiye pileyên bilindtir. Ew xwedan behre û roşenbîryeke berfirehe, xwedan tectûbe û ezmûneka şîrî ya mezin e. Hemeseîd Hesên, di hevpeyvînek xwe de, dibêje: Refîq Sabîr, helbestvanekî dahîner e. Her çend di jiyana xwe ya rojane de, pêtir bi karê siyasî ve mijûl e, neku helbestê, lê cihê sirinc û kêfxweşiyê ye ku, heta niha reşebayê siyasî gûla behre û mewhîba wî ne werandiye. Ev e jî min dibxweş û geşbîn dike ku, rojekê ew dê pêneka bi hêz li goka siyasî de û êdî bi dirustî vegere cîhana pîroza helbest û edebî. (1)

Her wesa Heval Kwêstanî, di gotareka xwe de, dibê: " Di nav dengên diyarên salên heftêya de, Refîq Sabîr, bi pêngavên hêdî û liserxwe, lê bi hêz û xuya, ber bi pêş de çûye û salên heftêya bicê hêlaye û geştiye pileyên bilindtir û cihê xwe di nav helbesta nû de mukum û qayim kiriye. Ew dengê here bilind û dahînerê helbesta piştî salên heftêya ye û herdu diwanên wî (Wêr-zî Sehlobendan û Lawikî Helebce) baştirîn nimûne ne, ji bo serketin û efrandinên wî." (2)

Helbest li cem Refîq Sabîrî, berî her tiştî, helwêst e beramber jiyana û tevaya rûdanên serdemî. Ew li dij gişt sitem û zulmê radiweste. Ev çende jî, çîroka Keremani yê şair diîne bîra mirovî. Dibêjin: " Carekê Cengîzخانê hov, aheng û fêstivaleka mezin ji bo serketinên xwe çêkir. Wî gelek hunermend, stiranbêj û helbestvan mêvan kirin. Her yekê li gor berjewendî û pêwîstiyên

xwe, yan jî ji tirsê mirinê, pesnê mêranî û çakiyên wî da. Heta dor ge-hiştiye Keremaniyê helbestvan.

Tîmûrleng ji Keremanî pirsî: Tu çewan min dibînî û ez bi çi qasî cînim?

Keremanî bersiv da û got: Tu bi vê rewşê hêjay bîst lî-rayî...

Wî bi hêrs jê re got: Tu çi dibêjî! Kembra piştê min bi tenê hêjay vî pereye.

Keremanî got: Mebesta min jî kembra piştê te ye, nexo tu nehêjayî tiştêkî yî. Hîngê Tîmûrleng fermana kuştina wî da. Belê; bi sedan zalim, dirrindê û hoven mîna Tîmûrleng û Firankoy, bi

lanet û tif çûn û rûpelên reş jî, ji bo wan hatine nivîsîn, lê qareman û xwedan helwêstên şoreşgêr, mîna Keremanî û Lorkay, her di dilê mirovatiyê de dijîn û dîrokê jî



Refiq Sabir

rûpelên zêrîn ji bo wan xemlandin. Belê, Refiq Sabir jî, bi dirêjîya jiyane, helwêstên xwe parastîne û cihê xwe di dilê xelkê de kiriye.

Ew helbestvanekî serketiye û ji bo têgehiştina berhemên wî jî, xwendevan carna zehmetê dikişîne. Ew şairek şarezaye, lewre ew çend pîtey bi naverokê dike, hind jî bihayî dide formê jî. Helbestên wî, ji wênên şiiirî miştin û hevokên wî mukum darêjtîne. Musîqa helbestên wî, nerm e û hêdî xwe davêje guhên mirovî û di nav xwînê de digere. Zimanê wî jî rewan, sivik û xweş e. Hêvênê helbestên wî, li ser jiyan, giriftarî û kovanên mirovî ne. Bi derd, xem û azarên wî ve girêdayîne. Bi rastî jî, mirov li cem wî mezintirîn sermaye ye. Ew bi xwe dibêje: “Min welatê xwe, heta pileya perêstinê xweş divê, lê rastî, serbestî û parastina bîr û bawerên min, wek mirov, giringtir e.”⁽⁴⁾ Belê; ew berî hemî tiştî mirov e. Lê mirovekî kurdê bê welat û jêrdest e. Barê wî giran e û xemên wî çiyar e. Çinku ew ser bi milletekî ye ku, hemî rojê diête çewsandin û welatê wî jî, diête şewitandin û wêrankirin. Ew her ji zaroktiya xwe de, di nav topbaran û mirinê de bûye. Ew dibê: “Şerê li Kurdistanê, zaroktiya me kuşt. Lê wê çendê ne bes tirs, kerb û kîna me beramber dijminî zêde kir, belku her di wê demê de, em zû mezikirîn û evîna welatî pêtir di dilê me de mukum kir.”⁽⁴⁾ Belê; dema di sala 1961-an de, şoreşa kurdî li Kurdistanê başûr destpêkirî, hîngê Refîq zarokekî yazde salî bû. Ew digel wan karesat û şewatan mezin bû. Rojê çendîn firokan barê xwe yê bomban vala dikire ser gund û bajarên Kurdistanê, bi dehan xanî diherifandin û bi dehan kes jî dikuştin. Van kiryarên hovane her zû ew

gehande baweriyê ku, divê xebateke gerim û bêrawestan ji bo rizgarkirina welatî bête kirin.

Zulm û sitema dijminê faşî li Îraqê, her zû Refîq Sabir fêrî xebat û xweragirîtinê kir. Wênên dilşewatên zaroktiyê ji pêş çavan winda nabin. Her roj jin, zaro û kalên bajarî, bi topên hovan dihatine kuştin. Ew bi wê rewşê mezin bû û dema kêr gehiştîye ser hestî û sitema faşîyan berdeyam bû, êdî ew neçar bû ku, dest bavêje tifengê û berevanîyê ji gel û doza xwe bike. Ew di helbesteke xwe de dibêje:

Riya Tifengê

Esmankî şin û ciwan, min hebû
 Dagîrkeran bi ser min de hirrifandin.
 Çend dilopên xwîna reş û
 Qefteka xewnên hingivîni û
 Çend pirtûk, min hebûn
 Ew jî talan kirin.
 Lê dema xastin çermê min bi gurên
 Serûçavên min, kirêt bikin
 Min xwe bi befir û birûsiyê xemland
 Welat deyna ser milê xwe û
 Riya tivengê girt.⁽⁵⁾

Sedan sal e ku gelê kurd li ber sitema dijminan e. Welatê wî wêrankirin û terr û hişk bi hev re şewitandin. Bi dehan hezar bêguneh kuştin, lê çinku wî bawerî bi doza xwe heye û ew dizane ku dara azadiyê bi xwînê tê avdanê, lewre li ser xebatê berdeyam e. Lê her wek helbestvanê Ispanî Lor-

ka dibêje:” Hemî tariya dinê nikare ronahiya fenerêkê biveşêre.” Refîq jî li wê baweriyê ye û roja geş li pêşiya xwe dibîne û di nêzik de wê ewrên tarî esmanê welatê wî çol ken û wê ronahî bigehe tevaya aliyên Kurdistanê. Ew di helbesteke xwe de, bi vî rengî rewşa xelkê gundî xuya dike, dema hêzên hovan hêrişê tînin ser wan:

Kop

Li nêzik mala wan hawarek hat
 Bi lez rabû û çira vemirand
 Ji aliyekê pencerê, awirek li kolanê da
 Rêzên fişekên girrdar
 Tunelek dirêj, di şevê de çêkir
 Mala beramber jî, çirayê xwe vemirand
 Tax di nav bédengiyê de winda bû
 Lê li ser girê aliyê din
 Çirayek mîna stêreka qels
 Mîna agirê li ser kopekê dût, dişewirî⁽⁶⁾

Zarok çûkên beheştên e, lê bi sedan sal e yên kurdan, di dozex û cehenemê de dijîn. Di sersalan de, zarokên dinê xelat û diyariyan werdigirin, lê yên kurda napalim û topan dibînin. Belê; rewşa zarokan jî bi karesatên millerî ve girêdaye. Lê heta dawiyê bîsta dijmina nakeve ser me. Dê rojek êt ku zarokên me jî, mîna yên dinê bi xweşiyê şad û kêfxweş bibin. Refîq Sabir, di vê helbestê de, basî rewşa zarok û dayikên kurd dike ku, çewan yên xelkê di nexweşxanan û cihên tena de, ji dayik dibin, lê yên kurdan li bin topên firokan, di şkeftan de, di nav

tirumbêlên leşkerî de, gov û zinca de, di nav birîn û hawaran de, ji dayik dibin. Hindek dayik di wê rewşê de dimirin, hin zaro jî bi normalî ronahiyê nabînin. Hene bi topên dijmina, kor, bêling dibin. Heta niho bi hezaran zaro bê dayik û bav mane û li kolanên bajar û gunadan jî şêr û dîn digerin. Ew bi dilekê pirr şewat dilorîne:

Jidayikbûn

Di kollekî sirê birî de
 Li bin dilopan û
 Li ber tirs, bîrs û sermayê
 Bê dapîr û bê kes, ji dayik dibe!
 Di şkefta tarî de, li nav hewarê
 Di piştî Zila de
 Li bin dewaran, ji dayik dibe!
 Di nav birînan de, ji dayik dibe!
 Li demê serbirrîna, ji dayik dibe!
 Li nav topbaran û şewitandinê de
 Zarokê kurd, ji dayik dibe!
 Zarokê kurd ji bo yaxîbûn, azirîn û
 Pêşmergeatiyê, ji dayik dibe...⁽⁷⁾

Ew mirov e û mîna yên din, hez musîqê û ciwanîyê dike. Ew jî dixwaze di avahiyên tena de bijî. Ew jî dikare serê xwe neêşîne û berjewendiyên xwe biparêze. Lê çinku ew bi eşqa welatê xwe ve girêdaye û hemî cîhanê di çavên Kurdistanê de dibîne. Êdî bê welat çi çêj û tam di jiyanê de tune ye. Welatê wî kirêt dikin û pîlanên çepel yên herifandinê digêrin. Helbet ew bi wê çendê razî nebe, lê ya ji wî tê ew e ku, tif û laneta

li gişt paşa û xwînreja dike. Ew di helbesteke xwe de dibêje:

Ev mirov e

Ev mirove jî
Şeydayê musiqê û ciwanîyê ye.
Ev mirove jî
Mîna te, evîndarê jiyane ye.
Lê dema dibîne, welatê wî li kolanê ketiye
Kêr û çeqo, sîberê lê dikin
Hindî dikare,
Dergehê bajarî kevrebaran dike
Hindî dikare,
Serûçavên paşan bi tifê bûyax dike.⁽⁸⁾

Ew hemî tenahî û dilxweşiya xwe di rizgarkirin û serferaziya welatê xwe de, dibîne. Ew ji evîndarên mîna Welîdêwane re dibêje: Dêrdê evîna te û Şemê sivik e û xemên we hindik in. Kovanên welatî pirr in û evîna wî giran e. Were bibîne di sedsala bîstan de, heştta mirovê kurd jêrdest e. Birçî û hejar e. Eger tu bi derdê rênber û bêxwedana bihesî, rewşa kambax ya welatî bibînî, ez bawer dikim dê evîna xwe jibîr bikî. Ew di vê helbesta xwe de, dilî dihelîne û rihên xweragirtinê diçîne.

Şevêk li ser gora "Welî Dêwane"⁽⁹⁾

Ey Dêwane!
Bajarê me, çavkaniya girî û xeman e.

Tevaya qulaç û aliyên wî, pirrî jan e.
Eşîr derbederê deşt û çiya ne.
Bê zozan e.
Xelk li cihê bejna Şemê
Çaverê û şeydayê, qetêke nan e.
Ey Dêwane!
Hemî çiya û zozan
Bi laşên hezaran bê gunehan
Bi Tîzab û barûtê, winda kiriye
Tu Xudê key, çira? Dengê Xudê
Di bajarê min de, xeniqiye!⁽¹⁰⁾

Di buhara sala 1988-an de, hukumeta faşîya Îraqê, bajarê Helebce, bi jehrê topbaran kir. Di çend hêrişên firokan de, ji pênc hezar kesan zêdetir zarok, jin û kalên kurd kuştin û bajar di bédengiyekê de hêla. Ew roj, pinyeka reş e bi navçavên hovên Îraqê ve û birîneke kûr e di dilê tevaya mirovatiya bindest de. Dema navê Helebce tê, her kes axîna radihêle û çîroka wê jî, li gişt dinê belav e. Piştî karesata Helebce, dehan lafaw û lihiyên din jî bi ser kurdan de hatin. Her çi gundên mayî jî, ew jî şewitandin û Kurdistan kavi kirin. Li her cihêkê şivanek jî ketiba ber çavên dijminî, yekser dikuştin. Belê; di vê rewşa kambax de, wireyên xelkê şkestin û tevaya bingehên serkirde û pêşmergan, derbazî sinûra bûn û kunda li şûnewaran stiranên şîn û giriye digotin. Van karesatên mezin baweryên xelkê kêmkirin û gelek tûştî daşkestinê bûn. Perdeka reş xwe avête ser Kurdistanê û doza gelê kurd jî, çendî sala paş de çû. Belê; vî derdê giran karekî mezin li ser tevaya mirovên xwe-

dan wîjdan kir, nemaze di nav kurdan de û ev karesate bûne sedemên vehandina dehan berhemên jêhatî. Lê sed mixabin, cîhana bê wîcdan û dostên helperist, mirovatiya direw, aştîya saxte û civatên bi nav demokrat, awirek jî li gelê kurd nedan. Ew di xwîna xwe de gevizî û bi tenê ma. Bi tenê û kesê xwe lê nekire xwedî. Refîq Sabirî, helbesteke dirêj û diltezîn bi vê helketina dilşewat vehandiye. Ew di parçeke wê de dibêje:

Lawikê Helebçe

Em li ber lafaw û lihiya gaza jehirkirî û Bêrewîştîya vî çerxî, çend rûtûn...!
 Em di taziya vî bajarokê şehîd de,
 Çend bi tenê ne!
 Em di şînê de, çend bi tenê ne!
 Em di govenda xwînê û kernevala serbirrînê de,
 Çend bi tenê ne!
 Em çend bi tenê ne!
 Çend bi tenê!

Bila Helebce

Semfoniya dawîya vê şevê be...

Bila Helebce

Bersiva sûra neviya be...

Bila kernevala dawiyê ya

Xwîn û birîna ebedîya gelî be...

Bila Helebce

Heta hetayê Helebce be...

Helebce be û Helebce be! ⁽¹¹⁾

Karesatên gelê kurd, bûne sedem ku bi hezaran kes ji welatî birevin û derbederî cîhanê bin. Gelek kes bi rêve dimirin yan dihatine kuştin. Yê bi derd û bela ve xwe gehandîne welatên biyanî jî, di xerîbiyê de gêj û sewdaser bûn û hindek jî, li kolanên biyaniyan dîn û şêr bûn. Ji xwe mezinên me gotiye: Kevir di cihê xwe de bi seng e. Belê; vê rewşa xerîbiya dehan salan, dilê Refîq Sabirî jî xwariye û bêhna wî teng kiriye. Ew her êvarê pîlan û nexşan çêdike ku, welatê xwe yê wînda bibîne. Lê ax jî dûriyê. Dijmina rê li dîtina welatî girtiye. Ew di helbesteke xwe de, derdê dûriya welatî tîne ziman û bi hesreta wî di xew diçe.

Nexşe

Dema rabûy
 Gotû: Dê di nav giriftarî û sergêjiya de, derbaz bim!
 Gotû: Dê welatê xwe yê wînda peyda-kim!
 Li ser mêrgê nexşa welatê xwe çêkir
 Bi tîrêjê ala bo dirustkir
 Dema bûye êvar
 Mîna zarokekî, xewê dilê wî girt
 Careke din
 Xewê, welat û ala jê dizî. ⁽¹²⁾

Refîq, şeydayê welatê xwe ye û di eşqa wî de helyaye. Çewan Ferhad, ji bo xatira çavên Şîrînê, amadebû çiyayê Bêstûnê kun bike û avê jê derbîne û Welîdêwane, hêvî û tika ji ewran dike ku, lafaw û lihiyekê rakin

da ku êl û eşîra Şemê ji zozanan vegerin deştê û ew çavên xwe bi dîtina wê têr bike. A wilo Refîq jî, aşîqê welatê xwe ye û amadeye hemî kosp û astengan bişkêne û di rîya wî de, xwe qurban û gorî bike. Yê hewil bide evîna wan bikuje, bila here karên entî-ke û giran encam bide. Çinku bi tenê mirin dikare wan ji hev dûr ke, lê hîngê jî, evîn ji dilê wî dernakeve. Ew bi vê eşqa mezin, welatê xwe himbêz dike. Di helbesteke xwe de dibêje:

Min tu divê

Ewê bixwaze kişwera evîna min
Winda bike.
Wênê te di derya xwîna min de, bi şewidne.
Bila ava çema,
Bostekê ber bi paş de vegeîne.⁽¹⁾

Dagîrkeran bi tank û topan welatê şîrîn wêrankirine. Her çi rengên bajarvaniyê hene, têkdayne û Kurdistan serûbin kirine. Her çi çekên qedexê li dinê hene, wî dijminê hov li dijî gelê kurd bi kar anîne. Şûnwarên dijminî li her çar aliyên welatî hene. Gundên herrifandî, daristanên şewitî, bîr û kaniyên girtî, mirovên bê dest û pê, kore û seqet, sêwî û bîjin. Te çi rengê êşkence, sitem û eziyetê bihîstibe, ew li Kurdistanê û li dijî gelê kurd bikar anîne. Dijminan welatê wî yê şîrîn, pîs û kirêt kirine. Lewre ew pêdivî tevaya ava cihanê ye. Ew li avê digere, çinku her av dikare şûnwarên pîs û ge-

niyên dijmin paqij bike.

Helbesta avê

Tu her avî!
Tu rengan geş bikiye ve... tu her avî!
Serhatiya rihan binivîst... tu her avî!
Sinûra navbera tîştan paqij dikî... tu her avî!
Tu her avî... avî û her avî!
Min nejadê avê divê
Ta demsala axê bişom.
Min tevaya ava cihanê divê
Ta vî erdî ji guneh û şûnwarên dagîrkeran paqij bikim.
Min nejadê avê divê...
Min tevaya ava cihanê divê!⁽²⁾

Dema partiya komînîsta Îraqê, di sala 1978 an- de, biryara şerê çekdariyê li dijî hukûmetê da, hîngê Refîq Sabirî li Bulgaristanê xwendina xwe ya bilind didomand. Lê ji bo ku pişkdariyê di xebatê de bike, ew dest ji xwendinê berdide û diçe Kurdistanê. Di çend salan de, ew gehîşte baweriyê ku di nav partiya wî de jî, azadiya bîr û bawera nîne û pîr giriftariyên siyasî jî mişebûne. Nemaze dema ew piroblem bûne sedemên şerê birakujiyê, êdî ew biryarê dide: Dema serokên eşîrên me jî (Partiyên me. X.D) dest bi şerê birakujiyê kirin, hîngê em toşî ezmûn û tecrubeka sext û dijwar bûn û namobûnê jiyana min dûrpêç kir. Êdî mana min wek mirov û şair li çiya, karekî bê mana û windabûneka ebedî bû. Encam dîsa

derbederî û mişextbûna derveyî welatî.⁽⁶⁵⁾
 Ew di helbestek xwe de, rewşa kambax ya
 şerê birakujiyê destnîşan dike. Dema mef-
 rezeka pêşmergan, westiyayî û kesire, ji çalakiyekê vedigere deverên rizgarkirî, wek
 adet diçin û li malên gundî belav dibin. Lê
 riya hindeka dikeve mala yekê ku di şerê
 birakujiyê de hatiye kuştin. Dema kurê wî
 dergehî vedike, yekser tif û laneta dibarîne
 ser wan û çî alikariyê jî nake. Belê; şerê bi-
 rakujiyê giriftriyên mezin ji bo kurd û şo-
 reşa wî peyda kirine û bi dehan sêwî û bîjin
 hiştine. Lewre ya fere li ser her kurdî ku li
 dijî vî şerê ne pîroz û wêranker rawsete û
 pîlanan jî ték bide. Refîq Sabir, di vê hel-
 besta xwe ya dirêj de, rewşa aloz ya pêşmer-
 gên mefrezê û zarokê pêşmergê kuştî jî dide
 ber çavên mirovî û dilî dihelîne. Ev e parç-
 ek ji wê helbesta, ez pêşkêşî we dikim.

Werzî Seolbendan

Wê şevê, westiyayî ji bajarî vegeryayn
 Bakuzîrkê rê li me girîbû.
 Birsê em ber bi quntarî birîn.
 Bi quntaxên tivengan, bi pêna me li
 dergehê kolkekê da.
 Zarokekî rîs û pêxas
 Porhingivînî dergeh vekir. Hawar kir!
 - Mêrkujîno
 Ma hûn nebûn, we babê min kuştî
 Çira we ew kuştî?
 Mêrkujîno!
 Zarokekî sûr û çavşîn, porhingivîn
 Em nenasîn û derxistin!

Bi axîn û keser bêhin kêşa
 Dijîn gotin û dayne ber tifa
 Zarokekî sûr û çavşîn
 Me nezani, kurê kîjan pêşmergê ciwa-
 nemerg bû...

Me nezani, çima me babê wî kuştibû!?
 Erê ma me babê wî kuştibû!?
 Kê ev agir di ruhê min de helkiriye!
 Kê bi xwîna min, quntar sûştine ve!?
 Xewnên savayên min dizîn û
 Careka din birînen min, kirine nîşan!⁽⁶⁶⁾

Vê rewşa aloz û diltezîna li Kurdistanê,
 çendîn nivîskarên kurd toşî bêomêdî û namobûnê kirine û çî çêj û tam di jiyana wan
 de nehêlaye. Yekî wek Refîq Sabirî, vegery-
 yaye welatî da ku li dijî faşîyan xebatê bike
 û rolekê di guherîn û pêşketinê de bibîne û
 xweşiyê li ser lêvên zarokan biçîne. Lê li şû-
 na vê armanca pîroz, ew dikeve nava girif-
 tarî û kêmasiyên şoreşê û şerê birakujiyê.
 Ew nerazîbûna xwe diyar dike û li dijî xeletiy-
 an radiweste û bi kêmfî jî be, ew beşdariyê
 tê de nake. Lewre ev care jî, ji ber neheqî
 û ne demokrasîyê, dîsan welatê xwe di-
 hêle. Helbet rewşek weha mirovî diêşîne,
 nemaze eger nivîskarekî rasteqîne be. Hîngê
 dilê wî dihelîne û bêhêvî û bêzar dike.
 Êdî ew ber bi cîhana taybetiya xwe ve diçe
 û namobûn hinde aliyên jiyana wî serûbin
 dike. Lewre ew hizir û texmînan di dinê û
 dûrûberên xwe de dike. Di monologekekê
 de, pirsyarên ku berê feylesofan li ser rewşa
 dinê, cewherê mirovî, xwezayê, meselên
 mirin û jiyane, zulm û sitemê, kirîn, dûba-

re dike. Ev çend jî wî sewdaser dike û bi çavekî din temaşayî dinê û rûdanên serdemî dike. Êdî rewş wî ber bi namobûnê dibê û ew li tiştêkî din digere ku wî bigehîne aram û tenahiya ruhî. Da parçeka din jî helbesta wî (Werzî scholbendan) bixwînîn:

-I-

Di êvara êvarê de
Nihênî ruhê min a netebitû perjîn dike
Bakuzîrk dêmê min diguhire
Di quntara guman û bê tenahiyê de
Serê xwe didim aliyekî girî û
Xwe bi gijlokê dipêçim
Ewrekî ne rawestay
Riya xwe, di dilê min de winda dike
Xwîna bi dîwarî ve û
Toza mişextbûnê û
Êvarî û welatî terr dike.
Ev welate
Dibêy qulaçeka birinê ye û
Şêlka gullaye li hindav
Dibêy ewrekê westiyaye
Li ser derazînka gerdûnê helawîstiyê
Dahato û stiran, ne wek te ne
Bîrhatin, serbîrrîn û mêrga befrîn
Rojavabûn û namobûn, ne wek te ne
Çewan te di vê mişextbûna dijwar de
Mîna pêlên zerên payîzê
Cade û kolan pirr kirine?
Çewa te wek rengê tenêbûnê û baranê
Jiyê tozgiriyê me, qeraxa esmanî û
asoyê girîyê?
Heta bêt, mişextbûn
Fireh û firehtir dibe.

Heta bêt, birîn
Kûr û kûrtir dibe.
Heta bêt, evîn
Asê û asêtir dibe.
Ez dê stêrekê çinim
Û di dilê xwe de veşêrim.
Li ber derazînka mişextbûnê,
Êvarek min dipêçe.
Êvarek ku baran û daristan û
Bîrhatin yek reng dibin.
Bi ser evrazê gumanê de serdikevim.
Serê min bi aso ye dikeve.
Di navbera
Esmanê pîroziyê û kûratiya çavên te de
Navber û sinûrê rangan winda dikim.
Mişextbûnê û
Dahatoya mijgirtî û
Tiştên din jî bir dikim.

Nihênî ruhê min ê netebitû perjîn dike.
Min dike mêrga windabûn,
Tirs û renî yê.
Wek biruskê min terr dike.
Min dike rejî û xwelî
Welatê min!
Çewa xwe bi demî ve bigrim?
Çewa xwe bi dengî ve bigrim?
Çewa xwe bi rengî ve bigrim?
Welatê min!
Çend carên din, divê di mişextbûnê de
bimrim?
Welatê min!
Welatê min !⁽⁶⁷⁾

Belê; xemên mirovê kurd ku, hest bi te-

nêbûnê dike. Ew bêkes e, bê heval û hogir e. Eve dibîte sedemên bêhêvî û reşbûnê. Çinku ew jî mirov e û rûdanên dûrûber û giriftariyên cihanê, karî li ser dikin û wî ber bi xerîbî û namobûnê dibin. Ev çende di vê helbesta wî de xuya dike.

Demsala Axê

Baş e, vê şevê naême cem te!
Dê di nav pêlekê de razê m
Dê aliyê serma û tenêbûnê, kime welatê xwe
Îşev ruhê min, kinarekî çûl kiriye
Baran wek demê miriye
Gerdûn tem û mij e
Niyaza min jî, pêlên deryayê ne
Ev şeve jî naême cem te
Li pişt vê demê
Dê demsala axê, kime welatê xwe.⁽¹⁸⁾

Li xerîbiyê, namobûn jiyana wî dagîr dike û ruhê wî diêşîne. Ji xwe mirov hinde cara hest bi reşbûn û tarîtiyeka giran dike. Di gelek helbestên wî de, ev bêzariye xuya dibin, lê ew ne revîn e. Çinku li dij rawestan û li ser nivîsîn, ew jî helwêstekî di cihê xwe de ye. Ew di helbesteka din de jî, vê çendê destnîşan dike.

Bi tenê nebûm

Bi tenê nebûm...
Şev... li teniştan min, termekî razayî bû

Dem... tem, mij û nalin bû
Welatê min jî
Misteka toza ber bayî bû
Li bejna ruhê min alya bû

Bi tenê nebûm
Agirek bûm
Nihêniyan geş dikirim
Pirtûkek bûm
Deryayê dixwendim.⁽¹⁹⁾

Gelek caran nivîskarên toşî namobûnê dibin, ji ber rewşa aloz û azarên derûnî, mîna Mayakovskî xwe dikujin jî. Refîq ketiye di demek nexweş de, êş û xeman ew dûrpêç kiriye. Lê ez bawer dikim ku, aliyên tarî di ruhê wî de, ronî dibin. Wek Hemingway dibêje: "Mirov dişkê, lê narev e." Fermon vê helbesta wî a din jî bixwînin.

Tu...!

Bi ser ruhê min de,
Pêngava bavêje.
Ku aso xewn be û
Dem pêlên zer be û
Baran jî leylan be
Tu min bihejine.
Tu daristana baranê yî
Daristana demsala yî
Tu tem û toza rûyê dahatiya min dişoy
Min weku xewn û erdî dikî
Nihêniyên mirin û gerdûnê
Ji deftera ruhê min tomar dikiye ve.⁽²⁰⁾

Bi rastî jî, mirovê kurd û welatê kurdan di dil û mejiyê Refîq Sabirî de ye. Hemû hizir û texmîn, bîr û bawerên wî himbêz kirine. Wî welatê xwe hilgirtiye û li herçar aliyên dinê gerandiye. Ew bê welat nekariye bijî. Her çend wî di xebata xwe ya siyasî de, bawerî bi diruşmê “ Ey karkerên cîhanê yek bigirin ” û “ sinûr di navbera karkeran de nîne ” hebûye, lê ji helbestên wî xuyaye - nemaze di van salên dawiyê de - ku welatparêzekî bilind e û diruşmê Kurdistaneka azad û serbixwe, armanca wî ya herî mezin e. Gîrî, azar, xem, derd û kovanên gelê kurd, di helbestên wî de, serî hildidin û ew jî mîna Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî, hewar dike: Ax welatê min!

Refîq Sabir, di sala 1950-an de, li bajarê Qeladîzê ji dayik bûye. Di sala 1974'an de, pişka kurdî li fakulta edebiyatê li zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Her ji sala 1969'an û vir de, dest daye nivîsîna helbestan û di rojname û kovarên kurdî de belav kirine. Ji sala 1982 - 1987'an, pişka felsefê li Bulgaristanê xwendiyê û şadetname doktorayê wergirtiye. Min helbestên di vê lêkolînê de bi kar anîn, ji tîpên erebî û kurmanciya jêrî wergerandîne tîpên latînî û kurmanciya jorî. Lê teveya helbestan- yên lêkolînê û pirtûkê- min ji heşt dîwanên wî helbijartine ku, di navbera salên 1970 - 1995'an de, hatîne nivîsîn. Mebest ew e ku xwendevanên kurmacên jorî bi diruştî têbigihin, wic û mifayê jê wergirin.

Heta niha wî ev berhemên jêrî çap kirine:

1. Pişkoka degeşênewe. Helbest, Bexda 1976.
2. Rêjne. Helbest, Mehabad 1979.
3. Sûtan'le ber baran da. Helbest, London 1986.
4. Werzî sehlobendan. Helbest, London 1987.
5. Lawkî Helebce. Helbest, Bêrût 1989.
6. Karwansera. Helbest, Swêd 1990.
7. Wezeberdîne. Helbest, Elmanya 1991.
8. Dîwanî Refîq Sabir. Helbestên salên 1970 - 1990. Swêd 1993.
9. Awêne û sêber. Helbest, Swêd 1996.
10. Berew mêjû. Vekolîna fikrî û siyasî. Swêd 1991.
11. Her ji sala 1991 ê û vir de, sernivîskarê kovara Rabûnê ye.

Çavkanî:

1. Hemesêid Hesen. Goraniye Balnekirawekan. Çapxana Apek, Swêd 1994. Rûpel 58.
2. Kovara Nûserî Kurdistan. Hejmar 16, payîza 1989. Rûpel 38.
3. Dîwanî Refîq Sabir, Swêd 1993, rûp14.
4. Her ew çavkanî, rûp 11.
5. Her w çavkanî, rûp 375.
6. Her ew çavkanî, rûp 280 - 281.
7. Her ew çavkanî, rûp 315 - 316.
8. Her ew çavkanî, rûp 325 - 326.
9. Welîdewane di sala 1180 ê koçî de ji dayik bûye. Ew kurê Mehemed axay ku, serokê îcaxeka eşîra Kemale yî li devera Hewraman bû. Şem jî keça Qadir axay bû ku, ew jî serokê îcaxeka din ya eşîra Kemale yî bû. Herduka li ber destê mela Yosifî quran dixwend. Ew hez hevdu dikin û di evîneka mezin de di-

jin. Şemê ji bo Welidêwaney dixwazin û bo salekê destgirtiya wî dibe. Lê çerwan û giyayê deştê û giriftariyên eşirtiyê, dibine sedemên kuştina çendîn kesan û xwindarî peyda dibe. Êdî mala babê Şemê ji wî cihê bar dikin û diçine zozanan. Bi wê çendê herdu di agirê evîne de dişewitin. Welidêwane helbestên dilşewat li ser evîna xwe dinivise. Wî dîwanek bi zaravê Hewramî heye û hêja Razi ew wergerandiye kurmanciya jêrî (sorani). Min ji ev parçe wergerandiye kurmanciya jorî. Helbestên wî li Kurdistanê başûr û rojhelatê pîr belavî û gelek ji wan bûne stiran û evîndar xemên xwe pê direvînin. Ew di helbesteka xwe de, digel ewrî dipeyive û dibêje:

Tu Xudê ewrê reş, ba herdu wek yek
Ez li ser erdî û tu li ser felek

Em herdu bi hev re, bi germî bigrîn
Peydakîn ji avê, tem û azirîn

Eger bi vî rengî, lafawek rabe
Cihê êlê qet li zozanan nabe

Ez jî dê bi ditina Şemê şad bim
Wê dilê min xweş be û bê kovan bim
(Dîwana Welidêwane. Çapa duyê, çapxana Babil,
Bexda 1979. Rûp 71- 72)

10. Dîwanî Refîq Sabir. Swêd 1993. Rûpel 382 - 383.

11. Her ew çavkanî, rûp 139 û 147.

12. Her ew çavkanî, rûp 53.

13. Her ew çavkanî, rûp 417.

14. Her ew çavkanî, rûp 40 - 41

15. Her ew çavkanî, rûp 17.

16. Her ew çavkanî, rûp 204 - 206.

17. Her ew çavkanî, rûp 168 - 172.

18. Her ew çavkanî, rûp 236.

19. Her ew çavkanî, rûp 225.

20. Her ew çavkanî, rûp 237.

Helbestvanekî ji nifşê kevin bi nifşê nû re dipeyive

Konê Reş

Seydayê Tîrêj helbestvanekî kurd e ji nifşê kevin, ew nifşê ku ji destpêkê de pîş bi nivîsandina kurdî latînî kirine. Roja îro pîraniya wî nifşî koçkirine wek: Mîr Celadet Bedirxan, Dr. Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî, Cegerxwîn, M. Ehmed Botî, Mele Ebilhadî, Mele Ehmedê Namî....

Seydayê Tîrêj jî, ji heval û hogirên van kesan bû û bi wan re ketiye kar û barên xebat û berxwedanê de, di meydana ziman, tore û rewşenbîriya kurdî de xebitiye; bi teybetî nivîsandina bi zimanê kurdî, û ji wî heyamê dûr ve berhemên xwe di kovarên Bedirxaniyan de belavkirine, ew kovar û rojnameyên ku di nebera salên (1932-1946)an de li Şamê û Bêrûtê çap û belavdibûn, wek a Hawar û Ronahî li Şamê di bin berpirsiyariya Mîr Celadet Bedirxan de "Roja Nû û Stêr" li Bêrûtê di bin berpirsiyariya Dr. Kamîran Bedirxan de.

Ango: ji wê hingê de dan û standin û têkiliyên Seydayê Tîrêj bi rewşenbîr, welatparêz û kultura gelê kurd ve heye û di nav refên rewşenbîrê kurdan de xebat û bizav kirine. Hêjayî gotinê ye ku Seydayê Tîrêj di sala 1942'an de endamek bû ji endamên partiya "Xoybûn" li bajarê Amûdê. Wiha ji wê hingê de û ta roja îro pê-nûsa Tîrêj nerawestayê û her û her wê pê-nûsê, kul, xem û janên gelê kurd bi dewêta reş û şîn nivîsandiye. Hem jî pesnê gelê kurd, Newroz û sersala kurdan, çiya û newalên Kurdistanê daye.

Ji roja ku Seydayê Tîrêj, bîrewer bûye, di rewşa gelê xwe de ponijîye û xemên gelê kurd xwarine.

Ji bo xwewndevanên kovara "Nûdem" min ev hevpeyvîn pê re

lidarxist. De ka werin gelî xwendevanan em mêzêkin bê çî di tûrikê Seydayê Tîrêj de maye!?


Konê Reş: *Seydayê Tîrêj, ji kerema xwe tu dikarî xwe ji xwendevanên kovara "Nûdem"ê re bidî naskirin?*

Tîrêj: Navê min Nayîfê kurê Heso ye, ez bi navê "Tîrêj" di nav kurdan de hatime naskirin, di sala 1923'an de, li gundê "Nicim" ji herêma

Qamişlo, li rojavayî Kurdistanê hatime vê dinya bi êş û jan û kêf û şahî. Niha ez li bajarê Heskê rûniştîme. Ez bavê çar xortan û pênc keçan im. Di warekî din de, ez di sala 1937'an de yek bûm ji endamên partiya "Xoybûn" û di wê hingê de Cegerxwîn jî weke min têde endam bû, Qedîrî Can mamostayê me herduwan bû, û ji wê hingê de ta roja, îro, min dest bi hûnandina helbestên kurdî kiriye, di destpêkê de alîkariya Cegerxwîn bi min re hebû, ji ber ku em herdu Mela bûn...

– *Seydayê Tîrêj, helbestên te, an berhemên te yên pêşîn di kîjan kovar û rojnameyên kurdî de belavbûne û kîjan salê..?*

– Sê-çar helbestên min di kovara "Roja Nû" de sala 1944'an de li Bêrûtê belavbûne, hingê ew cara pêşîn bû û ji wê hingê de bi berdewamî helbestên min di kovar û rojnameyên Kurdistanê de belavdibin, hem jî, hin bûne stran, Mihemed Şêxo pênc



Seydayê Tîrêj

helbestên min bi stranî gotine yek jê ev e:

"Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan...."

– *Gelo berhemên te di roja îro de– di kîjan kovar û rojnameyên kurdan de belavdibin, û çî pirtûkên te hene...?*

– Berhemên min, çî ji helbestan be, di piraniya kovar û rojnameyên Kurdistanê de belav dibin û bi teybetî yên Kurdistana Federe

wek: Xebat, Metîn, û yên Sûriyê, wek: Stêr, Gulistan, Roj, Gurzek Gul, Zanîn, Gelawêj û hwd.

Du dîwanên min çap û belavbûne, yek jê bi navê "Xelat" di sala 1984'an de û ya din bi navê "Zozan" di sala 1992'an de. Di roja îro de, dîwaneke min amadeye ji çapê re, hem jî pirtûkek zargotinî.

– *Reuşa weşanên kurdî li Sûriyê çawaye, û li gor dîtinên te kurd di kîjan warê edebî de pêş de ne û di kîjanî de jî paş de mane..?*

– Derketina weşanên kurdî li Sûriyê bi berdewamî ye, bi xêra xortên nûhatî weke te û xeyrî te, em gelekî spasiya wan dikin û pêşketinê ji wan re dixwazin.

Gotineke mîr Celadet Bedir-Xan hebû herdem digot:

"Kurd dibêjin; sal bi sal xwezî bi par" Lê di baweriya min de, îro ne wek heyama mîr Celadet Bedir-Xane, ez bawer im ku sala bê wê ji îsal xweştir û geştir be. Ez ne

bawerim ku em bi paşdene û zimanê min nagere ku ez wilo bêjim...

Di warê helbestan de em bêtir bi pêşde çûne û sedemên paşketina me di warê edebî yê mayî de, belûye ji ber perçekirina welatê me ye û qedexekirina zimanê me ye, ji wilo pêve ez tişteki din nabêjim...!

– *Seydayê Tîrêj, aloziyên ku tu di zimanê kurdî de dibînî çi ne?*

– Di bawerîya min de, alfabe ya me ya bingehîn ya ku mîr Celadet Bedîrxan danîye, em pê serbilind in û xebata xwe pê di-kin bê ku em aloziyan bibînin. Li Kurdistanê Federe bi tîpên erebî dinivîsin. Tevî ku ez Mela me jî, lê ez bê dil nivîsandinên wan dixwînim, em bi hêvî ne ku ew jî bi tîpên latînî binivîsin. Şeweyên ku di nav koç û hozên kurdan de hene, di pêşerojan de wê ew şeweyên bibin yek, kengî ku Kurdistan azad bibe û Radyo, TV û dibistanên me kurdan çêbibin, ango aloziyên ziman yê ku di nav me de hene, girêdayî serxwebûn û azdiya Kurdistanê ne.

– *Gotin û daxwazên te ji xwendevanên "Nûdem"ê re?*

– Ez gelekî sipasiya xwediyê kovar "Nûdem"ê dikim ku bi vê xebata çak radibe, di ber zimanê xwe de, û ez bi hêvî me ku berdewam be li ser vî kar û barî, û ji xwendevanên kurd bi hêvî me ku li zimanê xwe guhdar bin, zarok û çîranên xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin. Pêşî û paşî gotina min ji we re li zimanê xwe miqatebin. ■

Ji ber derengweşandina vê nivîsê em ji Konê Reş û Seydayê Tîrêj lêborînekê dixwazin.

SENFONIYA ME

Dengê sêlikê ku me dinazîne
çi xoş dîseyînî, solîna senfoniye
li sekana keştiyê nenas
ji me
li sekaneke dûrtir
were yarê em bisexilînin, pêlên bi seh.

Strîna stekanê vala
semayê dilo
bila neşikînin stûnên sîvîngan
û
sosîna bi min dibişîrîn
tu bawer bike
mêjiyê min sincirî
de biseyre
mîna ji sehol
zeman jî bi hêdîka dihele.

lêêê
belê
esmera ji ciwan
tu
roşniya min a şetîrandî
dengê sêlikê ji bîr meke
ji kîjan senfoniye bû aya
yarê
de were biseridînin em.

Beyhanî Şahîn

Pisîk jî xewnan dibînin

Ç
I
R
O
K



Şahîne B. Soreklî

Dema çavên min di taxê de li wê ketin hestekî germ di dilê min de liviya û min xwazt ber bi wê biçim, lê min ji hevalan fedî kir û rêye xwe domand. Wê jî li min niherî, kenekî sivik li ser lêvên xwe xuya kir û bi lez ji me bi dûr ket. Min di cîh de min dizanibû ku ew jî meraq dike li gel min bi axife. Fersendeke wisa her roj nakeve dest, lê li bajarên Rojhelata Navîn merov

ne xwediyê kata xwe ye, qedera merov di dest yên din de ye. Min gellek meraq kir bi pê wê kevîm û hevaltiyekê li gel wê bi rêxim, yan bi kêmasî hevpeyvînekê li gel wê çêbikim, lê min, û bawer dikim wê jî, dizanibû ku bicîhkirina vê meraqê ne tiştekî pêkan bû. Wê şevê min wêneya wê hanî ber çavan, lê roja din dema ez ji bajêr vegeyriyam gund min ew ji bîr kir.

Li dû hefteyekê ez car din li bajarê mezin vegeyriyam û di wê taxê de meşiyam. Îcar tenê brayekî min li gel min bû. Min çend caran li dorhaliyên xwe seyr kir û carekê duduyan rawestiyam. Brayê min li min ket gumanê, xwazt tiştekî bibêje lê bêdeng ma. Hên min dixwazt tiştekî di derheqê pirsê wî ya

bêdeng de wînim ser zimên, min hew dît ya ez lê digeriya wê wa ye bîr bi me têye. Dema wê nêzikî li me kir rasterast li min niherî û çavên me bi hev û din re axiftin, lê ew li brayê min ket gumanê û min dît çawa çermê wê lerizî û da xwe ku bireve. Wê êvarê, wekî hemî êvaran, dostekî em vexwandin xwarinê. Siyaset, jiyana li hundir û derve, û jihevbelavbûna Yeketiya Sovyêtî bûn şorbe û ketin nav baberên xwarina li pêş me. Hindekên ku min ji rojên zarotiyê de dinasîn û ji mêj ve nedîtibûn behsa rojên hevaltiya di xwendegeha bajarokê me de kirin, hinên din merovine me ji mezînbûna wan mezintir kirin, û dema di dawiya êvarê de meyê dest pê kir rola xwe bilîze hevalek giriya, lome û gazinc ji jiyana îroyîn, ji veqeta hevalan û derbasbûna rojên ciwantiyê kirin.

Nêzikî nivê şevê em ji hev belav bûn û brayê min xwezî min bigihîne mala wî hevalê ku me di destpêka rojê de soz dabûyê, ez ê îşev li mala wan razên. Li dû bergerîne û danûstendineke deh deqeyan ew razî bû bihêle ku ez bi serê xwe, bi taksiyê, biçima mala hevêl.

Şofêrê taksiyê dest pê kir pirsên xwe bi barîne, wekî ku dixwazt çîroka jiyana min di nav bîst deqeyan de bibihîse; ne tenê bibihîse, lê herweha bîr û baweriya xwe jî di derheqê hindek pirsan de bide. Wek nîşe, min şaşî kir û jê re got ku jina min ne ji welêt e. Min şaştiyeke din kir û gotê, min ew nekiriye musulman. Şofêr ez neheq dîtîm û got, hîn ne dereng e, divêt ez vê şaşti-

ya xwe rêrast bikim. Dû re dest pê kir ji min re şîrove bike, çima û çawa. Li vir bêhna min teng bû û ez ji wî gellekî aciz bûm, lê min nexwazt diltezîna xwe ji wî re aşkere bikim. Min dizanibû li vê devera cîhanê axiftineke bi vê nolê divabû wek yeke dostanî bihata pejirandin lê salên li derve rola xwe dilfîztin û min dil nebû jiyana xwe ya şexsî li pêş kesekî ku min nedinasî deynim ser sifreya sor. Hema bêyî ez fersendê bidimê da ku axiftina xwe bi serî bike, min gotê, "ha li vir, spas." Wekî ku vecinîq, wî taksî ber bi rastê bada û da rawestandî. Min ji nêxê pêwîst bêtir pere danê, bexşandin tîka kir, ku min şora wî bi şêkir birrî, derî li dû xwe girt û bi rê ketim. Divabû ez bi kêmasî panzdeh deqeyên din bimeşim da ku bigihêim mala hevalê xwe. Min dikaribû taksîyeke din bigirta lê baştir dît ji xwe re piçekî bi serê xwe bimeşim. Hat bîra min ku di nav du hefteyên borîn de, ji roja ez gihîştîmî welêt û vir de, hên ez bi serê xwe nemame.

Hejmara otomobîlan di tax û kolanên bajêr de kêmtir bûbû, ba piçekî paqîş bû bû, û tevî ku zivistan bû jî ba honik bû û ev meşa bi tenê li keyfa min hat. Min ev beşê bajêr baş dinasî, ji rojên ciwantiya xwe de. Bi kêmasî hefteyê du-sê caran ez tê de bi şopa keçekê diketim, her ji dûr ve, bêyî ku çî caran li gel biaxifim. Dibistana min tê de dixwendî jî ji vir ne dûr bû, dibistana ku min û hevaline xwe tê de ji carekê bêtir li gel piştgirên Nasir şer kiribû. Sal çîqa zû derbas dibin!

Hê ez di nav wan rojan de wenda me, çavên min li cotek çavên birqonekî ketin. Nizanim çima, lê min di cîh de xwediya wan nas kir û dilê min dest pê kir bi lez lêxe. Ew bû ya ku ez berê li ser taxê du caran rastê hatibûm. Dema min nêzikî li wê kir, ew zivirî û di pêş min de meşiya. Çawa ku ez di rojên ciwantiya xwe de bi şopa keça biyanî diketim, wisa jî min nuha da dû ya li pêş xwe. Çiqa xweşik dimeşiya tilingiyê, wek wan keçên zirav yê wek modêl di kar de. Dema wê xwe li destê rastê bada ez di cîh de gihîştim mebasta wê û min dizanibû berê wê li ku ye. Carekê keça ez di rojên ciwantiya xwe de bi şopê diketim jî ew rêya girtibû, lê ne bi tenê, li gel diya xwe. Ew çûn û li baxçeyê bajêr dora saetekê daniştin. Min dizanibû keçikê bi diya xwe re gotiye û ew bi hev re derketine, bi hêviya ku ez li baxçeyê bajêr bi wan re biaxifim, lê min şerm kir û ji dest min nehat der nêzikî wan bibim. Ta roja îroj ez carine wê katê tînim bîra xwe û poşman dibim. Li dû wê rojê min ew keça nema dît. Da ku car din poşman nebim, min nexwazt vê fersendê ji dest berdim û li gel ku şev êdî şikestibû jî ez her li dû ya li pêş min di rê de meşiyam.

Di quncikakî tarî yê bêxçe de wê xwe ber bi çepê bada û di bin darekê de danişt. Ez jî li teniştê wê daniştim û min dest pê kir li gel biaxifim.

– Merheba. Tu çima li vê şûna tarî daniştî? Xweziya min bikaribûya rûyê te bidîta.

– Na, na, wisa baştir e. Piçek tarîti dikare

hindek caran bi sût be. Ronahiya pîrr çavan diêşîne.

– Li min biborîn. Wê rojê min gellekî dixwazt li gel te biaxifim, lê min nikaribû. Çiqa kêfxwş im ku em car din li hev rast hatin.

– Belê, ez jî kêfxwş im. Rojên îroj kesên bi zimanê me bizanibin hema hema nayên dîtin. Tu dixwazî li gel min hevpeyvînekê çêbikî. Ma ne wisa ye?

– Tu çawa dizanî?

– Ma te hay jê niye ku yên ji nijada me xwediyên zanistiyêke taybetî ne. Rojekê ji rojan em lawirên nêrxbilind bûn. Wek mînak, di dem û dewrana firewnên Misra kevnar de me cîhekî bilind hebû di ola wan de, em lawirên pîroz û muqeddes bûn. Ber dora şeş hezar sal me dostaniyek li gel merovan danî û li gel ku em goştxwarin jî me soz da em ê nema goştê merovan bixwin. Misriyên kevnar jî rêz ji vê biryara me re girtin. Li dû kevnemisriyan nişîna merovan em di kilîse û mizgeftan de wek nêçirvanên mişkan bi karhanîn. Îroj li vî welatî nêrx û rêz ji me re nemaye. Li vî bajarî rojê bi dehan ji me di bin lastîkên otomobîlan de dimirin û ji vê jiyana bi tenî azad dibin. Wek tu dibînî nema kes me di malan de xwedî dike. Divêt em xwe bi xwe xwedî bikin, di nav gemarê de razên û di nav zibîlgo da li xwarinê bigerin. Me ev qedera bêbext jî pejirandiye, lê dîsa jî me bi serê xwe nahêlin. Li vir didin dû me, li wir keviran davêjin me û tu dibêji ev ne bes e, zaroyên wan jî me dihingêvin. Rewş ji me re xirab

hatiye. Berî em têkevin nav merovan em xizmên pilingan bûn, serbilind, nêçirvan û netirs. Giriye li ser dem û dewranên raberdu bêt kelk e. Em dizanin li nik merovên vê dem û vê şûnê rêzgirtina ji tiştêkî re nemaye. Rêz tenê ji zêr û pereyan re maye. Jiyan li gel merovan em fêr gellek rê û sinçiyên nû kirin. Hindek ji me heta di warê vekirina sarincên malan û dizîna ji xwazringehan de jî êdî pispor in, lê jiyan ne hêsan e. Bi şev û roj em di tirsê de ne û di jiyane de tiştêkî ji tirsê xirabtir tune. Ez carine pisikên welatîna dîr di xewnên xwe de dibînim û xweziya xwe bi wan tînim, ew pisikên ku tîyên şampokirin, xwarinên xweş dixwin û di hembêza xwediyên xwe de xewnan dibînin, ew pisikên ku qanûnên wan welatan tadekirina li wan qedexe dikin.

– Ma pisik jî xewnan dibînin?

– Her tiştê dijî xewnan dibîne, lê xewnên hinan heye ku ji xewnên merovan der bin. Em pisik bi gellek tiştan dizanin, lê baş e ku haya merovan ji vê yekê nîne. Eger bizanibin, ew ê me jî ji bo amancên xwe yê xirab û baş bi kar bînin. Ew wisa bawer in ku em tenê di warê nêçirvaniya mişkan de pispor in. Wisa jî baştir e.

– Eger wisa be, tu ê bikaribî alîkariya min bikî?

– Hûn merov deqeyê bi qasî dora 400 peyv difikirin, lê dikarin tenê guhdare dora 125 peyvyan bikin, ev jî ji bo ewên guhdar dikin. Bi min ve diyar e ku tu gotinên min werdigerînê lê fêhm nakî.

– Te maf heye min di çavên xwe de biçûk bikî ji ber ku ez ji nijada merovan im û bixwazim, nexwazim, ez ê ketibim bin bandora raman û felsefeya kesan û civakan, lê ji min bawer bike ku amanca min ne êşandina dilê te, ne jî nêçirvaniya bersivên dermankirina nexweşiya ezotiyê min e. Ez baş tê digihêmu tu çî dibêjiye. Tu jî bi kere-ma xwe guh bide pirsên min. Min dil heye di derheqê çar kesan de ku ber çend salan li vî bajarî diman bizanibim. Dudu ji wan mamoste bûn. Herdu jî komonîst bûn û wê demê min ji komonîstan pirr hej dikir. Ez ji wan fêrî gellek tiştan bûm. Eger tu nexwazî, yan nikaribî, bersivan bidî dilê min li te namîne, ez tenê meraq dikim. Navê yekî K.N. bû, mamosteyê zimanê erebî bû di sinifa lîseyê de; navê yê din L.R. bû, mamosteyê Mentiqê bû. Gelo li ku bin?

– Herdu mamosteyên te jî dest ji jiyane berdan. Ez nedizanim, eger vegeyriyabin ser rûyê erdê yan na. Herduyên din kî ne?

– Yek ji wan keç e û ez navê wê nedizanim. Tenê dizanim ku min ji wê hej dikir, hezkirineke li gor wê demê. Di wan salan de, ji bo xatirê ku wê bibînim, min carine odeyek di otêla li kêleka mala wan de digirt. Di pencereya odeyê de min li wê diniherî û hin caran ez bi şopa wê diketim, lê min qe li gel wê neaxift. Heta rojekê ew û diya xwe hatin vî baxçeyî û min dîsa li gel wan neaxift. Heye ku sedem tirs be, heye ku şerm be, lê çî dibe jî, di dilê min de daxwazeke kûr ma ku wê rojekê bibînim, he-

ma ji dûr ve be jî. Di rojên îroj de heku Madonna di televizyonê de dibînim, ew tê bîra min. Wek Madonna xweşik bû; mebesta min, bi giyanê xwe wek wê bû. Nizanîm eger tu Madonna binasî.

– Tu çima dixwazî xewneke paşerojê, xewneke weqa xweşik û rengîn bikujî?

– Ez naxwazim bikujim, dixwazim vejînim. Meraq dikim hema bibînim.

– Xewnên rojên raberdu nayên vejandin. Tenê têyên kuştin. Eger ez te bibim nik Madonnaya te, ez ê bibim sedema kuştina vê xewna bedew. Baştir e keça bênav wek berê di serê te de bimîne. Ka navê kesê çarem bide min.

– Ew jî jin e. Wê xwe wek Sonya bi nav dikir û di kerxaneya bajêr de qehpe bû. Ez “qehpe” dibêjim, bi mebesta ku bi te fêhmîkirin bidim. Peyvên di zimanan de hindêk caran têrê nakin ku merov mebesta xwe li gor daxwaza dil diyar bike. Ez bi xwe xwebêja vê peyvê ji bo wê napejirînim ji ber ku di nav civakan de merovên ji yên wek wê nizimtir hene, lê ji ber ku di hindêk civakan de qehpetî tenê bi organên cinsî yên jinan ve girêdayî ye, hindêkên wek wê yên ku napejirînin çarenivîsa beşekî bedena xwe li gor daxwaza civakê, bi taybetî beşên nêr yê civakê, bipejirînin, wek “qehpe” têyên bi navkirin.

– Tu çima li Sonya dipirî?

– Min her dixwazt bêtir di derbareyê jiyana wê de bizanibim. Îroj ku ez çirokan dinivîsînim hewceya min bi serpêhatiya wê heye. Bi taybetî dixwazim bizanibim, çima

jineke wek wê, jineke xweşik û li gor civaka xwe pêşketî, jineke xwîngerm, meroveke ku dikaribû nizimti û bilindiya xusetê kesan ji hev derxe, yeke ku xwe fêrî xwendinê kirbû û ji berhemên baş hej dikir, ket wê meslekê. Dixwazim têbigihêim ka tawana wê çî bû ku xistibûn kerxaneya bajêr?

– Ax, tu çîqa merovekî xwedan daxwazên dijwar î. Tu çima ji min napirî ka çî bi gulên rengîn yên vî baxçeyî hat, ka çima hejmarên minareyan li vî bajarî bêtir û hejmarên xwendehan kêmtir dibin, ka çima dengên bulbulan nema têyên bihîstin, û hezar û yek pirsên din?! Tu pirsêkê dipirî ku dayîna bersîva wê heft roj û heft şevan dixwaze û me tenê sê yan çar saet ji katê hene. Tu çima dixwazî bi agir bilîzî û canê min bidî eşandin? De baş e. Ez ê bersîvê kurt bibirîm û ji te re çend gotinan di derheqê wê de bibêjim. Sonya keçeke ji malbateke belengaz bû. Ew panzdeh salin bû dema bavê wê ew li dij daxwaza wê ji xwendegêhê derxist, ji hevalên wê çirrand û da mîrekî ne li gor dilê wê. Roj li dû rojê giyanê wê çelengtir û rûyê wê şerintir bû, lê canê wê, ruhê wê, heku çû çilmisî. Ji ber ku weqa lihevhatî û xweşik bû mîrê wê derî li ser wê digirt da ku bedena wê tenê cavên wî şa bike. Ev segmêra heku çû dilreştir bû û dema li dû du salan çî zaroyên wan nebûn jina wî li pêş çavên wî bû ya tawanbar û stemkariya wî bêtir bû. Li hember wê neheqiyê Sonya biryar girt ew ê nema şeqên xwe ji wî xirabmêrî re ji hev veke, ew ê nema bihêle lepên wî yên qirêj giyanê wê

yê gulani bigemarine û ew ê rê nede diranen wî yê zer da ku memikên wê yê bedew bi gezên xwe mor bike. Wê dizanibû encama wê biryara wê dê ne yeke xêrê bûya, lê çî dibû bila biba, wê dê nema têkiliya cinsî ji wî re bikira behuşt û ji xwe re do-jeh. Birçîbûna wî ya cinsî dest pê kir piçek mentîqa li nik wî mayî jî ji serê wî rake. Heye ku tu bizanibî, yek ji sedemên herî grîng ya pirrbûna girrê û kêmbûna mentîqê li nik merovên van der û doran birçîbûna wan ya cinsî ye. Mêrê wê, ji ber ku nema dikaribû dîla xwe bike amanca organê xwe yê birçî, heku çû dîntir bû ta ku rojekê êrîş bir ser Sonya û xwazt bi darê zorê têkiliya cinsî li gel wê bike. Ew yekî pîsik û bêhêz bû. Tenê organê wî û simbêlên wî maf didanê ku Sonya ji xwe re bike dîl. Dema wê dît ku xelasî jê nabe wê kêra mitbaxê di hûrê wî re kir, organê wî birrî û simbêlên wî kurr kirin. Ma kî dikare têbigihê rewşa wê ya nefsi gihîştibû çî qonaxê ber ew tişte-kî wisa bike? Kî dikare?! Tenê jineke ku rewşeke wisa jîbe heye ku bikaribe, ne dadmendekî mêr ku bi xwe berzikbirçî be. Di çavên dadmendekî civakeke wisa de jina bêtawan dibe tawanbar û wisa jî bû. Dadmend biryar girt ku bila wê deh salan têxin girtîgehê û dû re têxin kerxaneya bajêr. Ew hevdeh salin ket girtîgehê û bîst û heft salin ket kerxaneyê. Dema kerxaneya bajêr hat girtin temenê wê dora 55 sal bûn. Wê li dû vî temenî nema dixwazt rêkeve nav civakê û bibe qehpe. Lewma jî xwe bi destê xwe kujt.

Du-sê deqeyan em herdu jî bêdeng man. Ji nişkan ve dengê axiftina merovan ket guhên min û min wisa texmîn kir ku kesine ber bi me têne. Min stuyê xwe ber bi paş zivirand û dît du kes ber bi me têne. Yekî ji wan pîlek vexist û da rûyê min. Dema min serê xwe car din ber bi pêş zivirand pisik nema li şûna xwe bû. Herdu kes polis bûn. Yekî ji wan nasnameya min xwazt û pirsî ez di dema berbangê de li bêxçe çî dikime. Min jî, hema di cîh de û bêyî çî tevdêr, gotê, "ez li xewnên wenda digerime."

Dema polis car din bi rê ketin êdî deng bi minareyan jî ket û tûterûta otomobîlan heku çû bilind bû. Ez rabûm ser xwe da ku biçim li çayaxaneyeke vekirî bigerim. Li nik min çî guman nema bûn ku ya min li gel diaxiftî Sonya bi xwe bû. Nizanim ka kengê riya min ê car din bi ser wî bajarî keve, lê baş dizanim ez ê nema wê li wir bibînim. Canê wê dê nema di giyanê jinan de vegere wê deverê, ne jî di bedena pisikan de. ■

J. J. Rousseau, 'Rewşa xwezayî' û azadî

L
Ê
K
O
L
Î
N



Felat Dilgeş

J. J. Rousseau, bi baweriya ku mirov beriya di rewşa civakî de bijîn, di rewşeke xwezayî de, bêyî ku tu têkilî û girêdanek wan bi hevdû re hebe, derdikeve rê û tesbîtek jiyana xwezayî dike. Rousseau bi tu awayî diyar nake ku ev jiyana xwezayî di kîjan merheleya dîrokê de hatiye jiyîn û ji bo vê yekê jî serî li tu îspat û belgeyan naxe. Bi tenê 'di demên gellek kevin' de jiyana merheleyek bi vî awayî

dipejirîne û rast dihesibîne. Li gor wî, ew kesên ku li ser hîmên civakê kola ne, hemûyan pêwistî dîtine ku bigihîjin rewşa xwezayî, lê tu kes jî negihîştîye heta wê derê.

Li gor baweriya Rousseau, di merheleya rewşa xwezayî de di navbera mirovan de azadî û wekhevîyek hebû. Xwezayiyê hemû giyandar wekhev dîtine û ew mirovên ku di vê demê de jiya ne, bi tenê pêwistiya xwarinekê, mêyekê (hevalekê) û bîhnvedanê dîtine. Tiştê ku jê tirsîyane êş kişandin û birçîbûn bûye. Mirovên vê demê yên ku xwe bi xwe têrî xwe di-kin û qîma xwe bi tiştên ku xweza dide wan tînin, tu tirs û şikeke wan a ji bo pêşerojê tune. Bi xwezaya (tebîeta) xwe re li

hevdû dikin, gellek dilgeş û bêşik in. Ev mirovên ku di rewşa xwezayî de dijîn, ji bo jiyânê pêwistiya wan bi çi hebe, ji ber xwe xwediyê wî ne. Ji bo mirovên ku di vê demê de dijîn tîrsa mirinê jî tune; "çimkî ewê heywan bi tu awayî nizanibe ku mirin çi ye. Hînbûna sawa mirinê, bidestxistina kara herî pêşîn e ku gava mirov ji rewşa heywanîyê dûr dikeve."

Rousseau bawerî pê tîne ku, ev mirovên ku bi hawirdora xwe re di nav aştî, azadî û dilgeşiyê de jiyane, kingê ku ji jiyana xwezayî qetiyane û derbasî jiyana civakî û hemdem bûne, gav bi gav kole bûne û azadiya xwe ya berê hunda kirine. Koletî û têkiliyên pêvegirêdanî, bi saya mulkîyeta taybetî xurt bûye û bi pêvajoyê re awayekî dezgehî sitandiyê. Rousseau, "Tiştê ku mirov medenî dike û dide hundakirin, li gor helbestvan zîv û zêr e; lê li gor filozof hesin û gerim e" dibêje û bi vî awayî di nav mirovan de peyderbûna newekheviyê bi mulkîyeta taybetî ve girê dide. Herçi ew mirovên li xwezayê, tazî, bi serê xwe, bê mal û bê cih dijîn; ji bilî seqetiyên xwezayî, rewşên zarûktî û pîrtiyê pê ve nizanin ku nexweşî jî çi ye. Nexweşiyên ku mirov lê rast tên û di canê mirov de peyder dibin, hemû jî piştî ji jiyana xwezayî derbasbûna jiyana civakî derketine.


Digel ku Rousseau ji bo mirovên rewşa xwezayî, jiyana tabloyek dilgeşiyê nîşan dide, ramanwêrên wek Thomas Hobbes, John Locke û Kant di derheqê jiyana xwezayî de xwediyê nêrînên cihê ne. Arîstotala-

sê ku gellek beriya van filozofan jiyaye, mirov ji bûyina xwe ve civakî dibîne û vê yekê bi tebieta mirov ve girê dide. Montesquie jî wek Arîstoteles ihtimal nade ku mirov di xwezayê de bi serê xwe jiyabin. Li gora wî, heke mirov ji hevdû reviyabin, hingê divê wê çaxê li ser sedemên vê yekê bihara kolan.

Gava ku Rousseau bingeha nêrînên xwe yên li ser jiyana xwezayî darîne, du filozofên ku bi wan re tê hemberî hevdû, Thomas Hobbes û John Locke ne. Ji van herdu filozofên ku li ser jiyana xwezayî xwedî nêrînên taybetî ne, tê dîtin ku John Locke piçekî bêtir nêzikî Rousseau ye.

Hobbes rewşa xwezayî demeke şer û tevlihev (kaos) dide naskirin. Di vê dema ku hemû kes bi hemû kesî re di şer de ye, cih ji xebatê re tûne. Daxwaza herî pêşî ya mirovê rewşa xwezayî, berî her tiştî hebûna xwe berdewamkirin û liserlinganmayin e. Ew ji bo parastina vê yekê dixebite û hemû kirinên wî vê daxwazê beyan dikin. Gava ku herkes, mayê ku ji destê wî bê lê bixebite ku ji nîmetên xwezayê îstifade bike, bixwaze nexwaze bi mirovên din re tê hemberî hev. Di vê rewşa ku herkes xwe xwediyê hemû tiştan dibîne de, bibê nebê mirov ji hevdû re dibin dijmin û rewşa "şerê herkesî ye li heber herkesî" derdikeve holê. Bi vê ramanê Hobbes digihije wê gotina xwe ya bi nav û deng: Mirov gurên mirov in (Homo hominî lûpûs).

Hobbes di xwezaya mirov de sê sedemên bingehîn ên şer dibîne. Ji vana yê ye-



J. J. Rousseau

kem, hemberî (reqabet); yê duwem, neew-
lehî(bêitibarî); yê sêwem jî şan û şerf e. Yê
yekem, mirovan ji bo karê (qezancê); yê
duwem ji bo ewlekariyê; yê sêwem ji bo

du faziletên herî mezin in. Ciyê ku lê hêze-
ke giştî tune li qanûnan nayê gerîn. Ciyê
ku lê qanûn tune bêdaletî jî tune.

Mirovê ku di jiyana xwezayî de dijî, nax-

nav û deng dike
nav tekoşînê. Li
gor Hobbes, di vê
dema ku herkes bi
her kesî re di şer
de ye, ne di der-
heqê rûyê erdê de
agahî, ne hesabê
wextê, ne huner,
ne pêşveçûn û ne jî
civat heye. Jiyana
mirov bi serê xwe,
hejar, xerab, hovî
û kurt e. Di vê de-
ma ku herkes bi
herkesî re di şer de
ye, tu tişt ne li dijî
edaletê ye. Çimkî
li holê rastî û çew-
rî, ciyê mefûmên
edalet û bêdaleti-
yê tune. Bi ya
Hobbes, her a hê-
zeke giştî ya ku he-
mû mirovan di bin
tirsê de bigire, an-
go dewlet tune be,
ewê şerê herkesî yê
bi herkesî re ber-
dewam be. Şiddet
û hîle di vî şerî de

waze mal û serketina xwe bi kesên din re parî bike. Ji ber vê yekê Hobbes xesareke mezin a jiyana xwezayî jî, nebûna derfeta bi xwe ve hatin û pêşveçûnê dibîne. Tu kes tiştê ku îro bi dest dixê nikare ji bo sibê biparêze û ji ber ku ewlekariyek wî ya bi vî awayî tune, nakeve nav hewldaneke zêde. Ev rewşa bêewlekarî, rê li ber bazirganî û dewlemendiyê digire û ji pêşveçûna zanistî, hunerî û edebî re dibe asteng.

Hobbes meyla bingehîn a ku mirov ji rewşa xwezayî ber bi jiyana civakî dikişîne, wê tirs û bêewlehiya ku mirov tê de ne nîşan dide. Ji bo ku mirov ji jiyana xwezayî ya ku rewşa şerekî berdewamî ye azad bibe û bigîhîje aşî û ewlekariyê, bi mirovên din re peymanê çêdike û mafên xwe dispêre otorîteya hêzdar, ango Leviathan û tenê bi vî awayî dikare bigîhîje aşî û aramiyê.

Jonh Locke ji hebûna qanûneke xwezayî derdikeve rê û li ser vê bingehê nêrînên xwe yên li ser jiyana xwezayî ava dike. Em dikarin bibêjin ku Locke, di tesbîtên xwe yên li ser jiyana xwezayî de, hin nêrînên Aristoteles ên ku di berhema xwe ya bi navê *Etîka Nikomakhos* de tîne ziman, dike destpêk. Locke, ramana Aristoteles a, "tiştê ku xwezayî ye li her cihî xwedî eynî hêzê ye û li gor qenaetê naguhire" fireh dike û lê dixebite ku bi delîlan nîşan bide.

Bi vî awayî Locke digîhîje encama qanûnek xwezayî ya getdûnî ya ku li her derê derbas dibe. Li gor Locke, ew yên ku qanûnên dewletên xwe yên li her cihî bi aşkerayî daliqandî ne û ji raya gîştî rê vekirî ne niza-

nin û meraq nakin hîn bibin, ewê bi qanûnên xwezayî yên sir û vaşartî jî nizanibin. Bi tenê ew mirovên ku pirr jîr in û qabiliyeta wan a fêmkirinê zêde ye dikarin qanûnên xwezayiyê binasin. Gava ku ev mirovên jîr li ser çibûn û çî nebûna qanûna xwezayiyê negihîjin encamekê jî, ew nayê wê maneyê ku qanûneke xwezayî tune. Li gor vê qanûna ku tu kes ne xwediyê azadiyek herheyî ye, hin qedexeyên ku mirov girê didin hene. Dizî, kuştin û bi darê zorê û bi hîleyê dest danîna ser mülkiyeta yekî sûc e; herweha kuştina mirovekî jî. Li gor Locke, "em carna wekî qanûnê nakin, lê em tu car nikarin li hember qanûnê rawestin. Di vê jiyane de carna rawestin û bîhnvedan derdest e, lê ji kerî veqetîn ne mumkun e."

Li gor Locke, dema jiyana xwezayî demeke wusa ye ku di navbera mirovan de azadî û wekhevî bi hemû awayî serwer e. Mirov ji aqilê xwe pê ve tu hêzeke ku wî idare dike nanase. Wekî Hobbes difikire rewşa xwezayî, ne demeke wusa ye ku mirov berdewamî bi hev re di şer de ne.

Digel Locke rewşa xwezayî rewşeke wekhevîyê dibîne jî, ew diyar dike mirovên ku di vê demê de dijîtin ne dilgeş in. Tu şik jê tune ye ku xwezayiyê qanûn dane me, lê nikare bê gotin van qanûnan ji bo mirovan dilgeşiyek bi îmtiyaz pêk anîye û ji jiyana belengaz re bûne asteng.

Locke, diyar dike ku xwezayiyê mirov wek girtiyekî di girtîgehê de rapêçaye, li vir qanûn û ferman têr dikin, lê belê aramî û aşî têr nake. Bi ya wî kêmasiya herî mezin

a rewşa xwezayî, yekî ku lê neheqî hatiye kirin, hêza cezakirina kesê ku li wî neheqî kiriye bi xwe re dîtin e. Kêmasiyek rewşa xwezayî ya din jî, bi qasî ku têr dike, di ewlekariyê de nebûna mafê kesan ê mulkiyetê ye. Riya ji vê tevliheviya ku rewşa xwezayî afirandiye rizgarbûn û ewlekariyê pêk anî-nê, derbasbûna jiyana civakî ye ku ji ya xwezayî çêtir e. Di vê pergala nû ya ku tê avakirin de êdî qanûnek ku herkes li ber serî datîne, hêza polis û dadgerên alînegir he-ne.

Ramanwêrê Alman Îmmanuel Kant jî bi nêrînek nêzikî Hobbes rewşa xwezayî rewşeke şer dibîne. Li gora wî, têkiliya navbera mirovên ku di rewşa xwezayî de bi hev re dijîn, ne rewşeke aştiyê, hergav nehatibe îlankirin jî, rewşeke şer a wusa ye ku her-dem ji teqînê re amade ye. Ji bo mirovên ku bi hev re û li rû hev dijîn, gava qanûnên hevpar ên ku wan girê didin tunebin, hingê mirov ji bo hev xeter in. Heke ev xeter lebatî (de facto) nebe jî ew rewşa bêqanûni-yê ya ku tê de tê jiyîn ji bo bêewlehiyê têr dike. Li gor Kant pêwistî û sedemek taybetî yê şer tune û reha (koka) şer digîhije xwezaiya mirov. Şer, ji bo xwezaiyê riya bi tenê ye ku mirov pê dîşîne derên cihê yên dinyayê û li wan deran cîwar dike. Xwezayî bi vê yekê digîhije armanca xwe û şer mirov li îklîmên cihê yên dinyayê dide cîwarkirin. Çimkî şer, wastiyek cîwarkirina mirovan e.

Îbnî Xaldûn (1334-1406), ku bi sedan salî beriya Hobbes, Locke, Roûsseaû û Kant

jiyaye tesbîtek rewşa xweyî nake. Li gor ba-weriya wî, di nebaşî û serî li şiddetê dayina mirovan a li hember hevdû de, ew hêza heywanî ya ku bi mirov re heye mirov di-zixtîne. Bi ya wî, ji ber ku mirov ji bûyina xwe ve xwedî aqil û hêza muhakemê ne, ji xerabiyê zêdetir meyla wan li ser qencîkiri-nê ye. Îbnî Xaldûn, civakîbûna mirovan, bi siyasetê re rabûn û avakirina wan a dewle-tê, bi meyla qencîkirinê wan ve girê dide. Civakîbûn, bi siyasetê re bilîbûn û avakiri-na dewletê encamek jiyana civakî ye.

Li gor diyarkirina Roûsseaû, mirovên ku di rewşa xwezayî û hovî de wekhev in, bi saya têgihîştin (fêmdarî) û bi wextê re bi xwe ve hatina mirov, hêdî hêdî ber bi ne-wekheviyê ve diçin. Newekhevî bi demên cihê û şoreşan ve pêşve çûye heta roja me hatiye. Bi ya wê di pêvajoya dîrokî de, çê-bûna qanûn û mafê milkiyekê merheleya yekem a newekheviyê; çêbûna wezîfeyên meqamên jorîn merheleya duwemîn; rewşeke kêfî sitandina wezîfeya ku meşrû ye û bi qanûnan ve girêdayî ye, merheleya dawî ya newekheviyê dinimîne. Gava ew yên ku civatê îdare dikin, ji qanûnên ku bi peyma-nan çêbûne dûr bikevin û li gor kêfa xwe bilivin, hingê meşrûbûna xwe hunda dikin û mafê hemwelatîyan çêdibe ku ji bo jiyana û azadiya xwe wan bînin xwarê.

Prensîbê Roûsseau yê azadiyê, ji bûyinê ve azad û wekhevbûna hemû kesan e. Li gor wî mirov azad tînin dinyayê. Azadiya wan ya wan e; mafê tu kesî nîne ku wê ji wan bistîne û bi kar bîne. Bavek, heta de-

ma ku zarûkên wî başiyê ji xerabiyê cihê bikin, ji bo parastin û rihetiya wan dikare qayîdeyan deyne; lê belê nikare bê qeyd û şert û bêyî ku bi şûn de bizivirin wan bide hinekên din. Karek weha çawa ku li dijî xwezayê ye, wusa jî mafên bawîtiyê derbas dike. Dev ji azadiyê nayê berdan û azadî dewr nabe; dev ji azadiyê berdan dev ji mirovatiyê berdan e.

Platon bawerî pê dianî ku xwezayiyê ji bûyinê ve hin kesan mirovê dewletê û filozof, hin kesan jî wusa çêkiriye ku tiştên tên gotin, dikin. Bi vî awayî wî di nav mirovan de newekheviyek didît. Ew yên ku ji bûyinê ve xerat û goşkar (pêlavçêkir) bûn, bi tu awayî bi ew yên ku ji bûyinê ve filozof û mirovên dewletê dihatin dinê re wekhev nebûn. Arîstoteles ji Platon wêdetir diçû û ji wan yên ku bi kolerî dihatin dinyayê qal diikir. Bi ya wî hin kesên ji neteweyên hov kole dihatin dinyayê û Helenî ji bûyinê ve karbidestên wan bûn. Arîstoteles, "Ew kole ne. Em jî gelek in ku azad hatiye dinyayê" digot. Rousseau, pêvegirêdan û sipargeha vê ramanê, berhemek milkiyeta taybetî didît û bawerî pê dianî ku hemû kes azad û efendiyê xwe bi xwe tê dinyayê. Tu kes, bêyî daxwaza yê din nikare wî têxe bin emir û fermanan. "Gava ku mirov bibêje kurê koleyêkî bi kole tê dinyayê, hingê mirov dibêje ku ew bi mirovî nehatiye dinyayê."

Li gor Rousseau, meylaa hêza bûyeran li ser jîholêrakirina wekheviyê ye. Lê belê Rousseau, wekheviyek bi denge ya ku "bipîvani" bi nav dike diparêze. Mezinbûna

ferqa navbera serwetan û newekheviya serwetan ya zêde, bi hizûra civakî re naçe rû hev. "Ji bo ku rewşa civakî bi kêrî mirovan bê, divê hin tiştên hemû kesî hebin û ji pêwistiya zêdetir tiştê tu kesî tunebe." Divê tu hemwelatiyek, ne biqasî ku yên din biki-re dewlemend û ne jî bi qasî ku xwe bifiroşe hejar be. Em dikarin bibêjin ku Rousseau alîgirê azadiyek lîberal e.

John Locke, di rewşa ku mafê azadî û milkiyetê kesan bikeve xeterê de, ji bo ku kes van mafên xwe biparêzin, li hember hêza serwer (dewletê) serhildana wan, wek mafekî bingehîn diparêze. Bi ya Rousseau jî gava ku mafê azadî û jiyana kesen li pêş îhlalê (pêlêkirinê) bimîne, êdî hêza serwer meşrûbûna xwe hunda dike û peyman betal dibe. Di vê rewşê de mafê kesan heye ku peymanê rakin û bizivirin rewşa xwezayî ya beriya civakê. Locke û Rousseau, hêza serwer û dewletê di ser maf û azadiyên hemwelatiyan re nabînin; lê belê Machiavelî û Hobbes hergav alîgirên mutlaqiyeta hêza serwer in û ji bo wan mafdariya hêza serwer nayê munaqêşekirin.

Ji bo Rousseau dev ji azadiyê berdan, bi afirîn û xwezaya mirov re naçe rû hev. Azadî ji daxwaza mirov cihêkirin, di kirinan (jiyanê) de, bi cihêkirina ramana exlaqî re yek e. Azadiya xwe dewrêkirin û bêbergîdan bi hinekên din ve girêdan, bi mantixê re jî naçe rû hev. ■

Ev nivîs "destpêka" teza Felat Dilgeç ya mastirê ye. Nivîskar niha di beşê Têkiliyên Navnetewî (Internationel relations) de xebata xwe ya doktorayê berdewam dike.

Martin Luther King JR.

(1929-1968)



Mihemed Dehsîwar

Bi hêvî bû; hêviyên azadî, rizgarî û wekheviyê. Xewnên wî, xeyalên wî ew dibirin deşt û çiyayên aştî û mirovperweriyê. "I have a dream" (Xeyalên min hene) digot; "xeyalên min hene, ez dibînim ku gel rabûye û ber bi azadiyê û wekheviyê, ber bi cîhaneke têr û tijî, cîhaneke xweş, cîhaneke ku herkes -çi reş, çi sipî- tê de weke hev dijîn ve dimeşe" digot. Di xeyalên wî de, ne ji bindestî û

koletiyê re, ne jî ji xwînmişî û şerpezetiyê re cîh tune bû. Ew bi hêz, bi bîr û bawerî bi ser koledaran ve, bi ser şermezarî û gellaciyê ve meşiya. Tu hêz û qewet, heps û kuştin ew ji riya wî nedan vegerandin.

Wî carekê xistibû serê xwe, diviya ku sîstem biguhiriya; dê ev sîstema ku heramiyên bêbext lê cirîtan diavêtin, ev sîstema sîtemkarî û zordestiyê cîhê xwe ji wekhevî, biratî û aştiyê re berdana. Dê tevaya gelan di cîhaneke xweş de, di cîhaneke têr û tijî de û mîna bira bijiyana.

Wiha difikirî Martin Luther King jr. Nakokiyên civakî, bindestî û kiryarên nîjadperestiyê, wî zêde di bin tesîra xwe de

hiştibûn. Martînê biçûk, hîn di zarokiya xwe de ji bavê xwe fêrî dîroka gelê xwe bûbû. Tade û zordestiyên ku li ser civakê hatibûn kirin û hîn jî dihatin berdewamkirin, wî ji xewnên şevan şiyar dikirin.

Koledarî, piştî destpêka çerxa koletiyê dest pê kiribû û demeke dûr û dirêj dom kiribû. Koledarî li her deverên cîhanê bi şeklên cuda meşiyabû û di civakê de birî-nên kûr vekiribû. Lê li Amerîkayê ev rewş bi şeklekî hîn ferehtir û berbiçavtir xwe eşkere kiribû. Li hinek deverên cîhanê kole-yên ji rengên cuda jî hebûn; lê li Amerîka-yê kole reş bûn û ji Afrîkayê bi zorê hatibûn anîn. Gundiyên afrîkî ji gund û malbatên xwe bi zorê hatibûn qetandin û tevî zencîran bi keştiyan ji ax û azadiya xwe, ji hebûna xwe hatibûn bidûrxistin û li bazarên taciriyê mîna malekî erzan hatibûn firotin.

Kirîn û firotina reşikan, ta salên 1860-an jî weke qanûnî dom kiribû. Lê di vê demê de li ser van zagonan nîqaşên mezin çêbûbûn û di civakê de nakokiyên mezin derxistibûn. Gelê Amerîkayê êdî ji wê rewşê, ji kirîn û firotina mirovan û her wiha ji nehe-qiyên ku li reşikan dibû, ne razî bû. Şerê navxweyî (The Civil War) di sala 1860-an de, di navbera Bakur û Başûr de dest pê kiribû û sê sal şûnde, di sala 1863-an de bi dawî hatibû.

Serokkomarê Bakur Abraham Lincoln, li dijî koledariyê bû û di vî şerî de bi ser ketibû. Di hîlbijartinên piştî şer de weke serokkomar hatibû hîlbijartin û zagonên koletî û

koledariyê qedexe kiribû. Lincoln di sala 1865-an de hatibû kuştin.

Reşikên kole êdî azad bûn lê bê ax û milk bûn. Piştî şer, rewşa welêt xweş bûbû û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pirr dewlemend û bi hêz bûbû. Amerîka êdî ji hêla aborî ve roj bi roj cîhê Brîtanîyaya mezin digirt. Gelê amerîkî her roj bêtir maldar bûbû û rewşa gel xweştir bûbû; lê reşikên ku hê nû ji koletiyê rizgar bûbûn, ne xwe-diyê mal û milk bûn. Li der-dorên bajarên, deverên bê-kar û feqîr, jiyaneke bi xizanî derbas dikirin. Sed sal piştî azadiyê jî rewşa wan î aborî hîn zêde baştir nebûbû.

Her çiqas azad bûn jî dîsa mîna sinifeke duyem jiyana wan berdewam dikir. Bi çavên biçûk dihatin mêzekirin û bi karên herî kêr û xerab ên ku kes pê qayil nedibû ve mijûl dibûn. Di destpêkê de çûyina xwendegehan qedexe bû, lê piştî ku serbest bû jî tenê dikaribûn li yê ku bi taybetî ji wan re hatibûn vekirin bixwendina. Xwaringehên wan, dibistanên wan, cîhên rabûn û rûniştina wan cuda bûn û ew nikaribûn biçûna cîhên ku mirovên sipî li diman û dirûniştin.

Reşikên ku bi awayekî xwe gihîştandibûn başûr û li dibistanan xwendibûn jî, dîsa di çavên piraniyan de "negroes" bûn. Lê li Bakur rewş pirr xerabtir bû. Rewşa reşikan ne ji awayê aborî û ne jî ji awayê jiyaneê ve baştir nebûbû. Zagonên ku piştî şerê navxweyî hatibûn derxistin, rê bi her awayî -ji awayên civakî û aborî ve- li pêşiya pêşdeçûna reşikan girtibû.



Martin Luther King

Çaxê dengbêjê bi nav û deng Paul Robson -ku Cegerxwîn li ser wî şîr nivisandiye û Şivan Perwer jî ew kiriye helbest- diçe Başûr ji bo ku konser bide, li tu otêlan cîh nadinê. Tevî ku reng-spiyên zengîn dixwestin bi pereyên mezin bilêtên wî bikirin

û ew guhdarî bikin jî, dîsa jî kesekî nedixwest li restaurantekê li kêleka wî rûnê.

Zagonên "Jîm Krow" ku piştî şerê navxweyî hatibûn lidarxistin û reş û sipiyan bi her awayî ji hev qetandibûn; vargonên trênan, odeyên rûniştinê, termînalên trênan û

otobusan, sînama û dibistanan, nexweşxane, dêr û xwaringehan ji hev cuda bûn. Bi hev re sohbet kirin, bi hev re mayîn û rûniştin û her wiha bi destên hev girtin tabû bû. Reşik her tim bi çavên xerab, teral û nepêbawer dihatin dîtîn û bi çavekî biçûkdîtî dihatin heqaretkirin.

Tevî vê jî yên ku ji rewşê ne razî bûn, spiyên rasîst bûn. Li gorî wan azadkirina reşikan şaş bû. Lewra jî piştî şerê navxweyî û zagonên nû, ji hêla nîjadperestên sipî ve rêxistina KKK (Ku Klux Klan) hat damezrandin. Ev rêxistin jî mîna rêxistinên nîjadperest ên çaralîyê cihanê bi mezinbûn, çêtirbûn û qewîbûna neteweyê xwe dipezinîn û gelên din bi taybetî jî reşikan biçûk dihesibandin. Li gorî wan reşik hîn jî kole bûn û cîhê wan jî ji yên reng-spiyan cuda bû. Ger reşikekî bi yekî sipî re biketina sohberê, bi destê yekî sipî bigirta yan jî li hember wî derketina, lêdana yê reşik hetta kuştina wî jî serbest bû û ji bo vê kiryarê jî tu kesên sipî nedahatin mahkemekirin. Rêxistina nîjadperest KKK heta niha bi dehhezaran reşik qetil kirine û vê terora xwe hîn jî didomînin.

Lê li kur dibe bira bibe tade, zilm û zorzarî bi yek teherî berdewam nake. Nakokiyên wisan, di nav civakê de dijîti û reaksiyonên mezin derdixin holê. Zilm û zordestî, bê şik bi xwe re tekoşîn û berxwedanê jî diweliidîne.

Li Amerîkayê jî ev rewş bi vî awayî meşiya. Li gelek cîhên cuda kes û civakên ji hev dûr li dijî van zagon û neheqiyên bingehîn

derketin û di vê rê de bi sedan, bi hezaran mirovên qenc û hêja qurban dan. Li gelek cîhên cuda serkeftinên biçûk bi dest xistin. Lê ev gavên han gelek biçûk bûn û ji wan re rêxistineke bi hêz û serokekî ku karibe ew li hev bicivînin pêwîst bû. Tenê azadiya zagonên li ser kaxêz têr nedikir; pêwîst bû ku ev têkeve jiyane jî. Lê ji wê jî girîngtir diviyabû ku bibûna xwedî ax û mal, bibûna xwedî jiyaneke têr û tijî.

Di civaka reşikên Amerîkayê de gelek serokên reşik ku dixwestin reşikan ji bindestiyê rizgar bikin derketine. Pirraniya wan hêviyê di şerê çekdariyê de didîtîn û bi vî awayî dixwestin gelê xwe rizgar bikin. Ev dîtîn û bawerî di nav serok û rêxistinên wan de dubendiyên mezin derxistin û tekoşîna wan î azadî û wekhevîyê bêtir dirêj kir. Kesên mîna Malcolm X ku bi dehhezaran reşik xistibû bin tesîra xwe, ta çend sal berî kuştina xwe jî di van dîtinan de bû.

Lê Martîn Luther Kîng Jr ji destpêkê ve li dijî şerê çekdarî û şiddetê bû. Li gorî baweriya wî, gavekî wiha xetereke mezin bû û dikaribû bibûna sedemê bidawîhatina reşikan. Ji xwe dewletê û rêxistinên nîjadperest jî ji wan gavekî wiha dipa. Ji bilî vê jî şiddetê dikaribû li ser tekoşîna wan a ji bo azadî û wekhevîyê tesîrên xerab bikira. Lewra jî Kîng û hevalên xwe di salên 1950 û 60-an de gelê reşik seferberî meş û civînan dijî şer kirin. Bi milyonan mirov beşdarî meşên wekhevî û azadiyê bûn; zilm û zordariyê bi metodên bê-şiddet protesto kirin. Tekoşîna wî jî mîna tekoşîna Mahatma Gandhî li ça-

raliyê cîhanê bela bû û mesajên hêja da gelên bindest.

Atlanta, cîhê bav û kalan

Martîn di 15-yê çîleya 1929-an de li Atlanta-yê, bakurê Amerîkayê hat dinê. Bavê wî Martînê mezin rahibê dêrê bû û di nav reşikan de mirovekî bi rûmat bû. Diya wî Deliya jî li cem maleke maldar karê paqijiyê dikir. Di jiyana reşikên bindest de dêr roleke girîng dileyize. Dêr ji wan re bûye cîhê şîn û şahiyê, cîhê civîn û evîna biratî û wekheviyê. Di nav dêrê de stranên şahî, evînî û olî ji hêla grûbên mûsikî û beşdarên civatê ve bi hesreta azadî û wekheviyê tên pêşkêşkirin. Reşikên azad (!) bi van stranên ku hê di dema koletiyê de ji hêla bav û kalan ve, bi armanca sebir û semaxê, bi hesreta azadî û wekheviyê hatibûn gotin, dîrokê û toreyên xwe didan berdeyamkirin.

Martînê biçûk jî mîna pîrrianiya zarokên dema xwe di nav vê civatê de mezin bû; stranên azadî, wekhevî û aştiyê, wa'izên denbêjû gotinxweş guhdar kir. Hîn di zarokiya xwe de ji ber tesîra deng û gotinên wan î xweş, dixwest bibe wa'izekî baş. Nîjadperestî hîn zarokekî biçûk bû, ew di bin tesîra xwe de hiştibû. Malbatên zarokên hevalên wî yên sipî, hîn di zarokiya wan de pêwendiyên wan qedexe kiribûn. Martîn bê sûc bê sebeb ji hevalên xwe hatibû qetandin û pê gelek êşiya bû. Hevalên wî yên ku timî bi hev re bi kêfxweşî dileyîstin, li ser daxwaza dêûbavên xwe, xwe ji reşikan dûr dikirin û hê ji zarokiya xwe ve fêrî fer-

qa (!) xwe û reşikan dibûn.

Martînê ku ji bavê xwe fêrî baweriya wekheviyê bûbû, di zarokiya xwe de li başûrê welêt ferqa nav reşik û spiyan dîtibû û kiryarên nîjadperest jiyabû. Wî bi çavên xwe didît û dijiya ku tûwaletên sipî û reşikan ji hev cuda bûn; dît ku çawa li ser camekanên xwaringeh, qehwexane û sînemayan lewhayên "tenê ji do spiyan" hatibûn daleqandin. Çûyina wan î cîhên spiyan ên mîna pirtûlxane, park, dibistan û hwd qedexe bû. Her wiha cîhên rûniştina wan jî ji hev cuda bûn.

Ew sîstema ku di her gav û deqîkeyê de "biçûkbûna" wî, "kêmbûna" wî û netêrbûna wî dianî ber çavên wî û bi her awayî bala wî dikişand, tesîreke mezin li ser wî kiribû. Ji dervayî îmkanan bû ku jiyaneke wisa bi êş û bi elem wî û zarokên dema wî di bin tesîra xwe de nehiştina. Lê tesîrên êş û elemê jê re bûn bazinên berxwedanê, mirovperweriyê û baweriyeke bi hêz. Ne di zarokiya xwe de, ne jî di xortaniya xwe de ji zilm û zordariyê re serî xwar nekir. Hinek jî bi tesîra dêûbavê xwe, hîn di zarokiya xwe de biryara berxwedan û tekoşînê dabû. Dê ew jî mîna bavê xwe bibûna rahibekî wa'iz û li hember zilm û zoriyê, ji bo azadî û wekheviya gelê xwe tekoşîn bida. Wisa xistibû serê xwe.

Bavê wî rahib Kîng, ne tenê wa'izekî çê û zana bû, ew her wiha di karê taciriyê de jî gelek jîr û bi serketî bû. Lewra jî ji hêla aborî ve, rewşa malbata wî gelek xweş bû. Bê tirs bû û zilm û ji zordariyê re serî xwar

nedikir. Wî baş dizanibû bê nîjadperest ji serkeftin û pêşdeçûna reşikan çiqas nerihet dibûn.

Pirraniya civaka serdest, reşikan ji civakê nedihesibandin û di her gavî de gotin û kiryarên bi heqaret li wan dikirin. Gotineke biçûkxistin û heqaretê jî "boy" e ku ji mezin û zarokan tev re tê bikaranîn. Rojêkê polis Martîn û bavê wî dide sekinandin û jê re "lawiko, ka cizdanê xwe yî ajotinê nîşanî min bide" gotibû. Bav bi tiliya xwe Martînê kurê xwe nîşanî polis dabû û "tu vî zarokê han dibînî? Ew lawik e, ez zilam im" bersiv dabû.

Martîn ji vê bêxofiya bavê xwe re heyran mabû. Kêm kesan diwêrbû ji polîsekî re bersivêke wiha bida. Di gelek civîn û axaftinên bavê xwe de dîtibû ku bavê wî li hember zilm û sitemkariyê çî difikire û jê fêrî gelek tiştan bûbû. Dê Martîn van gotinên bavê xwe qet jibîr nekira:

"Qet firq nake ku dê ez di vê sîstemê de çend salan bijîm, lê ez wê tucarî qebûl nakim û ta mirina xwe jî li dijî wê şer bikim!"

Di nav xire-cir û teşqeleyan de Martîn jî hêdî hêdî mezin dibe. Di 15 saliya xwe de li Înstîtuya Morehousê (Morehouse College) sê sal berî temenê xwe dest bi xwendinê kir. Xwendegeha wî, di nav ên reşikan de yek ji yên herî baştirîn bû. Li cihekî wiha xwendin ji bo reşikekî, serbilindahiyêke mezin bû.

Bavê wî dixwest ku kurê wî jî di riya bavê xwe de bimeşe û bibe rahib. Lê Martîn

dixwest bibe doktor an jî ewûqat; bi vî awayî dê bêtir alîkariya gelê xwe bikira. Midûrê xwendegehê ku ew bi xwe jî rahib bû, di dersên xwe de cihekî girîng dida dêrê û li gorî wî pêwîst bû ku dêr, di civakê de roleke girantir bilîze. Zanebûn û axaftinên wî, tesîreke mezin li ser Martîn kirin û fikrên wî dan guhartin. Êdî hatibû wê baweriyê ku rahibekî baş û zana, dikaribû ji sed doktor û ewûqatan bêtir feyde bide civakê.

Çaxê vê fikra xwe pêşkêşî bavê xwe kir, bavê wî pê gelek kêfxweş bû; hima li dêra xwe cîh da kurê xwe. Martîn di 17 saliya xwe de, cara yekem di dêra bavê xwe de, dest bi karê rahibiyê kir û ji civakê re axaftin kir. Wî axaftina xwe bi serfirazî pêk anî û pişt re li dêrê bû cîgirê bavê xwe. Lê ji hêla din ve pêwîst bû ku Martîn xwendina xwe bidomîne. Lewra jî qeyda xwe li Pennsylvania, li xwendegeha Crozer Seminaryyê çêkir. Martîn hem li dibistanê dixwend û hem jî di wextê xwe yî vala de li ser teolojî û filosofiyê lêkolîn dikir û di van babetan de berhemên girîng dixwend.

Filosofê mezin Henry Thoreau ku bi salan li hember koledariyê tekoşîn dabû û ji bo bidawîna wê berhemên hêja amade kiribû, li ser Martînê ciwan tesîreke mezin kir. Ji ber dewletê rê dida koletiyê, Henry Thoreau weke protesto, zikatê nedabû dewletê û ji ber vî sedemê jî ketibû zindanan.

Lê yê ku bi giranî li ser wî tesîr kir û di tekoşîna gelê reşik de da fikirindin Mahar-

ma Gandhî bû. Fîlosofiya Gandhî, ya li ser prensîbê bê-şiddet û xebata bêxof ku xwe bi bawerîya gelê xwe ve yekpare kiribû û gel li hember hêzên îngilîzî yên leşkerî û siyasî seferber kiribû, dirîneke pîroz bû li gora Martîn. Gelên Hindîstanê bi salan li dijî kolonyalîzma Împaratoriya Îngilîstanê protestoyên mezin pêk anîbûn û li hember îdareya biyanî, nerazîbûna xwe diyar kiribûn.

Gandhî êşkere diyar kiribû heke gel ji bo rizgarî û azadiya xwe amadeyî mirinê bûna jî, çî dibû bira bibûna lê divê ji bo wê tu kes nehatina kuştin. Pirr girîng bû ku artêşa rizgariyê lekeya qetl û xwînê neanîna ser xwe. Martîn hêdî hêdî dihat ser wê baweriyê ku gava gelên Hindîstanê di vê rê de biserkerîbûn, ev yek dikaribû li Amerîkayê jî bigihîştina armanca xwe.

Nameya Gandhî û tesîra dîtînen wî

Berî ku Martîn were dinyayê, hinek reşikên amerîkî di sala 1929-an de Mahatma Gandhî ziyaret kiribûn û li ser pêşeroja reşikên bindest û gelên Hindîstanê ketîbûn sohbe-teke dirêj. Gandhî di nameya xwe ya ku di sala 1929-an de di kovara "Crisis" de hatîbû weşandin mesajeke wiha şandibû:

"Bira 12 milyon reşikên Amerîkayê bi ber xwe nekevin ku ew nebiçirkên koleyan in. Koletî ne şerm e, lê koledarî şermekariya herî mezin e. Em guh nedin şerm û şerefa dîrokî, lê ji dêlîva wê ve bifikirin ku pêşeroj li pêşîya me ye; pêşeroja rastî, birûmetî û têr-evîni..." (Martîn Luther King Jr.- r.13)

Piştî ku ev mesaja Gandhî li Amerîkayê bela bû, bi hezaran reşikên Amerîkayê Gandhî ziyaret kirin û jê fêrî fikir û ramanên nû bûn. Di van sohbetan de Gandhî jî civatê re wiha digot: "Belkî jî ev gavê tekoşîna prensîbên bê-şiddet bi riya reşikên bindest bikemile û li cîhanê bela bibe."

Martînê ku di vê dema gotinên Gandhî de şeş salî bû, 21 şeş sal şûnde vê hêviyê li Amerîkaya Yekbûyî bicîh anî û bû hêviya bi milyonan mirovên bindest û belengaz. King mirovekî pirr jîr û zana bû; wî jî dîtînen Gandhî gelek fêde girt lê ew kopya nekir. Wî dîtînen Gandhî li gora şertên wela-tê xwe û bi taybetî jî li gora toreyên reşikan ku hêz da civakê û toreyên olî, bi hostetî guhart û di vî awayî de bi ser ket.

Lê Martîn ne bi tenê Gandhî xwend; wî di derheqa filosofên cûrbecûr de lêkolîn kir û berhemên wan xwend. Ew vê xebata xwe wiha tîne ziman:

"Di nav van salên navîn de min fîlosofiya "eksîstentialîzm"ê nas kir. Min filosofên mîna Kierkegaard û Nietzsche xwend û pişt re jî derbasî Jasper, Heidegger û Sartre bûm." (Navê rê bê-şiddet e, r.162-63)

Ew li ser Gandhî û naskirina dîtînen wî jî wiha şirove dîke:

"Dema min jîyan û xebata Mahatma Gandhî nas kir, rewşa min guhîrî. Çaxê min nivîsên wî xwend, ez bi giranî di bin tesîra wî de û tekoşîna wî ya bê-şiddet de mam. Dîtîna Gandhî ya di derheqa satyagraha (satya=rastî ku bi evîniyê re hevbeş e, graha=bihêzî; satyagraha bi maneya evînhê-

zî yan jî rastehêzî tê bikaranîn.) yê de ji min re bû dîtineke bingehîn. Ez di felsefeya Gandhî de çiqas kûr bûm, şikên min di derheqa bihêzbûna evînê de kêmbû... Min fahm kir ku metoda Gandhî bi riya bê-şidderetê yek ji wan çekên herî bi hêz e ku gelên bindest di riya tekoşîna azadiya xwe de bikarbînin. Ez di vê demê de gihîştim dîtîna û baweriyeye întellektulî û di vê nuqteyê de bêyî fikreke bi biryar, di rewşeke rastiya civakî de min dest bi organîzekirina tekoşînê kir.” (r.165)

Martîn di derheqa serkeftinê de hatibû wê baweriyê ku ji bo bicîhanîna bernameya tekoşînê çend normên girîng pêwîst bûn: Têgihîştina xebata bi aheng ku xebat û harmoniya civakê, pêşkeftin û bicîhanîna biryarên civakê yên girîng himêz dikir; welatparêziyeke rengîn ku rewşa civakê ya niha red dikir û wekhevî û lihevkerina nav neteweyan û ji bo serkeftina vê jî kar û xebatên hêja, ji bo guhartinên civakî gav bi gav xebat (xwendin, lêkolînkirin, eşkerekirin û pêşkêşkirina karên serkeftî, baweriyaya olî û hwd).

Piştî ku Martîn di sala 1948-an de xwendegêha sosyolojiyê tewa kir, li xwendegêha Crozer Semynary li Pennsylvanyayê dest bi xwendina teolojiyê kir. Sê sal şûnde di nav şagirtên herî jîr de ve xwendegêhê jî xelas kir û li Unîversîteya Bostonê xwendina xwe berdewam kir. Wî jî hêlekê ve di beşa felsefeyê de doktora xwe dida û ji hêla din ve jî beşdarî kurên felsefeya olî dibû û li ser hîndûîzmê, şîntoîzmê, îslamiyetê û xirîstî-

yaniyê lêkolînê dikir.

Martîn bi qenala hevaleyê xwe şagirtêke konservatûara New Englendê nas dika û ew dibin heval. Correta Scoot keçeke bedew û jîr bû; xwedî biryar û karetereke paqij bû. Her du ciwan demeke dirêj bi hev re digerin û hev baş nas dikin. Martîn bi her awayî jî ve keça jîr û bedew hez dika û van hissên xwe jê re jî diyar dika. Lê hezkirina wî ne yek alî ye; Correta jî ji Martîn hez dika û pêşneyar wî yî zewacê qebûl dike.

Martîn û Correta di 18-yê hezîrana sala 1953-an de di zewicin. Piştî ku herduyan jî li xwendegêhên Bostonê salên xwe yên dawî kuta kirin, Martîn xwest dest bi kar bike. Dilê wî dixwest li xwendegêhê dersên teolojiyê bide, lê hişê wî bi karê rahibiyê ve bû.

Çaxê Martîn di sala 1955-an de bû doktore teolojiyê û dîplomeya xwe ji Unîversîteya Bostonê girt, jina wî Correta jî zarokan wan î yekem Yolandayê bi zarû bû. Piştî wê, sê zarokên din jî ji wan re hatin dinê.

Di 1954-an de dadgeha bilind biryar dabû ku her hevewelatiyê Amerîkayê -çi reş çî sipî- li hember qanûnan wekhev bin. Qanûnên nû bi ve biryarê re, îmkanên riya wekhevîyê vekiribû. Li gora van biryaran, dubendiya nav reşik û spiyan ji holê radi-bû; li xwendegêhan herkes weke hev bû û îmkan li pêşiya tu kesan nedihat girtin. Wekî din reşikan dikaribûn rayên xwe jî bikarbînin.

Lê ev biryarên dadgêhê neketin jiyane. Li

gora qanûnan, mafê reşikan weke yên din hebû lê di pratîkê de gelek astengî derdike-tin pêşiya wan. Astengiyê herî girîng ew bû ku ji bo ray bikaranînê, reşikan mecbûrî ceribandina xwendin û nivîsandinê dikir. Astengiyê din jî daxwaza heqê kartê hil-bijartinê bû. Her wiha kesên daxwaza wek-heviyê dikirin an jî rayên xwe dixebitandin, ji karên xwe yên herî erzan û sivik jî dibûn. Weke numûne; li bajarê Montgomery zê-deyî çil hezar rayên reşikan hebûn, lê ji van bi tenê du hezar hatibûn nivîsandin.

Tirs û bindestiya salan tesîreke giran li ser gelê reşîk hiştibû. Ji bo tiştên gelek bi-çûk jî dengê xwe dernedixistin û ji qedera xwe razibûn. Ji bo ku li jiyane bimin û ji karên xwe yên kêmpere neyên avêtin, bê-dengmayin riya herî çêtir dixwiya. Martîn vê bêdengmayin û xofa wan bi çavên xwe dît; dît bê ew çawa xwe di malên xwe de vedişêrin û ji neheqîyan re serî datînin. Lê qenaeta wî vekirî bû; ew baş bi ber ketibû ger mirov bixwaze ji bindestî û koletiyê riz-gar bibe, pêwîst e meriv serî hilde û nerazî-bûna xwe eşkere diyar bike.

Bûyera Rosa Parks û çirîskên pêşî

Keça terzî Rosa Parks rojekê ji karê xwe li otobusê siwar dibe daku here mal. Ew di orta otobusê de cîhekî vala dibîne û li wir rûdinê. Weke usûl ger yekî/yeke sipî li cî-hekî pêş an jî di navîn de rûnê, pêwîst bû hemû reşîk dev ji cîhên xwe berdana û bi-çûna dawîya otobusê. Çaxê wê rojê yekî si-pî bêcîh dimîne, şifêr ji Rosa û sê reşîkên

din daxwaz dike ku tev ji cîhên xwe rabin û rê bidin mêtîkê sipî. Her sê hevalên wê ji dewsa xwe radibin û diçin li dawîya otobu-sê dirûnin lê Rosa deng nabe xwe û ji dew-sa xwe narabe. Şifêr careke din bi hêrs bang dike û “ger tu ji dewsa xwe ranebî, ez dê ji polîs re bêjim bira te têxin hepsê” dibêje.

Lê Rosa westiyayî bû û riya wê dûr bû. Her wiha ji sîstemê jî êdî westiya bû. Dengê şifêr qet nebî xwe û ji şûna xwe tanebû. Çaxê polîs hat û jê pirsî ka ew çima ji cîhê xwe nerabûya, “min pêwîst nedît ku ez ra-bim” Rosa bersiv da û ji polîs pirsî: “Hun çima me wisan piçûk dibînin û tade li me dikin?” Polîs şaş ma; bersiva wî “ez jî niza-nim, lê qanûn wiha ye; divê ez te bibim qe-reqolê” bû.

Rosaya reben kete hepsê û ji karê xwe bû, lê ev bûyer di nav gel de bela bû û bal-kêşiyê mezînişand ser xwe. Ên ku wê dinasîn, dizanibûn bê ew çiqas qenc û bê zerar bû. Gel gihîşt wê baweriyê ku piştgi-riya Rosa Parks pêwîst e. Martîn û hevalên xwe di vê bûyerê de ronahiyeke zelal dîtin û xwestin jê îstîfade bikin. Reşîkên şareze bi pêşniyariya Martîn biryar dan ku otobu-san bi awayê boykotê protesto bikin.

Boykota rêwingîtiya otobusan, di roja pêşîn de bi awayekî bêdeng meşîya û bi ar-manca protestokirina sîstema civakî kete ji-yanê. Rosa bi şîklekî pasîf û tenegehîştî dest pê kiribû lê niha bûyer mezînişand bû. Wê di jiyana gelê reşîk de pergaleke nû vekir, hêz û qewet û her wiha hêvî û baweriyên nûjen da wan. Êdî agir pê ketibû, tenê diviya ku

xurttir bibe.

Roja din di civîna ji bo karên pêşerojê de Martîne 26 salî weke serokê îdareya boykotê hat hilbijartin. Biryara yekemîn a ku Martîn û hevalên xwe girtin, civîneke bi reşikan re bû. Di vê civînê de nêzî çar hezar kes beşdar bûn. Polîs dora civînê bi her awayî zefî kiribû û li hêviya derketina şerekî mezin bû. Martîn di axaftina xwe de li ser rewşa reşikan rawestiya û di vê rewşa giran de yekîtî û hevkarîya wan anî zimên. Wî di nav civateke bi vî awayî de yekem car axaftin kir lê mîna pêşevanekî bijare ke te nav dilê gel.

Protestoya reşikan a pêşîn ne bi tenê polîs û karbidestên Montgomeriyê aciz kiribû, lê her wiha spiyên nîjadperest jî nerihet kiribû. Nîjadperestan dest bi êrîşên xwe yên li hember reşikan kiribûn lê polîs dengê xwe dernedixist. Di ser de jî polîs Martîn û pêşevanên din ê boykotê xistin hepsê.

Nîjadperestên har û dîn tevî çekên xwe êrîşan dibirin ser malên reşikan û malên wan dişewitandin. Di vê demê de mala Martîn jî bombekirin lê bi tesadufî kes li malê tune bû. Ji ber van êrîş û şiddeta rastîtan, reşikan jî çekê hilgirtin û xwe amadeyî şer kirin. Polîs û karbidestên bajêr jî vê rewşê tirsîyan û xwestin bi awayekî pêşiya vê bigrin. Martîn bi şid li hember şer û şiddetê derket. Li gorî wî rewş bi şiddetê neduguhirî û pêwîst bû ku şiddet bi hezkirinê biharîna rawestandîne.

Bi vî awayî Martîn şerekî giran da rawestandin. Lê boykot û protestoyên reşikan bi

awayekî bê-şiddet di domandin. Dadgeha Bilind a Amerîkaya Yekbûyî biryar da ku zagonên eyaleta Alabamayê yên ku li dijî reşikan bûn, li hember zagonên bingehî ên Amerîkaya Yekbûyî sûcekî mezin kirine. Martîn û bi milyonan reşikên Amerîkayê, bi vê biryarê zafera xwe yî yekemîn bi dest xistibûn. Lê ev tenê destpêk bû, hê rîya wan gelek dirêj bû û pêwîst bû di vê rîya rast de tekoşîna xwe bidomînin.

Dijberiya şiddetê

Martîn bi her awayî li dijî şiddetê bû û nêrîna xwe bi her minasebetê dianî ziman. Wî dizanibû ku şiddet, şiddetê tîne û mirov bi vê teherê nagêje armanca xwe:

“Gelek ji me hene ku li hember van zorî û neheqiyên çaralî pîrr diêşin û gelek aciz dibin; ew dixwazin li hember dijmin bi şiddetê, bi kerb û nefretê şer bikin. Şiddet dikare tenê serkeftinên rojane pêk bîne. Şiddet bi xwe re gelek pîrsgirikên nû tîne û li hember aştiyê astengiyê mezin e. Ez baş dizanim ku ger em li gora hîssên xwe bimeşin û bixwazin van hîssên xwe bi rîya şiddetê têxin jiyane û bi vî awayî ji bo azadiyê şer bikin, wê zarokên me yên neçêbûyî di vê rîya nefretê de mezin bibin û wê ev mîrate ji wan re bibe kaoseke bêdawî.” (Kîng- Navê rê bê-şiddet e r.14)

Martîn di vê pirtûka xwe (Navê rê bê-şiddet e) de van dîtînan xwe hîn bêtir vedike û wiha dibêje:

“Ji bo xebata azadiyê, rîyêke din ji me re vekiri ye; tekoşîna bê-şiddet ku rastiye bi

her awayî tîne ber çavan û ji kîn û nefretê bidûrketî, riya rast pêşkêşî kesên xizan û belengazên bêhêz dike. Dijberî bi riya bêşiddet îmkân dide me ku em li hember vê sistema neheqiyê tekoşîn bidin û ji wan kesên wê biguhrînin hez bikin.” (r.15)

Martîn tekoşîna gelên Hindîstanê di her minasebetê de bibîr tîne û balkêşiyê dikşîne ser wir û tekoşîna Gandhî;

“Hima bêje di her herêmeke li Asya û Afrîkayê Mûsayekî bê-tirs ku ji bo azadî û rizgariya gelê xwe xebat kiriye û daxwazên gelê xwe anîne zimên. Mahatma Gandhî yek ji wan bû û zêdeyî 20 salan ji general, melîk, serokwezîr û waliyên Îngîlîzî, daxwaza azadiya gelê xwe û rizgariya welatê xwe kir. Lê karbidestên Îngîlîzî bi dehsalan guhê xwe ji van daxwazan re girtin. Her wiha Wînston Churchillê mezin (?) jî li ser vê daxwaza Gandhî wiha gotibû: “Ez ne ji bo ku Împaratoriya Bîrtanyayê ji hev bela bikim bûme yekem serokwezîrê melîkê Bîrtanyayê!” (r.82)

Di derheqa kîn û zikreşiyê de Martîn bi kurtayî wiha dibêje:

“Dilreşî, hesûdî, kêmasiyên ji xwe neba-werkirinê û hîssî û her wiha bêbawerî, sebebên tirsê ne... Kîn û nefret tucarî nikarin nexweşiyên civakê hel bikin; tenê hezkirin dikare vê bike. Kîn jiyane felc dike; hezkirin azadiyê dibexşîne. Kîn jiyane perçe dike; evînî ahengiyê dixwe jiyane. Kîn jiyane reş dike; evînî wê ruhî dike.” (r. 129-130)

Di sala 1957-an de rêxistina SCLC (Southern Christian Leadership Conference) hat

damezrandin û Martîn Luther ji bo serokatiya rêxistinê hat hibbijartin. Di navbera 1957 û 1958-an de bi hezaran kilometre geriya û li zêdeyî 200 cîhên mezin axaftinên girîng kir. Di van meş û civînan de bi milyonan mirov beşdar bûn û Martîn bi kêf û eşq guhdar kirin.

Bê şik Martîn ne bi tenê beşdarî civînan dibû û propaganda dikir. Wî di rojname û kovaran de nivîsarên olî û civakî dinivîsand û pirtûkên xwe dida çapkirin. Di derbeke wiha de dema pirtûkên xwe îmze dikir, jineke reşîk hate cem wî û ew ji kezebê, bi kêrekê birîndar kir. Birîna Martîn xedar bû û kêrê di ser dilê wî qevastibû, lê ew ji vê birînê jî sax filitî.

Martîn di pirsgirêkên şagirt û ciwanan de jî bédeng nedima. Çaxê di sala 1960-an de komîteya rêxistina ciwanan SNCC (Student Non-violent Coordinating Committee) li hember nedana xwarin û vexwarina bo reşîkan protestoyekê dest pê kir, Martîn jî li kêleka wan cîhê xwe girt. Di vê protestoyê de Martîn û sed ciwan hatin girtin. Dadgehê ji bo wî “sûc”î çar meh ceza da wî. Martîn ji bo her bûyereke wiha, mîna serokê mîtingê an jî protestoyê dihat hesibandin û ji teref polîs ve dihat girtin. Ji destpêka bûyera Rosa Parks ve, ew bi dehan car hat girtin, bi sedan car êrîş hatin ser wî û malbata wî, bi mehan di zindanan de raza û bi dehhezaran cezayê dadgehan da. Lê wî xwe ji kar û barên xwe neda alî.

John F. Kennedî rewşa reşîkan û bi taybetî jî Martîn Luther Kîng ji nêz ve guhdar

dikir. Ew wê demê berendamê Partiya Demokratan ê serokkomariyê bû. Çaxê Kennedy bi rewşa Martîn hisiya, alikariya wî kir û ew da berdan. Kennedy bi vê jî nese-kinî, di her axaftina xwe de rewşa reşikan a xerab anî ziman û ji bo başdekirina rewşa wan û wekhevîyê soz da. Di hîlbijartinan de bi pîrraniya rayên reşikan bû serokkomarê YDA-yê.

Di sala 1961-an de şagirt û ciwanên reş û sipî dest bi meşeke ecêb kirin. Wan navê "Freedom Riders" (rêwiniyên azadiyê) li xwe kiribûn û li kêleka dîwarên termînal û restaurangên ku diçûnê bi rêzê dirûniştin. Bi vî awayî zilm û şiddetê protesto dikirin. Rasîst ji vê protestoyê hê bêtir aciz bûn êrîşên xwe zêdetir kirin. Dîsa şer derket û gelek xwîn rijîya. Martîn ji van êrîşên ku li hember xebata bê-şiddet dihatin kirin gelek aciz bû.

Civat bi van boykot û protestoyan bi te-veyî li hev ket; gelek hatin birîndarkirin û ketin hepsê, lê zagonên Jim Crow jî bi da-wî hatin. Kar û xebata wan î bê-şiddet bi sînor be jî gihîştibû armanca xwe; hukû- metê bi biryareke nuh, zagonên nîjadperest û dijminên mirovaniyê bi teveyî qedexe kir.

Martîn û hevalên xwe di salvegera sedsa- liya bidawîanîna koletiyê de, roja 28-ê teba- xa 1963-an, meşeke ber bi Washingtonê ve amade kirin. Hêviya Martîn ew bû ku li navenda Washingtonê nêzî sedhezhar kes beşdar bibin û xwe nîşan bidin. Rojname- van û nûçevanên televîzyonan hejmara beş-

daran 25 hezar hesab kiribûn. Li gorî wan heke zêde kes nehatin, dê ev civîn ji raya giştî re girîng nehatina hesabandinê û qî- meta xwe wenda dikir. Her wiha xebata wekhevîyê jî ji rojevê dadiket û girîngiya xwe wenda dikir. Leystikên serdestan û alî- girên wan gelek bûn û ev jî yek ji van bû.

Dema Martîn û jina xwe Corretta hatin cihê civînê û çav bi sedhezaran mirov ke- tin, pîrr kêfxweş bûn. Meydana civînê ji mirovên ji reşik û spiyan tije bûbû. Nêzî 250 hezar kes di milên hev de bi yek dengî li dijî tade, zilm û nîjadperestiyê sloganan diavêtin.

Dema dora axaftinê gihast Martîn, ew bi kêf û serbilind derket ser sendeliyê û rahîst mîkrofonê. Pêşî li ser sozên wekhevîyê ku hukûmetê hîn pêk neanibû rawestîya. Gel bédeng bûbû, bi eşq û heyret li gotinên ku ji lêvên wî derdiketin mêze dikir. Axaftina wî ku bi navê "xewneke min heye" ketiye dîrokê wiha dest pê kir:

"Hevalên min, ez ji we re dibêjim; tevî zor û tadehiyên ku derdikevin pêşîya me jî îro xewneke min heye. Xewna min ew e ku ev netewe rojekê serî rake û bibe xwedî ji- yaneke li gora bawerîya xwe. Bi ya me bê- şik e ku her mirov -çi reş çi sipî- xwedî rû- metek e û di nava mirovan de tu ferq tune ye.

Xewna min ew e ku zarokên kevne-kole- yan û kevne-koledaran li serê girên Georgi- yayê, li dora maseya biraderiyê li kêleka hev rûnin. Her wiha dibînim ku bajarê Mîssîs- sîppiyê guhiriye û bûye warê azadî û wek-

heviyê.

Xewneke min heye ku her çar zarokên min î biçûk di nav neteweyeke wisa de bi-jîn ku ne li gora rengên xwe bèn muamele kirin, lê li gora şexsiyeta xwe.”

Beşdarên mîtîngê ji axaftina wî sermest bûbûn. Di dawiya mîtîngê de tevan bi hev re dest bi strana “Free at last” kirin.

Roja din gelek rojname Martîn weke “serokkomarê Amerîkaya reşîk” qebûl dikirin. Êdî herkesî wî serokê rêxistina hevweletiyê dizanibû. Serokekî ciwan, xeberxweş, rast û bi bawerî. Herkesî jê hez dikir û rûmeteke giran didayê. Ew roj, ji bo Amerîkayê û reşîkên wê, rojêke mezin û bi rûmet bû.

Di 22-yê meha sermawêj de, mehek piştî vê civînê serokkomarê Amerîkayê J.F. Kennedy hat kuştin. Martîn û gelek hevalên xwe beşdarî serxweşiya goristanê bûn. Amerîka êdî li hev ketibû û xera bûbû, difikirî Martîn. Her roj kuştin, her roj xwînri-jandin gel aciz kiribû û çiqas diçû, rewş xerabtir dibû. Piştî kuştina Kennedy rewş ne tenê ji bo reşîkan, lê her wiha ji bo tevahiya civakê ber bi xerabbûnê ve diçû.

Di dema hilbijartinên nû de Martîn û hevalên xwe dest bi xebateke nû kiribûn. Di vê salê de (1964) xelata Nobelê ya aştiyê jî girtibû û bi vî awayî li çar aliyê cîhanê navê wî hîn bêtir bele bûbû. Rûmeta wî hem di nav reşîkan de û hem jî li hundir û dervayî welêt bilindtir bûbû. Xelata Nobelê, Martîn ji karên wî dûr nekir; lê ew hîn bêtir li karên xwe şidiya. Biryar girtin ku herin ser sandoqan û rayên xwe bikarbinin.

Dê wan vê yekê ne bi rica, lê bi zorê bikira. Li ser kaxez mafê reşîkan û rayxebitandinê hebû, lê pêwîst bû navên xwe jî qeyd bikin. Lê her rê li pêşiya wan hatibû girtin; karbi-destên sandoqan navên wan nedixistin qey-dan. Wan jî li ser vê rewşê dest bi protestoyan kirin û ketin zindanan. Di hinek meşan de gelek kes birîndar bûn û hinek kes jî hatin kuştin.

Martîn û hevalên xwe li ser vê yekê berê xwe dan Selma, bajarekî Alabamayê. Di rê de, gelek ji wan ji teref polîs ve hatin girtin, hinek ji wan ji teref nîjadperestan ve hatin birîndarkirin û kuştin lê tevî xwîn û xwîdanê jî kesî dev ji riya xwe berneda. Hetta vê barbariyê, serokkomar Johnson jî li xwe nexweş anî û wê mehkûm kir. Riya Martîn û hevweletiyên wî, nêzî bajêr ji teref polîs ve hatin girtin; qor bi qor polîs di devê riyayê de xwe ji bo şerekî giran amade kiribûn. Lê Martîn û hevalên xwe, xwedî biryar bûn; wê ji teref wan ve şer nederketina. Di 21-adarê, sala 1965-an de Martîn ji beşdarên vê meşê re wiha bang dikir:

“Îro ez dixwazim ji gelê Amerîkayê û yê cîhanê re diyar bikim ku em qet nafikirin bi paş ve vegerin. Em di riya xwe de dimeşin û tu nîjadperest jî nikarin me bidin sekinandin. Em niha ber bi welatê azadiyê ve dimeşin.!”

Bi saya vê xebata bi hêz û bi îrade, di hilbijartinan de guhartin çêbûn. Reşîka jî kê-m-zêde rayên xwe bikar anîn. Tevî zikên birçî, betalî û dibistanên beredayî jî jiyan berdewam dikir. Pergalên nû û xebatên nû

derketibûn pêşiya wan. Xebateke ku nû derketibû pêşiya wan jî, xebata ji bo wek-heviya şagirt û karkerên reş û sipî û meaşên wan bûn. Martîn û hevalên xwe di vê babetê de jî xwe êşandin; ji bo vê meş û protestoyan bikar anîn.

Martîn di nîsana 1968-an de ji bo alîkariya hinek karker çû Memphisê. Di civînê de axaftina wî, gel bêtir xiste bin tesîra xwe. Tevî ku di nav reşikan de grûbên cuda yê şiddetê bikardianîn hebûn jî (bo numûne Black Power), giraniya Martîn û rêxistina wî di nav reşikan de gelek bêtir bû. Martîn li dijî her şikil şiddetê bû wê bi her awayî mehkûm dikir.

Bi şev demekê dev ji karê xwe berda û qasekî derkete balkonê. Di serê xwe de, xwe amadeyî civîna roja din dikir. Li balkonê rûnişt û lingên xwe hebekî dirêj kir ku xwe hinekî rehet bike. Hevalên wî ji li hundir rûniştibûn û ji bo haziriyên sibê ketibûn nîqaşeke kûr. Ji nişka ve teqînek hat guhên wan. Çaxê ew bi ser ve çûn, Martîn di nav xwinê de dirêjkirî dît. Fîşekek li gewriya wî ketibû û ew xedar birîn kiribû. Martînê ciwan di rê de, berî ku bigihîjin nexweşxaneyê can da.

Amerîka roja din bi çelqeke mezin hişyar bû. Serokê reşikan, dijminê zilm û şiddetê, mirovperwer û aştxwaz bi fîşekeke "sipî" hatibû qetilkirin. Wî di axaftina xwe yê dawî de li ser riya aşî û bê-şiddetê, riya Gandhî xeber dabû. Wî jî mîna Gandhî li dijî şiddetê û zordariyê tekoşîn dabû û bû-bû xwediyê aqûbeta wî; bi şiddetê hatibû

kuştin. Felekê di vir de jî durûtî, rûreşî û bêbextiya xwe carek din jî dabû nîşandan.

Li ser gora wî bi sed hezaran mirov civî-yabûn û ketibûn êşa wendakirina vî serokê hêja û ciwanpak. Li ser kevirê tirba wî, wiha hatibû nivîsandin:

"Free at last. Free at last.

Thank God almighty I'm free at last."

Çavkanî:

1-Vägen heter icke-väld (Navê rê bê-şiddet e), Martin Luther King Jr.

2-My life with Martin Luther King Jr (Jiyana min bi Martin Luther King Jr re), Coretta Scott King.

3-Martin Luther King Jr-medborgarrättskämpen som mördades för sirt engagemang för de svartas rättigheter i USA (Tekoşerê mafên hevvelatîyê ku di xebata ji bo mafên reşikan li Amerîkayê hat kuştin), Valerie Scholredt.

4-Vi kan inte vänta (Em nikarin rawestin), Martin Luther King Jr.


5-Vägen till friheten (Riya azadiyê), Martin Luther King Jr.

6-Martin Luther King Jr: En biografi (Jiyana M.L King Jr), Lerone Bennett Jr.

7-I have a dream (Xewneke min heye), Martin Luther King Jr.

Jînenîgariya Cegerxwîn

R
E
X
N
E



Şerefxan Cizîrî

Nivîskarên kurdan li ser jiyana xwe ya şexsî, pîrr caran bedeng dimînin. Wan her dem ji xwe pirsîne û gotine; Ma qîmeta jiyana min çiyê? Ne tenê nivîskar, lê belê siyatsetvan, hunermend û pîrr kategoriyên sosyal yên din li ser jiyana xwe bi nivîsandin nasekinin. Heger di vî warî de xebatên libo libo jî hebin, ev yeka vê rastiyê ji bona civata kurdan naguherîne. Weke be-

şekî ji edebiyata kurdan, nivîsandina jiyana û bîranînên nivîskaran û siyasetvanan, pêwîstiyêke sosyal û kulturî ye. Civata kurdan divê bi hemû awayî hewl bide ku nivîskar û siyasetvanê xwe baş nas bike û ji serpêhatiyên wan bikaribin netîceyên heja derxînin. Ne tenê bi tiştên fermî û qalibkirî, lê belê ji pîrr aliyan de mirovên kurd divê hevdû nas bikin û xwe bidin nasandin. Bi kurtî divê mirovê kurd, îcar weke mirov hevdû nas bikin.

Seydayê Cegerxwîn di nav tevgera edebiyat û siyaseta kurdan de, navekî mezin e. Kesê ku ew ji nêzikayî de nas dikirin, dizanin ku ew ne ditîneke pûç û vala ye. Cegerxwîn ji bo civa-

ta kurdan mezin bû. Ev tişt-tekî pîrr eşkêrê ye. Pîrr kes carna dixwazin ku Cegerxwîn bidin berberê hinek nivîskarên cihanê û wî bi vî awayî biçûk bixînin. Lê bi raya min ev metodeke şaş e. Helbet weke hemû kesan, divê Cegerxwîn jî weke hemû nivîskar û edebiyatvanên welêt, bi pîvanên edebî û zanyarî were analîzkirin û fahmkirin. Di analîzkirin û



fahmkirina Cegerxwîn de, wê kurd civata xwe bi xwe nas bikin. Di civata kurdan de ku tişt cehalet, xizanî, dijminayerî, dagirkerî û hw bû, ancax Cegerxwînek dikaribû derketa pêş. Mezinbûna Seydayê Cegerxwîn di vî rastiya civata kurda de razayiyê. Yanî ku mirov bixwaze nivîskar bi hemû awayî, ji mercên civakî û entellektuelî îzole bike, wê çaxê wê şaşiyên mezin çêbibin. Nivîskarê welatekî jî, beşek ji jiyana civata xwe bi xwe ne. Ew bi zembilan ji ba Xwedê nehatine. Heger ku nivîskar karibin ji aliyê sosyal, îdeolojî, kulturî û exlaqî de bi gavekê li peşiya xelkê xwe bimeşin, wê çaxê ji pîrr aliyên de nivîskarî weke biserketineke were pejirandin...

Di jînenîgariya Cegerxwîn de pîrr bûyer hene. Mirovên derdora berriya Mêrdînê û Kurdistana Suriyê wê gelek tiştan, di derheqa civata xwe de, hinek tiştên pîrr girîng ji pirtûka Cegerxwîn, cara yekemîn bibihîzin û fêr bibin. Ew ê mirov û malbatên

xwe, eşîr û warên xwe, şer û pevçûnên xwe, mîr û mîrekên xwe, kesên navdar û tevgera siyasî, di vî Jînenîgariya Cegerxwîn de bibînin û nas bikin. Gelek tişt ji vana, ev cara yekem e ku tê nivîsandin. Ji ber vî yekê jî, divê li ser Jînenîgariya Cegerxwîn gelek were nivîsandin û munaqesekirin. Ez bi xwe bawer dikim ku, wê Jînenîgariya Cegerxwîn bibe çavkaniyeke baş ji bo hemû kurdan...

niçûnê Cegerxwîn bibe çavkaniyeke baş ji bo hemû kurdan...

Weke ku niha îcar baş diyar bûye, *Weşanxana Apec* li Swedê di sala 1996'an de Jînenîgariya Cegerxwîn weşandiye. *Weşanxana Apec* di vî warî de xebateke hêja kiriye. Ji pîrr aliyên de ev pirtûkên han valahiyeke mezin dadigire. Cegerxwîn di vî pirtûkê de qala gelek tiştan, bûyeran, kesan, serpehatiyên û tevgeran dike. Min bi xwe gelek caran, ew tiştên ku Cegerxwîn behs dike, di zarotiya xwe de bihîstibûn. Lê pîrr tişt di hişmendiya min de, ji bo min xûmamî ma bûn. Ji ber ku ew tişt, weke ku tê zanîn he ta niha nehatibûn nivîsandin. Bi xwendina pirtûka Cegerxwîn xûmam û mija salan, ji bo min belav bû û hemû tişt bi navê xwe û bi şaşiyên xwe li rastê man. Tevde bi hev re weke masiyên ku av li ser wan biçike, yeko yeko derketin ser rûwê erdê... Lê ji aliyekî de jî, mirov bala xwe baş didê ku Seydayê Cegerxwîn di warê metod de, hinek şaşiyên

mezin jî kirine. Li ser wan şaşiyên metodîk ez dikarim wuha bibêjim; Beriya hemû tiştî divê nivîskarek li çavkaniyên xwe, bi çavekî rexnegirî binêre. Bêyî rexnegirî li çavkaniyan, rastî ji baş dernakeve meydana. Divê weke nivîskar mirov bikaribe, tiştên ku ji mirovan re têne gotin, ji hewedariyê û ji çewtiyê karibe paqij bike. Em hemû dizanin ku hewedarî, hergav dixwaze hinek tiştan veşêre û hinekan jî derxîne pêş. Bi raya min Seydaye Cegerxwîn di vî warî de, ne gelekî bi serketî ye. Kê je re çî gotibe, wî ji ew nivîsiyê. Cegerxwîn, li ser rastî û çewtiya van tiştên hanê baş nesekiniye.

Ji ber vê yeke jî, ez dixwazim hinekî bi kurtî û bi taybetî li ser hinek agahdariyên ku Seydayê Cegerxwîn li ser eşîra Omerya dinivîsîne rawestim. Pîrr tiştên ku Seydayê Cegerxwîn li ser eşîra Omerya dinivîsîne rast in, lê belê gelek tiştên çewt jî, di pirtûka wî de hene. Ew jî bi kurtî ev in; Seyda dibêje ku Eşîra Omerya li hember dewletê tucara şer nekiriye. Ev dîtîna şaş e û bêbingeh e. Sadûn Axayê Omerî ku seyda jî, pîrr behsa zalimî û dijwariya wî dike, heta niha pîrr caran çewt hatiye fahmkirin. Rast e, Sadûn Axayê Omerî, ku lawê Mihemedê Cizîrî ye, axayekî pîrr zalim bû. Li ser zalimiya wî, li herêma Omerya pîrr tişt têne gotin. Li ser rastiya wan gotinan mirov dikare ji hêla metod de pîrr tiştan binivîsîne. Lê belê aliyekî wî mirovî din jî heye ku, heta niha veşartî maye. Sadûn Axayê Omerî berî hemû tiştî wezîr an jî berdevkê Mîrê Botanê bû. Ji herêma Cizîrê û ber bi Roja-

va de, heta bigihîje herêma Gerger ya Adiyemanê, di bin berpîrsiyariya Sadûn Axayê Omerî û Sadûnê Nuhê Gergerî de bû. Ev herdu axa bi şêwr û raya Mîrê Botanê dimeşiyan. Mîrê Botan jî wê çaxê zalimên zaliman bû. Lê tu kesan heta niha behsa zalimiya Mîrê Botan nekiriye. Ji ber ku Mîr Bedirxan Paşayê Botan, wexta ku li hemberî Împaratoriya Osmanî, ala serbixwebûnê bilind kir, xelkê Kurdistanê xwestin aliyên Mîrekan yê ne baş, bixin bin hesîtan. Lê zalimiya Sadûn Axa li herêma Omeryan bû weke tişteki mîtolojîk. Ewê ku li ser Sadûn Axa sê gotin zanîbûn, ji aliyê xwe de sisê jî li ser zêde kirin. Sadûn axayê Omerî di şerê dijî Osmaniya de, yek ji serleşkerên Mîrê Botan yê neqandî bû. Hilbet wexta ku Sadûn Axa beşdarî serhildana Mîrê Botan Bedirxan Paşa dibe, ji nav Omerya jî gelek peyayên Omerî bi xwe re dibe nav serhildanê. Piştî şikestina serhildana Mîrê Botan, Sadûn axayê Omerî jî, bi malbata Mîrê Botan re sirgûnî bajarê Stenbolê dibe...

Ez niha li vir dixwazim bi kurtî hinek agahdarî li ser eşîra Omerya bidin: Eşîra Omerya di destpêka xwe de, bi taybetî piştî ku Mala Atman axa (ku bavê Mihemedê Cizîrî ye) bûne axayê Omerya, heta ku Mîrekiya Botan hebûn jî, danûstandina Mîrê Botan û eşîra Omerya bi awayekî rêzanî berdewam dikir. Ji xwe Mîrekiya Botan bingehê xwe ji sistema eşîrî digirt. Qedir û qîmetê eşîr û serekeşîra di nava Mîrekiya Botan de, li gora mezînbûna eşîran bû. Eşîra Omerya li herêma Mêrdînê him ji aliyê

hejmar de him jî ji aliyê coğrafya de eşîra helî mezin bû. Dirêjbûn û firehbûna navça Omerya nêzîka 70 -80 Km² heye. Ji Nisêbînê bigrin heta nêzîka Midyadê, ji Midyadê heta Mahsertê û ji wir jî heta ku bigîhê bajarê Mêrdînê dikeve navça Omerya. Ji xwe qeza Mahsertê berê gundekî Omerya bû. Min bi xwe gundê Omerya nehejmartine, lê belê tê gotin ku, di navça Omerya de nêzîkî 90 an jî 100 gundî heye...

Em niha dîsa vegerin ser pirtûka seydayê Cegerxwîn.

Seyda dibêje ku, kes li herêma Mêrdînê di hewera Şêx Seîd de neçûbû. Ev dîtîna jî ne rast e. Li gora Mele Hesenê Kurd ku bi xwe beşdarî serhildana Şêx Seîd bûbû, Brahîmê Osman ku yek ji Axayê Omerya bû (neviyê Sadûn Axayê Omerî ye), ji Omerya û derûdora Omerya nêzîka Pêncsed (ev hejmar tê gotin, dikare kêmtir an jî zêdetir be) peyan bi xwe re kar dike û diçe hewara Şêx Seîdê Pîranê. Di navbera Mêrdînê û Diyerbekirê de, li ba Siltan Şêxmûs, ji vê grûbê re xeber tê ku serhildana Şêx Seîd têk çûye. Ev grûba hanê jî, ji vir û şûnda bi paş ve vedigerin. Ew bûyer ji aliyê mirovekî Çalî ve (gundê ku jê re paytextê Omerya dibêjin) ku navê wî Çeçanê Delalê ye jî, hatîye gotin. Çeçanê Delalê yek ji wan kesên Omerî ye ku beşdarî grûba Brahîmê Osman bûye û bi xwe çûye hewara Şêx Seîd. Ji aliyê din Mala Ehmedê Smaîl, ku ew ji beşekî ji malbata axayê Omerya ne, dîsa li hemberî dewleta Komarê şer kirine. Di wî şerî de serê panzdeh kesên ku beşdarî şer

bûbûn hatine jêkirin. Serê wan kesên ku beşdarî serhildanê bûbûn, leşkerên Komara Tirkîyeyê, ew serê jêkirî xistibûn çawalan û bi xwe re li gelek gundên Omeryan digelandin. Eliyê Ehmed, Qenco, Şêxmûs, Dêqîk û hevalên wan, heta dawî li hemberî leşkerê Komara Tirkan şer kirin û li ber xwe dan. Dara mirada, Şikefta Rûte û Nawala Merzeka ku şer lê bûye, ji pîrr aliyên de bûye weke sembolekê li herêma Omerya. Li ser vê bûyerê jî pîrr tişt têne gotin. Ez naxwazim li vir bi dirêjayî behsa şerê Mala Eliyê Ehmed bikim. Tenê ez dikarim wuha bibêjim; şerê wan di sala 1930'î de bûye.

Çewtiyeke din ya mezin di pirtûka Cegerxwîn de jî ew e ku, Seydayê Cegerxwîn di derbara şerê Tînatê û Elîkê Batê de agahdariyên ne rast dide xwendevanan. Seydayê Cegerxwîn dibêje ku, "Şerê Tînatê ji nişkê ve derket". Ez bi xwe baş dizanim ku şerê Tînatê ji nişkê ve derneketiye. Şahîdê wî şerî pîrr kes hene. Encamên şerê Tînatê bi kurtayî ev e; Brahîmê Osman li ba gundê Sada ku gundekî Omerya ye, dikeve kemîna leşkerê dewletê û heşt kesan ji wan dikuje. Piştî vê bûyerê leşkerekî pîrr giran dikişe ser Tînatê û herêma Omerya. Wê çaxê Mala Osman di Tînatê de ne. Mala Osman li ser axatiya Omerya, bi pîsmamên xwe re li hevdu nakin. Pîsmamên wan yê Mala Ehmedê Smaîl li gundê Qurdîsê ne û Mala Silêman jî li gundê Çalê ne. Bi wî leşkerê giran re pîsmamên Mala Osman jî têne şerê wan û tevî şerê Tînatê dibin. Di wî şerî de Îzedînê Temo Gewre, ku axayê eşîra

Hebizbiniya ye, weke alîgirê dewletê beşdar dibe.

Rola Elîkê Batê di şerê Tînatê de tişteki din e. Wexta ku şer li ser Tînatê derdikeve, wê çaxê Elîk bi xwe li ba Mala Haco li biniya xetê ye. Mala Osmanê axê xeberê ji Elîk re dişînin ku, da ew were hewara wan. Elîkê Batê xeberê digire û bi derdora sed peyayî re, ew pêşiya pêşî tê bajarê Nisêbînê. Li Nisêbînê ew pêşî dire qeymekamê bajêr dibînê. Wexta ku Elîk li ba qeymekamê Nisêbînê rûniştiye, pîrekeke Torî tê ba Elîk û di nav sed zîlamî de jê re dibêje; "Lawê min di hepsa Nisêbînê de ye, ez bi tenê me û perîşan im. Heger tu lawê min ji zîndanê bernedî, çariya min li serê te be!" Piştî vê gotinê Elîk hêrs dibe û digire ser hepsa Nisêbînê, girtiyan berdide û pişt re jî berê xwe dide nav Omerya. Wê çaxê Şemonê Hennê Heydo, ku filehekî bi nav û deng e bi Elîk re diçe hewara Mala Osman li Tînatê. Bi vê grûba mêrxasên mezin re mitirb jî hene. Ewê ku bi xwe di nav şerê Tînatê de bûn ji min re gotin ku, peyayên Elîk her yekî du pakêt fişek bi wan re hebûn. Ew jî ji bona şerekî mezin ne tişteki zêde bû. Fişekên wan jî di şer de zû xelas bûn. Di wê navê de Usivê Osman, ji embarên xwe bi sindoqan ji wan re fişek derdixistin. Lê dawiya van fişekan jî hat. Şerê Tînatê panzdeh rojan berdewam kiribû. Piştî panzdeh rojan fişek xelas bûn. Bi hewqas leşker re mirov nikarîbû bêyî fişek şer berdewam bikira. Ji ber vê yekê jî Mala Osman û şêst malên Tînatîyan bar kirin û çûn nêzîka

Midyadê û dûra jî derbasî Geliyê Marînê bûn. Di dawiya dawî de jî, wana xwe gihandin biniya xetê. Di vê navberê de jî, Elîk li herema Torê hate kuştin...

Ma gelo çima hewar ji Elîkê Batê re diçe? Encamên vê yekê jî pirr hesanî ne; Mala Osman li Omerya û Mala Batê jî li Hevêrka bi hevdû re bend ava kiribûn. Li gora vê bendê; kî ji van malbatan bikera tengasiyê, malbata din mecbûr bû ku di hewara wan de biçê. Mala Osman jî, ji aliyê xwe de beriya şerê Tînatê, gelek caran alîkariya Mala Batê li nav Hevêrka kiribûn. Heta wan her du malbatan bi hev re carekê Mizîzexê ji mala Batê re saft kiribûn. Di vê demê de axayê Omerya Hesenê Osmanê, ku Seydaye Cegerxwîn jî li çend ciyan behsa wî dike. Elîkê Batê jî gelek caran, di nav malbata wî bi xwe de, problemên wî bi pîsmamên wî re hebûn. Yanî bi kurtî Mala Osman û Mala Batê bi hevdû re sozdayî bûn. Elikê Batê wexta ku çû hewara Omerya, soza xwe bi cih dianî û mêrxasî dikir. Ez dixwazim wuha bibejim; Şerê Tînatê ne şerê Elikê Batê ye. Elik tenê çûye hewara şerê Omerya. Helbet ev jî mêrxasiyeke mezin e. Lê heger Elikê Batê bixwesta serhildanê li hemberî dewletê organîze bike, ew ê çima ev serhildan li herêma Omerya destpêbikira? Ma gelo herêma Hevêrka ji bona Elik ne baştir bû? Her çiqasî navê vê liberxwedanê weke "Serhildana Elikê Batê" tê binavkirin jî, ev serhildan bi rastî ne bi vekirina hepsa Nisêbînê destpêdikê. Serhildan pêşî li Omerya destpêdike. Lê ji ber ku ve-

kirina hepsê ji bona dewletê tiştêkî berbiçav bû, bi taybetî dewletê navê vê berxwedanê kirin "Serhildana Elîkê Batê".


Yekî ku şerê Tînatê bi çavê xwe dîtibû, Îzzedînê Osman e. Min ji Îzzedînê Osman pirsî; Çima navê Elîk wuha zêde derkete pêş? Wî got ku, encamê vê yekê pirr in. Lê bi kurtî mirov dikare wuha bibêje; Mitirbê Elîk hebûn û wana jî hergav li odên cuwamêra wesfê Elîk didan!

Li aliyê din Seydayê Cegerxwîn dibêje; Hesenê Osman mezinê eşîra Koçekan û Bûblana bi bêbextî kuştine. Ew yeka jî, ji binî de ne rast e: Hesenê Osman Axayê Bûblana bi bêbextî ne kuştine. Ewê ku yek ji axayê Bûblana kuştibû, Sadûn axayê Omerî bû. Ev kesê Bûblanî bi xwe jî, zaveyê Sadûn Axa bû û di mala wî de altaxî lê kiribû. Sadûn Axa ew kesê Bûblanî êşkere, li ser serê Qesra xwe kuşt. Mesela Koçeka meseleyeke din e. Koçekî li derdora Nisêbinê ne eşîr bûn, lê belê malbateke xuyayî bûn. Ew li herêmê weke Mala Hemo têne naskirin. Bi eslê xwe ew ne ji herêma Nisêbinê ne. Mala Hemo weke koçer dihatin û diçûn derdora Nisêbinê. Wan bi riya Axayên Omerya îcaze girtin ku, li herêmê bi cih bibin. Demeke dûr û dirêj Mala Hemo bac didan Axayên Omerya. Hesenê Osman ew bi bêbextî nekuştine. Hemo ku mezinê vê malbatê bû, carekê hinek gotin di derbarê Axayên Omerya de kiribûn ku, Hesenê Osman ev tiştan weke heqaret qebûl kir. Yê ku Hemo êşkere ji mala wî bir û kuşt, Hesenê Osman bû. Di vê bûyerê de ji

tu bêbextî tune.

Ez dikarim ji pirr aliyên de bibêjim ku, nivîsandina Jînenîgariya Cegerxwîn, dikaribû bi metodên zanyarî hîn baştir bihata nivîsandin. Em hemû hewcedarê vê yekê bûn. Lê mixabin seydayê hêja em xwendevanên xwe, ji vê yekê bê par hiştin û ji nav me bar kir... ■

Medenî Ferho
Hades İş Başında
Weşanên Kora, 283 rûp.



Ev romana Medenî Ferho ya bi tirkî, berhema salên wî yên girtûgehê ye. Roman li ser girtin, îşkence, bêfikirin, bawerî û hêviyê hatiye avakirin.

JI WEŞANÊN NÛ

Osman Aytar

Kurdistan bi fiftî fiftî

Weşanên Nûjen, 318 rûp.

Osman Aytar berê jî bi navê *Kürdün Makus Talihî ve Güneydoğu Anadolu Projesi û Hamîdîye Alaylarından Köykoruculuğuna* bi tirkî du pirtûk derxistine.

Osman Aytar di vê pirtûka xwe ya ku xwerû bi kurdî nivîsandîye, bi rîya hevpeyvînê bi berpirsiyarên partiyên siyasî yê başûr û birêvebirên Hukûmeta Federe ya Kurdistanê, rewşa Kurdistanê başûr radixe ber çavan.

Mîrhem Yîgît

Helwest

Weşanên Medya, 219 rûp.

Mîrhem Yîgît ku DI Med TV de dixebite û berpirsiyariya programa *Gelawêjê* dike, nivîsên xwe yê ku di navbera salên 1975-1995'an de nivîsandîye, gîhandîye ser hev û mîna pirtûkekê çap kiriye. Hinek jî sernavên nivîsan wilo ne: "Rewşenbîn, şoreşa başûrê Kurdistanê û rewşenbîrên kurd", "Ziman, tarîfa zimên û hin rastiyên girêdayî zimên", "Enstîtu û Akademî" û hwd.

Nivîskar di pêşgotina pirtûka xwe de dibêje: "Ez ne nivîskar bim jî nav min û qelemê ne xerab e..."

Bi hêviya ku wê nava wî û qelemê baştir bibê...

Reşîdê Kurd

Ez

Weşanên Avesta, 59 rûp.

Ev pirtûka Reşîdê Kurd ku berê li Stockholmê ji aliyê Komeleya Jinên Kurdistanê ve hatibû weşandin, ji aliyê Weşanên Avestayê ve li Stembolê derket. Di vê berhevoka şûran de şûrên Reşîdê Kurd yê bijarte cih girtine.

Cegerxwîn

Şûrên Windabûyî

Weşanên Avesta, 58 rûp.

Bêguman Cegerxwîn yek ji şairên kurdan yê navdar e. Cihêkî wî yê taybetî di dîroka şûra kurdî de heye. Bi derketina van şûrên windabûyî yê Cegerxwîn, ji bo lêkolînerên şûra kurdî û naskirina Cegerxwîn, çavkaniyeke baş e.


Firat Marmara'ya Akar

Musa Anter


Weşanên Avesta, 246 rûp.

Weşanên Avestayê nivîsên Musa Anter yê ku di rojnameyên Ülke û Gündemê de hatibûn weşandin, civandîye ser hev û mîna pirtûkekê çap kiriye. Mîrov di van nivîsên Musa Anter de piştî bêdengîyeke dirêj, pêlên berxwedan û serhildanê dibîne.

JI WEŞANÊN ARARAT ÇAR PIRTÛKÊN BI ALMANÎ



BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê! Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê.

Ji bo Swêd salek 190 Sek, welatên din 50 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye jî we re bişînin.

Gelî mîr û axa û paşayan! Ez ji we dipirsim: Kê ji we he-
ta niha ji welatê xwe re çî kiriye, da em bizanin ku hûn
welatê xwe dievînin! Evîna welêt ew e ku mirov nehêle
dijminê mirov bikeve nava welatê mirov! Evîna welêt ew
e ku mirov welatê xwe ava bike, dibistanan, xêratxane-
yan çêbike! Evîna welêt ew e ku mirov zarokên welatê
xwe bide xwendin, fêrî pîşe û zanîne bike.

Mîqdad Mîdhet Bedir-Xan (Kurdistan, hej. 2, 1898)